Sernivîser
Qado Şêrîn

Cejna 10
HNRKS

Derhêner
Xorşîd Şûzî

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî

# PÊNÛSA NÛ

hejimar '21'
Çillê Paşî 2014

شهرية تصدر عن رابطة الكتاب والصحفيين الكورد في سوريا

*Can kurd*



## KULÎLK

### Johann Wolfgang von Goethe

**(1749-1832)**


Ez çûm nav daristanê,
Wilo ji xwe re,
Ne ji bo ku ez li tiştekî bigerim,
min wilo xwest.
Di siyê de min dît
Kulîlkek şîn bûye



Wek stêrkan dilûle
Wek çavikan rindik e
Min xwest wê jêbikim,
Yekser gote min:
Divê ez bême jêkirin,
da ez bibime geya?

Min ew ji binî ve,
Tev damaran hilkir
Min ew bi xwe re bir
Mala rindik
...û min ji nû ve çand
Di cîgahekî bêdeng da
Niha ew her şax dide û her geş dibe.

*Ebdulbaqî Huseynî*



zanin88@hotmail.com

### Ji ferhenga jinên kurd

(xeleka 6)

## Hefse Xana Neqîb

**(1891- 1953)**

**Seroka pêşîn ya**


**(Yekîtiya jinên Kurdistan)ê**



Hefse xana Neqîb an jî Hepse xana Neqîb wekû li gelek cihan tê gotin, di hin jê deran de dibêjin "Hefse" û di hinan din de dibêjin "Hepse", lê navê Hefse gelektir nêzîkî navên folklorê kurdî û ayîna kurdan a musilmanîye ye,… ji er vê yekê min di vê xelekê de navê "Hefse" helbijartiye.

.......... Rûpel (9) ..........

*Boniye Cegerxwin*



### Bê te jiyan tim valaye

Jîna mi bû derya xema
Gazind bi sûd min qet nema
Werbûm di ber pêl û lema
Çib'kim ji vî barê giran!

Jîna mi tev vala ve çû
Pêtir revî çib'kim ji nû
Lezgîn were tû big'he zû
Hev ra bi lez xweşkin jiyan!

Her çar demên salê ve tên
Heyv û şefeq ber jor ve tên
Şev , roj di pey hevdûre tên
Reş tar li pêş ya min cîhan!

Vîna me gel hev re heye
Rist û resen , b' xakê ve ye
Her dem bi vî warî ve ye
Serbest bijî ev niştîman!

Rûgeş û şad mestî ne bin
Azad û evrazê xwe bin
Dilxweş bijîn ta em hebin
Çendî xweşe bo me jiyan!

*Ezîz ê Cewo*



## "AWIREK JI DERVA"

### PÊVA JOYÊN ROJHILATA NAVÎN Û PIRSGIRÊKA KURDÎ BI ÇAVÊ ZANYARÊ RÛS



Bi rastî, ev demek a dirêj e, ez buyer û pêvajoyên li Kurdistanê û Rojhilata Navîn pêk tên, bi giştî di çapemenîyê da dişopînim, nêrîn û helwestên siyasetmeder û rewşenbîrên kurd li ber çavan ra derbaz dikim, dixwazim di nirxandinên wan da tiştekî nû jê derînim û têbigihîjim, lê – bê feyde!… ...... Rûpel (10)

*Dr. Ehmed Xelîl*





*Çavdêriya zimanî:*

*Mustefa Reşîd*


### Pêşiyên Me Yên Arî – Zagrosî

(Gelê Horî- Mîtanî)

**Gelê Horî (Xurrî):** Navê gelê Horî (Hurî) di hin jêderan da bi navê (Hurîm= Xurrî خورّي = Xurdî خرْدي) tê naskirin, ewa jî gelekî Arî-Zagrosî ye, cihê wan î pêşîn deverên navbera Gola Urmiyê û Çiyayên Zagros bû, lê di pêra êlên Horiyan ber bi bakur - roajvayê Mezopotamya va koçkirin û li deverên jorîya çemê Xabûr bi cih bûn, û hinek gihiştin rojhilatê Çemê Zaba Jêrin, û ji hêla bakur da gihiştin Gola Wanê. .......... Rûpel (12) ..........

## Bîranînên





## Têkoşerekî Kurd

### Ehmedê Ebdirehman Axa Kurê Şahîn Axa Şûzî ...

Dema Mistefa botanî vegeriya ji Barzan, gote me Mele Mistefa silava li we dike, û dibêje li çiyayê Agrî Gineral Ihsan Nûrî paşa şoreş pêxistiye bê verastin bi kesekîre ji bo arîkarî bi wanre bê kirin, lê divê hûn herin Sûrî, û Xueyîbûn karibe alîkariyê bide wan, û li cem me emê binerin çi alîkarî bi şoreşê re em karin bikin. ......... Rûpel (13) ..........

*Lokman Polat*



### BINXETÊ /ROJAVA

### STARGEHA KURDÊN BAKUR

Başurê rojavayê Kurdistanê ji sala 1925 û virve ji bo kurdên bakur bûye stargeh. Kurdên bakur yên siyasî û serhildêrên çekdar ên kurd ku beşdarê serhildanên dema çuyî bûbûn dema diketin tengasiyê berê xwe didane binxetê ango rojavayê Kurdistanê.

Welatparêzên kurd yên ji malbata Bedirxaniyên Cizîrê çûbûn li binxetê bi cih û war bûbûn. ...................... Rûpel (6) ..........

**Hoşeng Broka**
hoshengbroka@hotmail.com

KURT û KURMANCÎ



# Werîsê derewê dirêj e!

Aqilê devkjenkî (gelêrî) dibêje:

„werîsê derewê kin e", lê „rastiya" derewê, bi qasî ji dîroka derewê û dostên wê diyar e, ne wisa ye. Derew, heta tu bêjî bes, dirêj e.

Derew, rastiya dîroka dinyayê a herî dirêj e

Dorûberên me, mişt derewên dirêj in, ku ew ji sedsalan ve, wek „rastiyên dirêj", tên bawerkirin û pîrozkirinê.

Bi qasî asmanan, derew dirêj çûne

Bi qasî derewan, asman jî bilind bûn e

Derew, stûnên asmanan e

Asman jî, konê derewan e

Derew, rastiya here mezin û dirêj, a dinyayê ye

Loma ronakbîrê „Saudî-Erebistanê" yê mezin Abdullah El-Quseymî (1907-1996), yê atheist, digot: „Hemî afrîde bi rastiyê dijîn. Bi tenê mirov, rastî wî dikuje"

Mirov, berûvajî hemî afrîdeyên din, „rastiya" xwe bixwe çê û durist dike.

Mirov ne rastiyê, belê siya wê; ne di rastiyê de, belê li kêleka wê di jî

Ji ber vê „rastiya mirovane", hekîm û fîlosofê Çînî yê mezin Konfuzius(551-479 b.z.), weha şîreta rastiyê li mirovan dikir: „Ne rastî mirovî, belkû mirov rastiyê, mezin dike".

Mirov, ne bi rastiyê ye, lê rastî bi wî ye

Ew, ne di rastiyê de ye, belê rastî di wî de ye.

Ew, ne berê rastiyê ye, lê rastî berê wî ye.

Ew, ne bi rastiyê re ye, belê rastî bi wî re ye.

Ew, ne ji rastiyê re ye, lê rastî ji wî re ye.

Ew, ne ji bo rastiyê ye, belê rastî ji bo wî ye.

Ew, ne yê rastiyê ye, lê rastî ya wî ye.

Derew xeyala rastiyê ye, xeyal jî ji rastiyê dirêjtir e

Heta xeyal heye, dê derew jî hebe

Heta xeyal here, dê derew jî here

Heta bi rastiyê, xeyal û derew dirêj in

Ji bo ku derew û werîsê wê were „dirêjikirin", helbet alîkariya „aqil" û aqilmendên wê lazim e.

Derew, bi aqil, ji nekirinê diçe kirinê; ji reaktionê diçe aktionê; ji xeyalê diçe rastiyê ; ji tunebûnê diçe hebûnê û ji bertengbûnê diçe berferehbûnê

Aqil, bi qasî li rastiyê digere, li pey derewan jî dibeze

Aqil, derewan çê dike, lê derew aqil çê nakin

Aqil, derewan mezin dike, lê derew aqil mezin nakin

Aqil, derewan bilind dike, lê derew aqil bilind nakin

Aqil, derewan xweşik dike, lê derew aqil xweşik nakin

Aqil, derewan bi ser dixe, lê derew aqil bi ser naxin

Aqil, dikare ji derewên mezin „rastiyên mezin", ava bike

Çîrok û çîvaok, bi aqil, dikarin bibin dîrok, dîrok jî dikare bibe çîrok

Bo nimûne, nivîskar û dîrokansê Schottlandî Tomas Carlyle(1795-1881) „rastiya Raya Giştî", wek „derewa bi qasî dinyayê mezin", weha li qelem daye: „Raya Giştî mezintirîn derewa dinyayê ye".

„Raya Giştî", li gorî Carlyle, ne „rastiya giştî", belkû „derewa giştî" ye; ne „rastiya dinyayê" belkû „derewa dinyayê" ye.

„Rastiya" îro di Raya Giştî de mezin, dikare sibê „dereweke mezin be.

Derewa îro li dinyayê mezin jî, dikare sibê rastiyeke mezin be.

Helbet xwedanên dengên pirr, li gorî mantiqê demokratiya îro roj, xwedanên dengên mezin in jî, lê dengên mezin ne hertim xwedanên rastiyên mezin in

Aqilekî mezin, dikare dengekî ji derewan, mezin bike

Dereweke mezin jî, dikare girseyeke mezin û „Rayeke Giştî" a mezin, ava bike

Li gorî alîgirên pragmatismê (Pragmatismus), „rastî qezenc û menfeet e": kî mifa ye, ew bav û bira ye; feyda te çiqas e, buhayê te jî hewqas e.

Bo nimûne, psycholog û fîlosofê Emerîkî William James(1842-1910), wisa bawer dikir, ku „rastiya bîrûbaweriyan ji rastiya menfeeta wan e", loma wî her tişt(heqî û rastî jî di nav de), bi qezenc û menfeetê re, dipîva: Rastî menfeet e, menfeet heqî ye, heqî jî li gorî demê, cih û kesan, guherbar e.

Rastiya ku ji min re menfeet û kar e, belkî ji yekî din re, derew û zirar e

Rastiya di demekê û cihekî de, heq û heqanetî ye, belkî di cihekî din û demeke din de, derew û neheqî ye

Loma bi qasî derewê, rastî jî pirr e

Bi qasî derewê, rastî jî girr e



BÊWAR *BARÎ TEYFÛRÎ*

# KURD DI ÇAVÊ DUNYAYÊDA



## BEŞA (3)

Lê we hîndû qilandin, betilandin, cî-warê wan rûxand, hetimand, çend sed salin keda milyon-milyon însanî we hezimand, ji bo ber jewendîyê xwe heyfa we tu tiştî û tu kesî nehat û nayê, hun eşkela dijî mirovan ,gelan çeteyê dikin, qanûna ji bo berjewendîyê xwe derdixin, dinîvsin,dunyayê hes dikin li bin bandora xweda xayikin. Lê we bi kurda nikaribû.. Kurd jîn.

Kurd sembola jîyanêne.Jîyan ji bo gelek miletan ji kurda dest pêdike. fermandarîya bi edalet navê kurdava girêdayîye.

Kurd careke din vedigerin li ser sehna dîrokê. karên qenc ên ku bi kurdava dest pêkirbû dîrokêda nehate sêrî. we desthilatdarîya xwe bi çetetîyê dest pêkir. pey fasîleke dîrokî kurd rabûn û destbi peywira xwe dikin, edaletê berpa dikin.

Dema hemdemîda mirovahî hewceyî edaletê û rastîyêye, Kurdin zamîn, garant û altindarê edaletê . dagirkerîyêda edeb, tore, exlaq, edalet têk diçe, tê vemirandinê.

Laşê kurda,xwîna kurda bi edaletêva li ser rastîyê û evînê hatîye mewcandinê.,bingeh û dîwarê edaletê kurda hilçinîye,hilbirandîye ev dîwar tu wext hilnaşê.Lewra her mirovekî saxlem,bi wîcdan,bi exlaq edaletê silav dike.Hun çiqasî edaletê pêpez û înkar bikin jî ew qut nabe.

Lewra torîvan û evîndatê edaletê kurd û Kurdistan bi gorî dîroknas ê navdar Galyama Salavat venamire. Cî û warê kurda a ku hezar salanva lê dijîn bêşîka şaristanîya mirovahîyê tê hesibandin .

Mirovahî beqî vê bêşîkê mezin bûye ,gavên balkêş PÎROZ avîtîye Ji bo vê şaristanîyê mirovahî kurdara deyndare .Lê hun dereqa kurdada fikir û ramanên xirab û kotîdanin ji mera fermana tunekirin û ûmha kirin ê hun didin. we bombeyên xîmyayî ( kîmyavî ) jî barandin li ser Xêrosîma, Nakasakîyayê (YAPONYA).

Hela hê jî li wir bi hezaran mirov sreqet têne dunyayê, dunya bê edalet.Dûra we çi anî li serê Vêtnamê, Korêyê û bi dehan dewletên din. We hertim bi vaîskarî, talankarî,bi fikrên xirabva êrîşî li ser gelan û welatan kiriye. Hun êrîşkarê qurnane, manyakê mirovan yê dîrokîne, xaînê miqîmîne, hertim îxanetê hemberî mirovahîyê dikin Qafê weda çi raman û fikirên xirab heye we anî ziman.

Lê hun torinên Selaheddîn Eyyûbî hemberî xwe bivînin û dîroka buhurî têkin bîra xwe .Em bi ezm, bi îrade, bi biryar mînanî bapîrê xwe ala biratîyê, aştîyê,azayê, wekhevîyê ya altindarîyê hildibirînin.

ALA ME YA BIRATÎYÊ yê bimilmile .

Lê hun nizanin biratîyî çîye . Lewra bav û bira, ol û îman, xwedayê we jî dirav û dollare .

Cî û warê me kana xeznaye cavê we hertim têda maye . lê we bi me nikarbûye. Îskenderê mezin kurd girtine birine welatê xwe geçên gelê xwe ên bedew dane kurda ku dola gelê xwe bugehire,ji wanara ji kurdan şervan, rêber, serok, mêrxas, pêşeng çêbin, lê hun fermana şewitandinê, tunebûnê, mirinê didin., careke din mîntalîtêta xwe hov, qirêj, xaîn, xemsarîya xwe a hemberî mirovan dîyar dikin. Îsbat dikin ku hun kîne.. Tercûma-halê xwe we zelal nivîsî.. hun hemîşe jî dijî mirovahîyê xemsar û laqêyd bûne.

Ku tu hatî hilbijartin çawa prêzîdênt ê ŞAY ê te destê xwe danî li ser pirtûka evra „„BÎBLÎYA„„ YÊ û li ber milyonan, li ber vê planêtê sond xwer ku bê mafîyêra, xwîn rijandinêra rê nedî, ji bo parastina mafên mirovan berpirsîyarî te hilda li ser xwe. te li ber xwedayê mezin sond xar û soz da ku bi edalet kar û xebatê bikî û hertim di xizmeta mirovandabî. lê çawa li ser text rûniştî te mejû û ramanên xwe qirêj ê dijî mirovan bê şik anî ziman.. Her weha we testîq kir ku hun ne tenê dujminê mirovanin usa jî dujminê xwedayê dilovanin. hun li ser soz û sonda xwe nesekinîn.

XWEDA LI QURANA PÎROZDA DÎYAR DIKE „KUŞTINA MIROVEKÎ KUŞTINA HEMÛ MIROVAHÎYÊ YE „ (El-Maîde sûre 5, aye 32). Kî ku hemberî bendê xweda bêedaletîyê dike ev bê edaletî xûd hemberî xwedayê mezine jî. Xwedayê mezin em jî xuluqandine, heqê me jî jîyanê heye,kesî heq nedaye we hun ji mera fermana şewtandinê ,tunekirinê û hemberî hevdu rakirinê bidin. Eva cînayetek mezine li hember mirovahîyê û xwedayê dilovan, bê xwedêtîye.

Hun me biçûk nebînin, kurda çend cara biryar û rênîşa dîrokê, demê a dijî mirovahîyê vala derxistine. yê hewla we jî vala derxînin. Kurd nirxên pîroz ra ê mirovahîyêra secdê dikin . yekbûna xwe ra jî îmanê tînin.Li ber vê îmana me desthilatdarên qirêj ên dunyayê şaş û mat mane..Altindarîya me qutbûna wane

Yekbûn wesîla parastina mafê netewan û mirovane.Yekbûn ji bo jîyana bi şeref û pêşketina gelan û kesayetan şert û pêwîste.. YEKBÛN ZEMÎNA SERKETINA MILYONANE. Mijara YEKBÛNA ME EDALET, RASTÎ, WEKHEVÎ Û RIZGARÎYE. bi van prînsîp û pîvanan em bersîva we didin.

Tiştê enî pîroz jîyane,jîyan efrandarîke xwedaye, em ji bo jîyanê dimeşin.Mirov jî derfeta jîyanêye. Ên ku kuştina û tunekirina mirovanra, gelan ra fermanê didin,an jî mafê wan ê jîyanê pêpez û înkar dikin ew îrada ( vîn ) xwedayê mezin û dilovan ra jî îxanetê dikin û dijî heyîna wî dertên.

Koledar hewl dide îrada me şikest bike . lê em bi berxwedan, bi serhildana bersîvê didin. Helwesta neyara me hişîyar dike .

Dagirkerîyêda edeb, tore,exlaq têk diçe. Kurd torîvanê edeb, tore û exlaqêne û dijî dunya bê torê,bê edalet bi îsrarin…….

Kurd miletekî dîrokî berxwedan û navdare . Hêjayî jîyana bi rûmete….

KURD HAKÎMÊ, TORÎVANÊ WEKHEVYÊNE.

CÎHAN HEWCEYÎ EDALETA KURDAYE

*Can Salar*

## Şoreşa Ta Serî

Bextê me reşe, qirdê me kore
Em tim li jêrin, dijmin li jore
Bûka cîhanê bûye ji xelkê re
Bo bira kujî, kurd mêr û şêre

*******

Berzanî rabû milet pê şa bû
Nav û dengê me pir xweş bela bû
koma dijminan her tar û mar bû
Ji destê neyar welat azad bû

*******

Kêmasiya me dijmin dizanî
Êşa me ya kevin-bortî û nezanî
Ji ber vê neyar ji xwere danî
Tevhevî, tenê rind û ciwanî

*******

Herkes dizane, kurdo tû mêrî
Ser danaxînî, li cengê şêrî
Reva te nîne, tû pir bi kêrî
Lê çi bikim, kû tu îro li jêrî

*******

Bav û kalên me ristemê meydan
Salar û Xanî, Şergo û Merwan,
Xanim û deysem, Qazî û pîran
Tev de bi kul çûn, axîn Kurdistan!

*******

Heval û pismam, domam û zerî,
Destê hev bigrin, sitem wer dimrî
Ne tenê salar, herkes bîrwarî!
Milet perwerî- şoreş ta serî...

*******

Şerm û fihête êdî quretî
Pêşmerge dimre rojên ziletî
Tu bûyî caşik, ma ev hikmetî?
Namûs nemaye dijî miletî...

*******

Caşik û dijmin, paşverû bi wan re!
Bi tîp û bi top, kurd nayê xwareê,
Şoreş her dijî, xurt û dijware
Xakê Kurdistan- gora neyare.

19.10.1967



*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)* *wergera ji erebî:* *Mustefa Reşîd*



# Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî

**Xelek 3**

## Guhartina Xwedawendan bi Dirêjahiya Dîrokê

Di herdu xelekên derbasbûyî da me dabû xuyakirin, ku şer û keftelefta li ser erdnîgariyê rastiyeka dîrokî ye û gava em dîroka cîhanê şîrove dikin, nabe em wê rastiyê ji ber çav bidin aliyekî .

Li ber ronahiya vê rastiyê me şer û keftelefta navbera gelên çiyan (pêşiyên gelê Kurd) li bakur û gelên biyabanê (gelên Samî) li başûr şîrove kir û bizava her aliyekî ji van, ku axa Mêzopotamiya û rojhilatê derya Sipî (Sûriya - Libnan - Felestîn) têxin bin serdarî û desthilata xwe.

Di pey ra emê bibînin, ku talankirin û sapandina erebên misilman di sedsala 7-an ya zayînî da bi ser welatên gelên Rojhilata Navîn da, ku Kurdistan jî yek ji wan welatane, tenê pêlek bû ji wan pêlên keftelefta û dijberiya navbera gelên çiyan û gelên biyabanê.

Berî ku em dest bi lêkolîneka kûr û berfireh di vê mijarê da bikin, ka em wek destpêka lêkolînê - ya li pêwendiya navbera Kurd û Islama Siyasî, em hinekê bi kurtahî pêwendiya wan ya li gel hev, yanê ya di navbera xwedawendan û siyasetê da, bi derbasbûn û bihurîna heyamên dîrokî, gengeşe bikin.

## Pêwendiya hevpar di navbera Xwedawend û Siyasetê da

Piştî lêkolîneka dûr û dirêj li mijara ol û ayînan, ji me ra hate xuyakirin, ku şêwaza zanistî ya here baş ji bo têgihîştina naverok û gewherê ol û ayînan, ne daketina xwedawendan ji asman ji bona mirovan li ser erdê ye - bi vajayî wê - ev mijar ji pêwîstiya mirovan ya giyanî û derûnî, û hebûna wan ya civakî-siyasî destpêdike û hildikişe cîhana xwedawend, ferişt, îblîs, dêw, cin û pêriyan. Ji me ra hate xuyakirin, ku ol û ayîn bi çar rolên sereke radibin:

1- Şîrovekirina hebûna cîhanê û ya hebûna mirovan, ku ne ji valahiyê hatiye; divêt jêra mana û naverokek bê dîtin.

2- Lêgerîn li jiyaneka hemdemî (cîhaneka din), ku mirov ji tirs û sawîra mirinê rizgar bibe.

3- Birêxistina pêwendiyên civakî bi awayekî bi rêk û pêk, bi çespandina rêzikên bingehîn: Xêr û guneh, helal û heram.

4- Têrkirina pêwîstiya mirov ya derûnî, ku xwe bi hêzeka bala biparêze, û ji wê hesta bi aramî û mihirvaniyê wergire, gava dikeve rewşa lawaz û bêhêziyê.

Gava hên komên mirovî di heyama civaka destpêkî da bûn, şiyan û îmkana ramanî ya mirovan jî hên lawaz, nizim û destpêkî bû. li gor wê, ayîn jî hên destpêkî bû, ku em kesên niha, olên wê heyamê bi gotina "mîtologî" bi nav dikin. Kesên pispor jêra dibêjin: "Mîtologiya" her civakekê ji koma çîrok û efsaneyên olî yên wê civakê pêktê, yan jî ya şaristaniyekê ji wan şaristaniyan, ku mijara wan herdem li ser afrîner û afrînberan bû, li ser cîhanê û pêkhatina wê bû, li ser şîrovekirina diyardeyên suriştî bû û her weha hemû tiştên pêva girêdayî, ku li pişt perdeya surişt û jiyanê ne, wek xwedawend, nîvxwe da wend, ferişt, îblîs, dêw, cin û pêriyan[1].

Bi gelemperî, mîtologî li dor du têgihînên bi hev va girêdayî dizîvire û diftile, ku ew jî evin:

1- Giyanîbûn - Anîmîzim: Ew bawerî ye, ku giyan di her diyardeyeka suriştî da heye. Hinek ji wan giyanên xêrê ne û hinek jî giyanên şerin. Hîkar û bandora wan li jiyana mirov û jîndaran (heywanan) jî heye. Bi rêya pêkanîna hin dua û dirûzên giyanî û şêwazên sihirbaziyê gengaz û mimkine, ku mirov giyanên xêrê bi dest xwe va bîne û xwe ji giyanên şer biparêze. heya niha, hên jî şopên van pêkhat û şêwazan di olên asîmanî yên bala da hene[1].

2- Totemizim: Ev têgihîn ji gotina "Ot - Otem" ya rûniştivanên petî yên Amerîka hatiye. Totem bi xwe yan dareke, yan giyayeke û yan jî jîndareke, ku taybetmendiyên ciyawaz yên komeka mirovî dinimîne; ew wî ji xwe ra wek parêzvan dibînin û ew kom jêra rêz û hurmetê digirin û wî diperêsin. Ew bawer dikin, ku hêrzan bi navbeynkariya tiştekî ji wî tê. Wan mirovan wêneyê wî totemî li ser hemû tiştên xwe çêdikirin; li ser çekên xwe û li ser hin beşên ten û laşê xwe[1].

Di wan demên dîrokî da, gava sazûmana êlê wek şêweyekî siyasî li ser jiyana mirovan serdar bû, li gor wê xwedawendê êlî hate xuyakirin yan jî peydakirin, ewê ku wek nîşan û sembol yekîtiya êlê ya giyanî û hevgirêdana endamên wê li gel hev dinimîne. Bi xurtbûn û tûjbûna keftelef û dijberiya li ser erdnîgariyê di warê aborî û siyasî da, bi peydabûna pêwîstiya yekkirina hêza êlan û avakirina dewleta yekbûyî ya êlan, êdî "Pantheons" (xwedawendên komên êlî) bi serokatiya xwe da wendekî mezin peyda bûn, ku hin xwedawendên din jî arîkariya wî dikin. Wek nimûne ji bo peydabûna xwedawendên komên êlî "Pantheons", em dikarin li Somer xwedawend Anû, Enlîl û Enkî bi nav bikin[1] û li Sûriyayê em dikarin xwedawend Baal[1], li Atîna Yûnanistanê xwedawend Zeus[1], li Romayê xwedawend Jupiter[1] û li Mekkê xwedawend Hubel[1] wek nimûne bînin ziman.

Bi peydabûna pêwîstiya tûjkirina keftelefta li ser erdnîgariyê ra dewleta "neteweyî/niştîmanî" ya navendî hate avakirin, ji ber ku ev şêweyê dewletê yê herî bi hêz û bi rêk û pêke, yê herî xwedî şiyane, ku dikare di hundirê dewletê da zorê li dijî dijberan û ji bo yekîtiya neteweyê bi kar bîne; û li qada derveyî dewletê, erdnîgariya wê li dijî dijminan biparêze. Bi encama vê rewşa nû pêwîstiya peydakirina "Serekê Yekane" hate holê; ew serekê ku hemû hêz û şiyan di destê wî da be. Wek nimûne: Padîşah, Pêximber, Qiral, Keyser, Emperator, Şahînşah û hwd.

## Sê Diyardeyên Xwedawendî

Bi vê nêrîn û dîtinê, em dikarin sê diyardeyên xwedawendî di dîroka mirovayetiyê da şîrove bikin: - Diyardea Yekemîn: Peydabûna rêberê neteweyî/niştîmanî yê yekane, ku dikarîbû bi dek û dubare û lîstikên xwe hevalên xwe yên destpêkê, endamên şêwermendiya neteweyî/niştîmanî bê hêz bike, wan ji xwe ra bike wek mirûd û dûvik, ku rola wan tenê ew be, fermanên wî bi cih bînin. Di dîroka mirovayetiyê ya kevin da em dikarin Sargonê Akkadî, Hemorabiyê Bibilî, Nasirpalê Duwem yê Aşûrî û Darayê Yekem yê Axamenşî (Farisî) bi nav bikin.

- Diyardeya Duwemîn: Peydabûna xwedawendê neteweyî/niştîmanî yê yekane, ewê ku Serokê Yekane hêza xwe jê distîne. Pir caran ev xwedawendê yekane serekê xwedawendên komên êlî "Pantheons" bû. yan jî yek ji wan bû, ku zora xwedawendên din yên wê komê biribû. yan jî ewên din tenê bi nav hiştibûn, piştî ku bêhêz kiribûn; bi temamî wek rola Serokê Yekane. Nimûneyên di vî warî da, em dikarin xwedawendê neteweyî yê Babil "Xwedawend Merdox" û xwedawendê neteweyî yê Aşûr "Xwedawend Aşûr - Asûr" û her weha xwedawendê neteweyî yê Ibranî " Yahwe" bi nav bikin.

- Diyardeya Sêhemîn: Peydabûna ramana berfirehkirina erdnîgariya niştîmanî bi talakirina erdnîgariya neteweyên din. ji bona bicihanîna vê armancê, dewleta neteweyî/niştîmanî bi reveberiya "Serokê Yekane" pêşî di hundirê dewletê da zordariyeka tund pêkdianî, daku hêza gel/hêza neteweyê bike yek û bikaribe projeya berfireh kirina erdnîgariya neteweyê pêkbîne. Wek nimûne ji bo vê diyardeyê, em dikarin guhartina dewleta Akkadî, ku di bingeha xwe da êlî bû, û çawa di pey ra bû emperatoriyeka berfireh bi rêveberiya Sargon.

Wisa jî dewleta Babilî bi rêveberiya Hemorabî û dewleta Aşûr bi rêveberiya Nasirpalê Duwem .

Hin caran ew xwedawendê sereke bi taybetî û rewiştên xwe yên xwedawendî li gor projeya berfirehkirina erdnîgariya neteweyî/niştîmanî ne guncaw bû (yanê ne li gor pêwîstiyên wê bû).

Hingê Serokê Yekane yan taybetî û rewiştên xwedawendê sereke diguhartin, ku bi rewşê ra bigunce, yan jî hin caran, li gor rewşê, neçar dibû, ku dev ji wî xwedawendê sereke berde û yekî din têxe cihê wî .

Wek nimûne: Çawa qeyserê romanî Kostantînê Mezin sala 312/313 z. dest ji sazûmana ayînî romanî bi serekdariya xwedawendê mezin Jupiter û kurê wî Apollo berda û sazûmana krîstiyanî (mesîhî), ku êdî piraniya gel pê bawerî kiribû xiste cihê wê.

Her wisa jî çawa pêximber Mihemed taybet mendiyên xwedayê îslamî yê gelemper (Allah) bi hemû taybetmendiyên xweda, ku li ba olên Cihû, Krîstiyan û Zaradeştiyê hebûn temam kirin .

Em bi ti awayî angaşt nakin, ku ev rêzik û şêwaz di dîroka hemû netewe û gelan da herdem û gelemper bûn. Lê belê ev diyarde bi awayekî berbiçav di dîroka Rojhilata Navîn ya kevnare û navend da heye û di pir rewşan da tê xuyakirin.

**Çi dibe bila bibe, divêt Kurdistan seranser rizgar bibe!**

*Boniye Cegerxwin*



# KURDISTAN BUHIŞTEKE XWEZAYÎ YE

Ne hesane ji mirhov re ku karibe xewneke xwe, di formekê ji rastiyê de bi derûn û jîn bibîne, yan jî karibe krasekî bêhempa ji sipehîbûnê bi ser bejna xewna xwe de berde û weke bûkeke cîhanî wê pêşkêşî xwêneran bike, bi taybetî gava ku ev xewn Kurdistan be ,lê çiqas ji min bê ezê bi hestekî germ û derûnekî nerm rê bidim ramanên xwe ku ew bi xwe,li sernûsê xwe raxînin û xewna min ji we re ronî û rave bikin.

Xewna min pir ji zûve ye, ji zaroktiya min destpê dike, gava ku min bêhtirî cara navekî lav, bi awaz û sezayeke bilind dibhîst, hiş û hizrê malbatê bi tevahî bi vî navî re xerîk dibû, di peyv û devjenkên bavê min de, herdem derbas dibû. Bi demê re hêdî hêdî, êdî ev nav ji me re bû armanc û hêvî, bû simbola serkeftin û azadiyê, bû hebûna nasnama me ya netewî simbola tekoşîn û serfiraziyê.

Dilî min hergav bi vê peyvê tije ronî dibû, derya sîber û ramanan li min fireh dibû, hizrekî zelal û belû ji min re çêdibû, êdî min armanc ji vê peyva giranbuha re naskir. Ev navê şêrîn ku bavê min herdem li ser dinalî, helbestên xwe pê eragîş dikir û bi dijminan re li ser tim şer dikir, di salên jiyana xwe tevî de pê şeydan bi bû,ev navê şêrîn bê guman Kurdistane.

Kurdistan di mala me de çinareke geş bû, hêviyeke xweş bû, omîdeke bilind û xewneke sermedî bû, awazên wê di hizr û baweriyê min de ta nuha dijîn,gava em diketin nav cihê xwe da em razên, awazeke rewan dikete guhê min ,welatê min…tu yî.. bûka cîhanî.. hemî bax û buhişt û mêrg û kanî.. yan jî bilinde bejn û bala te.. li ser taca te ezmane, yan Kurdistanê Kurdistan baxçê gulan..

Xuşka min Sînem, gava em diketin nav cihê xwe da em razên ev helbest bi awazên lav û şêrîn digotin û pêre jî digirya, min bi xwe nizanîbû çima lê tiştê tê bîra min ez jî pêre digiriyam, hêdî hêdî ez têgihiştim û min zanîbû ku omîda bavê min, delala teva kurdistan bû, di wê demê de ji wan re rastiyeke belû bû lê ji min re xewneke bê dawî bû, di rastiyê de nexuyayî bû, lê gava ez mezin bûm hêdî hêdî ez jî radestî vê rastiyê bûm, wek endamên malbata xwe ez jî ketim rewşa heza kurdistanê û welatperweriyê, lê xewna min hinekî dirêj kir, di hizr û baweriyê min de pêçayî ma, tu carî jî min jibîr nedikir, ji ber ku min bi xwe ji bilî kurdistana rojava nedîtibû, min nikarîbû wek bavê xwe bihestim yan jî pesnê hemû aliyên wê yên din bidim, yan jî bi awakî giştî li ser biaxivim, bihîstin tenê têr nedikir, îro û piştî salên dûr û dirêj xewna min bi cî bû, ez pir kêfxweşim, dligeşim ji dil dikenim, bi rasî derûnê min geş bû,îro ez karim êdî pesnê wê li layekî dî bidim, lê disa jî ne wekî bavê xwe, pesnê bûka cîhanê encex xama nivîskarekî bilind yan jî helbestevanekî mezin kare bi sezayeke rewan pêşkêşî xwêneran bike.

Iro ez li başûrê Kurdistanê azad digerim, serbest dinerim, bê kontrol diçim û têm, diaxifim, bê tirs dilivim Dihestim, bang dikim, xwesteka xwe vekirî rave dikim, ji ber ku ez li vir azadim.

Ez û hevjînê xwe Osman me biryar dabû ku em çend heftiya li başûrê Kurdistanê bigerin û ji nêzîk ve bejn û bala çiyayên wê, yên payebilind bibînin, çavê xwe ji şînahiya jîngeha wê têr bikin,ji bo min ev biryara herî rast bû ku min di jiyana xwe de da ye.

Balafira me li firogeha Hewlêrê danî, ev cara diwemîne ez xwe li wir dibînim, carekê gava em di konferansa Cegerxwîn de beşdar bûn, ew jî çend roj bûn ,me ew di navbera hotêl û cihê konfiransê de bûrand,dem jî zivistan bû, em li kurdistanê negeriyan, lê va ye dîsa ez xwe li ber pencera kontrola pasporta dibînim,devliken xortekî çeleng ji min dipirse:Daye winê çend roja li vir bimînin, winê li ku bin ,min jî bi dilovanî bersiva wî da û min got kurê min me dema vegerê belû ne kiriye, emê li hin bajaran ji xwe re hinekî bigerin,bi rêz û rûmet got:

Erê win kurdê rojava ne? bexêr bên welatê xwe her berdewamkir û got:

Tenê min pirsî da ez ji we re bêjim, piştî 15 roja divê win vîza xwe dirêj bikin, win li kîjan bajarî jî bin, win karin bikin. Bi rastî awê axavtina wî bala min kişand, dilê min jî pir xweşkir ,hat ber çavê min çawa li sûrî bi mere diaxivîn, çawa bi awakî kirêt, bi dengekî bilind ji me dipirsîn ,min xortê delal sipas kir û dilgeş em ji wir çûn .destpêka gera me ji bo min nîşaneke pir geş bû ,ji nûve em bi rê ketin.

Hewlêr çiqas ez bixwazim pesnê te bidim, ezê bê guman kêmasiyê di derheqê te de bikim, Dihok, Zaxo û Suleymaniye win jî tev ji min re lav û nazdarin, ez qet nikarim di pesnê we de cudayetiyê bikim, çawa mirov nikarî cudayetiyê di nav zarokê xwe de bike ew jî wilo ye, lê ez karim bêjim ku her yek ji wan taybetmendiyeke wê heye bi wê ve hatiye girêdan û pê hatiye naskirin. Keleha Hewlêrê,parka şanederê û ya Samî ebdulrehman, ez pir şadîman kirim, avahî û sûkên wê, ez pir kêfxweş kirim, her tişt têde ji bo min pir xweş û geş bûn.

Çiya û deştên Kurdistanê pir lav û nazdarin, bi dilovaniyeke bê hempa mirov hembêz dikin, bi awazên xwezayî nerm mirov dorpêç dikin,hêdî hêdî te bi xwe re hildikşînin jor, ji nişka ve tu xwe li serê çiyakî dibênî, li xwar li deştê xweş dimeyzênî, bi wan dar û zeviyên ku di singa çiyê de cihê xwe girtine dikenî û diaxivî û dîsa ji nişka tu xwe li ber rûbarekî li xwar dibênî, êdî mirov bi vî dîmenî re şeydan dibe û ji xwe re dibêje, xweda ma ev raste yan jî xewne, ji loma min jî herdem ji hevjînê xwe re digot: Osman wêna bigre, xuyaye min bawer nedikir, min dixwest ku wêne ji minre bibin dekoment, gava ez ji vê xewnê şiyar bibim, ji ber wilo jî min destê xwe bi ser giya û kulîlka re dibir û tanî, bi dilovanî ew hembêz dikirin û min ji her yekî ji wan dipirsî: Navê te çi ye ? Min wêne bi wan re digir .

Çiyayên kurdistanê di nav wan de hesteke hevbeş heye,her yek ji yê dî re pêlên evîndariya xwe rêdikî,her çiyakî bi awakî silavê li te vedgerênî,ji xwe avrêz û sulavên wê nayên pesindan, her û ha şikeftên wê jî, wek şikefta anîşkê û yên din ez şad û pir kêfxweş kirim .

Li Kurdistanê mirhov naxwaze li hundir rûnê, her yek dixwaze li çol û çiya be, li nav gul û geya be, ji xwe xelkê wê tev di hembêza deşt û çîmenên wê de herdem rojên xwe dibûrînin, dixun, vedxun û dîlanê dikin .

Li bajarê Dihokê em baş çûn û hatin, cihê pêşîn ku me serdanana wî kir, yekîtiya nivîskarên Kurd bû, gava em li ber dergehê wê daketin, peykerê Cegerxwîn bi payebilindiyeke bêhempa silavê li mirhova dike û derbasî hundir dike, li hemû jûra te digerîne û li ber her wêneyekî ji navdarên kurd te radiwestîne, min pir wêne bi wan re girtin û li gel serokê nivîskara Kek Hesen Slîvanî yê ku bi rêz û rûmet pêşewaziya me kir û li gel hin hevalan, em li hemî jûrên avahiyê gerandin û ji mer e şîrove kir .

Bi rastî ev ji bo min bîranîneke pir xweş bû .Ji xwe çûna me kampa Dumizê bi hevala me ya hêja re Diya Ciwan, em gelek şad kirin û ji nêzîk ve me rewşa penaberên kurd yên rojave û zarokên wa li dibistanan naskir û tevî ku ew li welatê xwe ne, lê ji min re hestên cûda peyde bûn ez dil bi êş û xemgîn kirim.

Rojên me li Kurdistanê tev dagirtî bûn, me ne dixwest rojek vala here, ji xwe çûa me li Laleşê hinek ji xemgîniya min belakir û ez ji nûve dilgeş kirim, ji bo min her ew bûyer û agahiyên nû bûn, bi rastî her bajarekî ji kurdistanê bîranînên cûda ji min re hiştin,lê eger ez yek bi yek li ser biaxivim, pirtûkek jêre divê, tenê ez dixwazim dilxweşiya xwe bi we re par bikim û bi giştî li ser Kurdistana me ya delal ya başûr hinekî rave bikim.

Me serdana xwe berdewam kir û em çûne Zaxo ya şêrîn ûdelal, bi alîkariya herdû hevalên me yên hêja Beyar Bavî û Şewket Sindî yên kû min berî çend sala di konferansa wêjeya Kurdî li Batmanê ew dîtibûn, em li Zaxoyê û li çiyayên wê yên dilovan baş geriyan, dîtina wan û Zaxoya delal dilê min geş kirin bi taybetî gava ku em li gel malbatên wan ve derketin seyranê, ev seyrana me û naskirna me bi dost û hevala re dilê me şad û geş kir her û ha gera me li Kurdistanê bi giştî em kêfxweş kirin û her min helbesta bavê xwe digot:

Welatê min tu wî bûka cîhanî, bi rastî welatê me bûka cîhanê ye, min nêzîkî 15 dewleta ziyaret kiriye lê min wek Kurdistanê qet xweş nedîtiye, ji lewra ez dibêjim, kesê ku bixwazî herî ji xwe re li welata bigerî bela pêşî biçe kurdistanê.

Bi vî awî em gihane dawiya gera xwe û sipîdê me kara vegera xwe kir. Ez ji hemû hevalên xwe yên ji başûrê Kurdistanê ne û li Swêdê dijîn dibêjim: Vegerin li Kurdistanê bijîn, Kurdistan buhişteke xwezayî ye. Ev çûna me ji min re bûye bîranîneke pir xweş, di jiyana min de herdem cihekî bilind digre, sipas

*Lokman Polat*



# BINXETÊ /ROJAVA STARGEHA KURDÊN BAKUR

Başurê rojavayê Kurdistanê ji sala 1925 û virve ji bo kurdên bakur bûye stargeh. Kurdên bakur yên siyasî û serhildêrên çekdar ên kurd ku beşdarê serhildanên dema çuyî bûbûn dema diketin tengasiyê berê xwe didane binxetê ango rojavayê Kurdistanê. Welatparêzên kurd yên ji malbata Bedirxaniyên Cizîrê çûbûn li binxetê bi cih û war bûbûn. Kamuran û Celadet Bedirxan li binxetê ji bo kurdayetiyê, ji bo çand, wêje û zimanê kurdî gelek xebatên hêja pêk anîn û kovarên xwerû bi kurdî û herweha alfabeya kurdî/latînî weşandin. Piştê têkçûna serhildana Şêx Saîd gelek çekdarên serhildêr çûn binxetê. Siyasetmedarê kurd ê navdar Memduh Selîm, katibê Şêx Saîd Fehmiyê Bîlal û Lehengê kurd ê binavûdeng Yadîn Paşa jî ji bo demeke çûn li bin xetê man. Ew der ji wan re bû stargeh û ew paşê vegeriyan bakurê Kurdistanê û şerê çekdarî domandin.

Dema di sala 1980-yî de li Tirkiyê cunta faşîst a leşkerî hat ser hikum bi hezaran welatparêz û şoreşgerên kurd û tirk girtin kirin zindanê. Bi sedan qadirên siyasî yên kurd û tirk ên ku nehatibûn girtin berê xwe dan binxetê û li Suriyê bi cih bun.

Hema bibêj tevahiya serok û sekreterên partî û rêxistinên kurdên bakur jî çûn binxetê, Gelê kurd ên li binxetê/rojava welatperwerbûn û li kurdên bakur xwedî derketin, wan hewandin, alîkariya wan kirin. Dema li bakurê Kurdistanê şerê çekdarî dest pê kir bi sedan xort û keçên kurd ên binxetê çûn sere çiyan û beşdarê nav hêza gerîlla bûn. Li ser axa bakurê Kurdistanê bi sedan kurdên binxetê şehîd ketin.

Kurdistana başurê rojava perça herî piçûke û hetanî şoreşê (ku ev şoreşa kurdên rojava hêj didome) di bin zilma dewleta Suriyê de bû. Di vê perça Kurdistanê de gelê kurd ji hemû mafê xwe ê netewî û demokratîk bêpar bû. Li wir tu mafekî gelê kurd tunebû. Bi sedhezaran kurd hemwelatiyê Suriyê nebû. Li wir kurd li ser axa xwe wek biyanî dihat hesibandin.

Xisusiyeta herî berbiçav a kurdên binxetê ev e ku; ew bi pirranî welatparêzin, li doza netewî û demokratîk xwedî derketine û derdikevin. Kurdên binxetê herdem li kîjan parçeya Kurdistanê livandinek bûye piştgirî kirine.

Di navbera bakur û rojavayê Kurdistanê de axa mayinkirî heye, ew di nav mayinan de derbas bûne û di nav têkoşîn û şerê germ de li cem birayên xwe cih girtine û herweha ji hêla madî û manewî piştgiriya birayên xwe ên parçeyên din kirine.


Dewleta navendî ya Surîyeyê alfabeya arebî bi kar tine, lê kurdên binxetê alfabeya latînî/kurdî bi kar tînin, li binxetê/rojava ji sala 1932 heta niha bi sedan kovarên kurdî yên bi tîpên latînî kurdî derketine. Mîr Celadet Bedirxan û Kamiran Bedirxan di sala 1932 de kovara "Hawar" derxistin. Wan paşê kovara "Ronahî" û "Roja Nû" weşandin. Piştî rawestandina van hersê kovaran di sala 1960î de Hesen Hişyar bi navê "Agahî" weşanek derxist. Piştre di sala 1968an de Cegerxwîn dest bi weşandina kovara "Gulîstan" kir.




Min 14-e sal berê, di sala 1999 de bi navê ***"Danasîna Kovarên kurdî yên li Kurdistana Suriyê"*** pirtûkeke lêkolînî ya li ser kovargeriya binxetê/rojava weşand. Pirtûk li Stockholm/ Swêdê di nav weşanên "Helwest" de derket. Di vê pirtûka min de danasîna 25 kovarên kurdî yên ku li binxetê derketine û lîsteya 50 kovarên kurdî yên binxetê ku di pêvajoya sala 1932 heta 1999 derketine, weşand. Li bin xetê bi sedan pirtûkên kurdî yên çîrok, helbest û roman jî derketine. Pirtûkên hinek nivîskarên binxetê li bakur jî hatine weşandin û ji alî xwendevanên kurd ên bakur hatine ecibandin. Herwekî nivîskar Helîm Yusiv, Bavê Nazê, Jan Dost, Fawaz Huseyin û hwd.

Min di pirtûka xwe ya bi navê ***"Danasîna Kovarên kurdî yên li Kurdistana Suriyê"*** de li ser Hesen Hişyar, Osman Sebrî û Cegerxwîn gotar nivîsî û herweha min pirtûka Osman Sebrî ya bi navê "Çar Leheng" da danasînê û nirxand. Min di pirtûkê de hevpeyvînên ku min bi Kamiran Hajo, Fethulla Huseynî, Mihemed Hemo û berpirsiyarê kovara "Pirs"ê re kiribû, weşand. Ev pirtûka min a lêkolînî ji bo danasîna kovargerîya kurdî ya li bin xetê/rojava bû çavkanî. Bi hêviya ku li ser kovargeriya kurdî a binxetê lêkolînên nû werine kirin û kovarên ku piştî sala 1999 derketine werine nirxandin.

*Ehmed Mustefa*



# Hunerbaza Bav Kurd Moune Wasif

Navê xwe ya rastî Moune Cêlmiran Mustefa Wasif, Ji Kurdên Sûrîyê ye

## Kurte jîyana wê

Di sala 1939 an de li Şamê ji dayîk bûye.. dayîka Moune Wasif bixwe ji Erebên fileh e û bavê xwe jî Kurd e.

Lê wek tê naskirin ew stêra tilvizyona Sûrîyê ye. dema temenê wê heft 7 salî bû di Jada /Al-Habid/ de mezin bû û dibêjin „Jada Şeref".

Ew bixwe di sala 2002 an de Sefîra Dostanîyê bû.

Di tilvizyonê de bêtir karê xwe yê (Hunerbazî) dikir.. Sala 1991 heya sala 1995 an li paytexta Sûrîyê Şamê wek rêvebira nivîsînîyê bû.

Moune, di van salan de di şano, sînema, tilvizyon û mihrîcanan de wek dadgehekê dihat hejmartin û pê radibû . Wek dadgehekê dihat hesibandin û kar dikir .



Di Sala 1963 an de Moune Wasif bi Derhênerê Sûrîyê re „Mihemmed Şahîn" re zewicî.

Zarokek wan bi tenê heye navê wî „Umar Abdill Hamîd" e .

Wek tê nasîn, Abdill Hamîd di Opozisyona Sûrî de kar dike û bi tevahî tê naskirin . Bi Ewrupîyan re kar û xebatên diplomasîyê dike û bi serokên dewletan re dostanîva vî mirovî gelekî heye. Dostê Serokê Amerîka (Georg Bûsh) yê biçûk e heya vê demê .

Wek dibêjin û xelk û alem matmayî dimînin, ji ber ku kar û xebat bi cihûyan re dikeû di Opozisyona Sûrîyê de jî mirovekî jîr û jêhatî tê hesibandin . Bi xwe tev jina xwe û du zarokên xwe li Amerîkayê rûniştiye .

*Esker Buyik*



# *Ahmedê Mîrazî **

## *1899-1961*



***"Îro min nemeke wa, ji hevalê xwe, rewşenbîrekî kurdî sovêta berê yê xweyî emek Prîskê Mihoyî stend: „ Îsal 115- salîya Ahmedê Mîrazî temam dibe. Roja bûyîna wî ne eyane. Li ser vê yekê min du gotin li ser textê xwe nivîsî û xebera apê Hecî derheqa Mîrazîde da. Eger bal te tiştek hebe, hêvî dikim binvîse. Heyfa wî camêrî, eger em bîr neynin, lê kê wê bîr bînê""***

*Ahmedê Şewêş Mîrazî (Mîrazov) sala 1899 li gundê Tûtekê, navça Dîadînê, herema Bazîdê, Bakûrê Kurdistanê hatîyê diniyayê.*

*Tûtek gundê kurda bû. Kurden musulman û êzdî tev bi biratî dijîtin. Nivîskar, bîranînêd xwe da wa dinivîse: „ Ji berê da şêxa, mela, hakima em ji hev qetandibûn, ayîna dîn da em başqe kiribûn, ser wê yekê jî firqî û cudatiya me tenê di ayîna dînda hebû. Lê ew jî çaxê eyda me, cînar temam eyda me digeriyan. Wextê dibû eyda Remezanê, dîsa em tevhev li eyada wan digeriyan û eydê hev bimbarek dikirin, usa jî şîn û şaya da em tevbûn, xulese, forma me yek bû, zaravê me yek bû, edetê me yek bû, dixwezim bêjim, ku ayîna dîn nîbûya, em tiştekî mayîn ji hev nedihatin kivşê, çimkî em kurap û kurêd bavê hev bûn". (1)*

*Di mala Şewêş da bûyareke sade diqewime û ew bûyar qedera jîyana Ahmed, lawê malêyî biçûk carekêva diguher e. Rojekê Şewaş nemekê diştîne. Xêncî melayê gund, kesê ku bikaribe nemê bixûne gund da nîbû, mela jî ji cîyada çûbû. Bav tê ser wê fikrê ku bê xwendin-nivîsar êdî nabe û lawê xweyî mezin dişêwire:*

*-Têmûr lawo, lê heta kengê em wa nexwendî, nezan, wa di tarîyê da bimînin? Çi meriivê nexwendî çi mirîşka kor, herdu jî yek in. Were em Ahmed bidine ber xwendinê.*

*Neferê malê ji hev dişêwirin û biriyarê didin Ahmed bişîne bal melayê gund, xwendinê.*

*Birîyareke wa, li wê demê, di nav êzdîyan da, bi rastî jî gaveke pêşketinê ye bi culet bû. Çawa eyane oldarên êzdîyan xwendin-nivîsar li êzdiyan heram kiribûn, xwendin-nivîsar gune dihate dîtin, ew jî xwendin li cem melayê musulman, eva êdî tiştê nebûnê bû.*

*Lê rastiya jîyanê û dostanî, cinartiya gundiya ye bêqelp Şewêş berbi wê fikrê dibe, Ne Şewaş, ne jî gundiyê dorê wî tu xirabiyê, qezîyayê u gune di wê xwestina xwe da nabînin, fikira mela ra jî tiştekî bo ola wî gune derbaz nabe û bi hizkirin fêrkirina zaroka êzdî hildide…*

*Wusa ne, eger nepak û nemam, bi xwestinê xwe ye şexsî ye neqenc, ji bo berjewendiyên xwe, desthila tdariya xwe bêtifaqiyê û neyartiyê nekin li nav gelê Kurd, ji vî gelî tifaqtir, heyftir, merîfettir, xîrettir, zanetir gel tune…*

*Lê dagerkiran, detshilatdaran, oldarên qelp, seva vî gelî li nav lepên xwe da xweyîkin, bi qelpî û zanebûn cudatyê dîn, bawariyê, eşîrtiyê, qebîltiyê kirine çekên birakujiyê û Kurdistanê da tim şer û pevçûnên navxweyî gurr kirine, antêxê neyartiya nava gelda nehîştine vêse.*

*Ahmed du sala bal mela Kakaşêx dixûne, fêrî xwendin-nivîsandinê dibe, efrandinên helbestvanên rojhilatêye mezin ra dibe nas. Kêfa der û cînaran, heta ya Axê gund jî xwendina lawikê zên ra tê, qîmet didinê. Mela şagirtê xweyî aqilî-zîrek hiz dike û temiyê dide Şewêşê bavê wî, ku Ahmed bide dibistana Dîadînê.*

*Çawa ji bîranînên nivîskar tê texmînkirin dema xwendina Dîadînê zanebûnên wî ne ku tenê di werê xwendinê da pêş dikevin, lê digihîje xwehisîn û xwenaskirina netewiyê. Vira ew pê dihise ku Serhed warê dengbêj, helbestvan û zanên wek Ehmedê Xanî, Evdalê Zeynikê, Mele Mehmûd Bazîdî û gelekên din bûye. Efrandinên wan mezinên gelê xwe ra dibe nas, cî û warê wan digere, guh dide derheqa wan da bîranînên zarbêjan, dibe bengî û dengbêjê sitiranên bilbilê weletê Serhedê: Evdalê Zeynikê.*

*Dest bi herba cihanê ye ewlin dibe, Pêla herba malwêran digihîje welatê wî jî, Xwendina wî nîvcî dimîne, Bengîyê xwendin û zanebûnê bere xwe dide welatê Rûs navça Ermenistanê, berpala çiyayê Elegezê, herema êzdiyan, bi wî meremî ku li wur dibistana gundê Qundesazê ye Rûsî da xwendina xwe berdewan bike. Wê demê, ew der dikete nav hudûdê dewleta Rûs, û sala 1900 î deshilatdarên rûs bi xwestina serokê Êzdiyan yê wê heremê-Ûsiv Begê Hesen axa, li sê gundên kurden êzdî da (Zorê li navça Surmelyê, Sarîblax li navça Qersê û Qundesazê li navça Elegezê) dibistan vekiribû.*

*Lê bextê wî ra, li wur jî êdî dibistan nedixebitî. Diçe bajarê Tilbîsê, Wî bajarîda jî tu mecalê xwendinê dêst wî nakevin. Mecbûr du-sê sala xebatên cûrbiçûr dike û vedigere… Êdî gundê xweyî edîlî, gundê berêî şên navîne :*

*„Em çûne nêzîkî gund û hîvîyê bûn ku kêf, eşq û şayî wê bêne pêşîya me, Lê wî teherî nehatin .*

*Li der û dorêd gund pez, berx diçêrîyan, lê dengê bilûrêd şivan, stiranêd berxvan, kake-kakêd pala û rêwîya nedihat.. Kanê, niha gerek zarra binatara mala da bilîstana ku em bidîtana, bireviyana bihatana pêşîya me. Ew jî tune. Berê wekî kulfet li nava gund dihatin-diçûn, ringe-ringa lingêd wan bû, te digot qey sîyar in derbaz dibin, lê niha? Nerm û posîde dihatin diçûn û nerm bi hevra xeberdidan. Berê te li nav gund dinihêrî, mina kulîlkêd baharê kincê kulfet sor û zer dikir. Lê niha? Niha geleka bi kincê reş bûn, usa jî serê wan bi şerêd reş girêdayî bûn. Meriv digot roj a wan jî tev wan heznî ye…"*

*Ew navçe jî bûbû cîyê cerdê û qaçaxan, talên, şer û dewan. Dîsa cudatî, neheqî, birakujî, şer û dew. Dîsa dijîtî û neyartiya bawariyê. Kurdên heremêye êzdî mecbûr tevî ermeniya dibin û direvin berbi Ermenistana îroyîn. Ahmedê Mîrazî jî bo ji leşkerên Tirkan hêsîrên êzdiyan biparêzin tevî şervanê Cangîr axa** dibe dijî wan şer dikin. Wê şerkariyê da ew wek zilamekî xwendî, zane, têgihîştî û dengbêj tê dîtin û li nav civakê da tê hizkirin.*

*Dibe şedê bûyarên tiragîk e giran.*

*Dema qeydê sovêtê komarên Pişkavkazê da tê demezirandin, agirê şer û dewên navxweyî vêdisin, destê lêşkerê dewleta tirk nikare bigihîje wan, Mîrazî diçe bajarê Tilbîsê.*

*Wê demê Tilbîs tije mihacirên kurden êzdî bûbû: zarokên sêwî, malbet, evdên ji kokkujî û zulma Roma reş, xelayî û nexweşîyên salên 1918-1920 an bi teherekî xilazbûyî hilşîyabûne kolanên wî bajarî. Ew civaka nexwendiye, nezan ku ji gundê xwe derneketibûn, ji jîyana gundîtiyê bi carekêva ketibûne nava jîyana bajêr, karên herî reş dikirin, halê aborî xirab da dijîtin, hewcê alîkarya evdên têgihîştî û zane bûn. Ahmedê Mîrazî wek rewşenbîrekî gelê xweyî xemxur, dikeve nav wan û xebata civakî û kûltûrîye pîroz dike.*

*Kilûba bajêr, ya ser navê Lûkaşîn û dibistana seva zarokên êzdiyan ku bi însîatîva Lazo (Hakob Xazaryan) hatibû vekirin seva kurdên bajêr dibin navendên kûltûr-civakî. Mîrazî jî tevî Gûsêynov Îrzad, Lazo, Emînê Evdal , Kamil Bedirxan, Esoyê Cango, Hovhanês Sîsyan û yêd din li nav wê civakê da xebatê dike. Komên kilam-reqasê, tîatroyê, dengbêjîyê didin demezirandin, kûrsên hildana nexwendîtiyê vedikin, diçine mala, civakê ra lêksîya dixûnin.*

*Ehmed ji bo komê tîatroyê şanoya dinivîse, wanda dilîze, komên kilam-reqasê da pêşda tê, helbesta dinivîse, kilamê nû çê dike. Bere-bere xebata wî berfire dibe.*

*Gurcistanê da wek rewşenbîrekî kurd tê naskirin. Gelek cara tê bijartin wek dêpûtatê (nûnerê) şeredariya bajarê Tilbîsê. Wî dişînine wan nehîyên komara Gurcistanê, kîderê gundên kurdan lê hebûn. Pirtûka wî ya bîranînanda perçen pirr hewaskar wê derheqê da hene.*

*Dema dijwerîyên rêjîma dîktatorya Stalîn ew jî tê zêrandin.*

*Sala 1937 a Mîrazî dişînine bajarê Moskivayê xwendine. Ji pey xwendinê ra vedigere nav (xizmê) merivê xwe, Ermenistanê. Nehîya Hoktêmbêryanê da gelek xebatên cûrbicûr dike. Sala 1961 ê li gundê wê nehîyê Yêxêgnûtê (Qamûşlûyê) 62 salyê da diçe ber diovanîya Xwedê.*

*****

*Di salên bîstî (sedsala borî) dest bi kare Ahmedê Mîrazî dibe. Ew ji nivîskar û rewşenbîrên kurd û ermenî, rewşenbîrên kurd û ermenî, (yê di nav kûltûra kurdên sovêtê da dixebitîn) yên dema xwe, cuda dibû:*

*-Ahmedê Mîrazî nava eşîreke kurdaye qedîm da mezin bûbû, hucrê da li ber destê mela xwendibû, edebîyeta rojhilatê ra bûbû nas, haj edebîyeta kurdaye kilasîk hebû, erf-edet, eyd-erefat, rabûn-rûniştandina kurdên êzdî jî, musulman jî rind zanibû.*

*-zimanê wî paqij û zengîn bû.*

*-odên kurmanciyê, li nav çîrokbêj û dengbêja da mezin bûbû, zargotina miletiyê rind zanibû, ji çevkanîyê da kilamên Evdalê Zeynikê distira.*

*-şer-dew, komkujiyên wan sala, reva ji welêt, xelayî û nexweşiyên salên 1918-1920 a gişk bi çavê xwe dîtibû. Dîtibû çawa cînar, dost û kirîv,*

*ku wek bira, kurê bavê hev, serê xwe li ber hevda didan, eyd-erefat, şîn û şayê hev bûn, rakiribûn dijî hev…Ewî ne ku tenê ew malwêranî bi çavê xwe dîtibû, bûbû şedê wan bûyaran tiragîk, lê mecbûr tevî wan bûbû.*

*-şûret û hewasa wîye efrandariyê zêdebû.*

*-nivîskar, rewşenbîr û pêşewitiyê gelê xwe bû.*

*Lê mixabin, wê demê efrandinên here kêm hatine weşendin û gihîştine destê me yê Ahmedê Mîraz îne…*

*Efrandarekî weke wî ra, di nav 40 salên edrandariya aktîv da, weşandina şanok û pirtûkeke bîranînaye biçûk (ew jî ji pey mirinê ra) û di rojnema "RÎYA TEZE" da çend helbest, gelo tiştekî nabêje… Ew ji wî çaxî, îlahî salên 1930-1936 a, ku salê bi orte 25 nav pirtûk dihatin weşendin., Dema bi çavê niha wan weşena jî tê nêhêrandîn, payê wanî pirê xêncî rola wane dîrokî (çawa kitêb bi kurdî hatine weşendin) tu qîmetê wan di warê edebî, zaniyarî, zimên da tune. Antologiyayên niîskarên kurmanca da navê wî nayê xanê…*

*Wî çaxî, ku hê sala 1936 a kurdzanê eyan O. Vîlçyêvskî derheqa Ahmedî Mîrazî da dinivîse: „ Dema Ahmedê Mîrazî sitiranên xwe dihûne, hemû cûre û hunurên zargotina gelêrî bi kar tîne, ji pêra jî heta dewîyê ji xizna folklora kurdîra amin dimîne." (2)*

*Prof. Hecyê Cindî jî we dinivîse: „ A. Şewêş esil dengbêj bû, dengekî xweş lê, gula dewata û şaya bû. Ewî ne ku tenê kilamêd gotî hildida û digot, lê belê usa jî ji ber xwe derdixist wekî din, herge em bêjin ew dengbêj-efrandar bû û çawa zargotina cimetê usa jî ewî gelek û gelek beyt-serhatî, metelok û qise zanî bû. Bi vî teherî kaneke zargotina cimetê bû, bi roja, heftya dikarî bû pey hevdu bigota, bistira, lê ne westandina wî hebû, ne jî xilasbûna kilamêd wî. Bi saya xweşgotina xwe, herçê guhdarvanêd wî ji wî, ji dîndarê, gilî gotina, zarê şirîn têr nedibûn". (3)*

*Ji salên bîstî helbest û kilamên wî li nav kurdên Gurcistan û Ermenistanê da bela dibin û ji aliyê gel da têne hizkirin. Hinek ji wan rojnema "RIYA TEZE" û kitêbên dersan da têne weşendin.(4 )*

*Sala 1935 şanoya wî: „ Zemanê çûyî" tê weşandin. Naverok û bûyarên şanoyê nivîskar ji jîyana kurdan êzdî yên herema Bazîdê, welatê xweyî undakirî hildabû. Şanoyê da halê evdên kurde rêncber, xebatçî, zordarî û neheqiya axa, beg û desthiatdaran li ser wan tê nîşandan. Bûyarên salên 1918-1920 halê wê civakê dijwertir dikin, xelk milk û malê xwe jî dihêlin êzdî direvine Ermenistanê, musulman jî aliyê Wanê...*

*Dema vê şanoyê ra meriv dibe nas, şureta wî ya nivîskariyê, şanogeryê derdikeve li ber çeva. Hecîyê Cindî pêşxebera berevoka wî „Bîranînên min" da derheqa vê şanoyê da wa dinivîse: „ Eva pîyêsa bi serecem bedewsinetî, îdêya xwe va hê-hê nava edebyeta me da cîkî meşûr digre".(5 )*

*Bawarkî 30 salî ji pey weşena wê şanoyê ra sala 1966 (5 sala ji pey wefatbûna nivîskar) pirtûka wî ya „Bîranînêd min" bi rêdaktorya Prof. Hecîyê Cindî û Emerîkê Serdar tê weşendin. Pirtûkê carekê va guhdariya xwendevana kişande ser xwe, ji aliyê xwendevana va hate hizkirin û qîmetkirin.*

*Min, çend cara, bi hewaseke mezin, pirtûka „ Bîranînêd min" xwendiye.û jê têr nebûme. Eva ji wan pirtûkên pirrqîmet û girannirxe, ku di nav nivîsarên kurdên Sovêtê yên vekirîye wê demê û yê paşê da jî degme rastî xwendevana tên. Niha jî nivîsarên usaye serketî kêmin.*

*Pirtûk sala 1997 a, li nav weşenê DENG da li Îstanbolê jî hate weşandin.*

*Di nav vê pirtûka biçûk da nivîskar bi hostatî karibye halê gelê kurd yê wê deverê, bûyarên salên 1900-1925 usa zêndî, zelal û hewaskar, bi reng-rewş raxe li ber çavê xwendevana. Dîrok û cîhilbûna Êzdiyên Ermenistanê, şerê birakujiyê, zulma Roma reş, rev-bez û halê civakêyî malwêran, ji aliyê tu nivîskarî û zanîyarî va usa tam, rêalîstî, rast nehatiye şirokirin çawa vê pirtûka biçûk da.*

*Kê dixweze rastîya bûyarên salên 1918-1920, koçberiyaa êzdyên Ermenistanê û sebebên navbera kurdan da şerên birakujiyêyî bêfikir bihese, bira vê pirtka biçûk bixûne. Raste bi sebebên sîyasiya Welatê Sovêtê nivîskar derheqa gelek bûyara da sergirtî dinivîse, lê di nav wê nivîsara kurt jî keser û nerazîbûna wî tê xanê.*

*Pirtûkê da perçek heye, ku bîra min naçe. Kurd dijî kurda şer dikin û pîrekeke kurdên musurman çêleka xwe va dikeve destê kurdên êzdî. Nivîskar jî ji alîyê êzdiyan di nav wî şerîda bûye. Êzdî bi gotina wî dixwezin pîrekê û çêleka wê bişînine gunde wê bal kurdên musulmam. Ji bo nav û bêqezîyabûna jinikê nemeke wa alîyê din ra dişînin:*

*„Gelî pismama! Rast e em îro li hev bûne neyar, hev dikujin, bûne birakuj. Paşî dijminatiyê dostî jî heye. Emê wextekî ji kirina xwe poşman bin, yêd pey mera rabin wê bi me bikenin û bêjin: Bira jî birê bikuje? Ew êdî şuxulê paşê ye. Niha raste em neyarin, lê namûs başqeye, çimkî namûs avîtine ber kûçikê, kûçika jî pêl lê nekirine. Lawkê me îro çûbûne dewriyê, ev kulfeta bi çêlekeke sor va di zanga Qerehesarê da dîtibûn û anîbûn. Niha jî em ser weda verrê dikin, ez bi wî xudayîkim, ku em û hûn tev dihebînin, ev kulfeta han bê şik û bê şobhe qebûlkin. Me teva jî usa li wê nihêriye, çawa li xûşka xwe ye helal nihêriye, Bi xatirê we. Ahmedê Şewêş".*

*Neme xweş hatîye nivîsar. Naveroka wê rastîke bi êş û birîn e, pirsgirêka gelê Kurd ya bi dewranaye. Îro jî, ji bo tifaq û rastya kurdewarîyê hewceye evdên Kurd dor naveroka vê nema kurt e çend xetê bifikirin.*

*Ev pirtûk usa jî cevkanîke giranbiha ye derheqa Evdalê Zeynikê, erf-edetê kurdayê wê demê, dîroka civaka kurdên Gurcistanê û gelek pirsên din da.*

*Prof. Hecyê Cindî pêşxebera vê pirtûkê da derheqa efrandinên Ahmedê Mîrazî da hinek fikirên wa nivîsîye: (6)*

*„ Van salêd paşin A.Şewêş berevoka şiêrêd xwe hazir kir, pêra jî eva kitêba bi sernivîsara „ Bîranînêd min".*

*„ Mîrazî, van salêd paşin da hê gelekî bi nivîsarê mijûl dibû: nivîsîn, kire berevokekê, wekî bide neşirê, pêra jî çawa me got, eva kitêba hazirkir".*

*Pirs pêjda tê lê kune ew „ gelek efrandinên wî", „ berevoka helbesta"?*

*Min ji devê geleka bihîstîye derheqa romaneke wî da… Kune? Arşîva wî kuye?*

*Derheqa vê pirsê da niviskarên me timê li nav xweda diaxivîn lê ne tişt hatîye nivîsar û ne jî tişt hatîye kirin.*

*Ez mecbûrim ji bo lêkolînvanê paşwextîyê vê pirsgirêkê hevkî ronîkim.*

*****

*Ahmedê Mîrazî û gelek nivîskarên kurdê Ermenistanê, di zêndîtya xwe da karibûn ancax pirtûkek –dudê biçûk biweşînin. Ew jî bi zemetî, teherekî pirr dijwer, carna bi şerr-dew û rezîltî... Çi bû sebeb? Gelo wan jîyana xwe ya efrandariyê da tek ewqas tişt efrandin? Lê nivîsarên wane din çawa bûn?*

*Li wur pirtûkek weşendin ji bo nivîskarekî kurdî bê „ kursî, nas-dost û pişt" bi piraktîkî tiştekî nebûnê bû. Her kesî nikaribû wek niha, pirtûka xwe biweşanda ( bi mecalên xwe jî). Welatê Sovêtê da pirtûk gotî bi sîyasîya deshilatdariyê bûya, bi destûra dewletê û bi dewletî bihata weşandin. Cûrekî din tunebû. Weşenxane jî yê dewletê bûn. Pêra jî pirtûk gerekê li ber destê mirovên weşenê va mijûl dibûn derbasbûya: ermenî, kurd. Ya dijwer ewên dewiyê bûn. Gerekê nav wanda nas-dost hebûne… Bi kurtî dest kê da bû wan berê ewlin pirtûkên xwe, mirovên xwe diweşendin.*

*Pêra jî çapeke weşena salê ya pirr biçûk deshiletdarîya ermenîya didane nivîskarên Kurd. Wek pirtûkeke 200-250 perrî. Nivîskarê me jî zef bûbûn. Salbisal jî bi nijarperestî ew çapa biçûk jî kêm dikirin. (Çavê derya xwelî serya).*

*Xêncî çar-pêncan, yê dinê ra nivîsara xwe derxistin, weşandin pirr dijwer bû.*

*Wî welatî da, ji pey weşena pirtûkê ra, perekî rind didane nivîskar. Ji bo wê jî di nav civaka me da çavê nivîskar û ne nivîskara teva ser wî „pereyî" bû. Kê „zor" bû, wî jî xwera direvand…*

*Weşendinê da baş-nebaş tunebû. Kesî dengê heqyê nedibihîst. Pirtûkên baş bi salan newaşandî, bal nivîskar yan weşanxanê da diman. Carna destnivîsar wunda dibûn û ne jî dhatin dîtin, ne jî weşandin…Çiqas efrandinê hêja wunda bûn, çiqas bûn xurê „gura". Neheqî û nemerdiyên ecêb di wî warî da hebûn…*

*Carna, hew dinhêrîn, ji hesabê nivîskara yekî xweyê kursîyê bilind ji xwera "pirtûkeke" mezin weşend, yan jî pirtûkeke zargotinêye weşendî bi navekî din, carke din hate weşendin.*

*Dibe li bal xwendevana pirs pêjda bê, gelo ew berhemên neweşandî yên nivîskaran ji pey wefata wan ra çawa dibûn? Arşîvên wan nivîskaran hatine xweyîkirin? Kune? Hene? Tunene?*

*Malwêranîk di vê pirsê da heta niha jî heye.*

*Ez wê bawaryê dame xêncî arşîvê çend nivîskar û zanîyarê kurd yê din dijwer hatibe xweyîkirin.*

*Gelo dem nehatîye, ku Kurd jî ji xwera sazîkê demezirînin û ji pey wefeta zanîyar, nivîskar, hunermendên xwe ra, xweyî mîrata wan derên.*

*Gelo kune arşîvên Wazîrê Nadirî, Ahmedê Mîrazî, Erebê Şemo, Emînê Evdal, Şikoyê Hesen, Qaçaxê Mirad , Ûsivê Beko, Mîkayêlê Reşîd, Şemsî, Sihîdê Îbo, Nado Maxmûdov, Xalit Çetoyêv, Ahmedê Gogê, Elyê Evdilrehman, Rizalyê Reşît, Çerkezê Reş, Simoyê Şemo, Mîroyê Esed, Semend Syabendov…*

*Eger niha jî xweyî û xwestin hebe, karin di wî warî da gelek pirs bên safîkirin, gelel tişt ji undabûnê bên xilaskirin...Her nivîskarekî me xweyê kitêbxana mezin bû.*

*Em, kurd jî gerekê wek gelê din xweyî hebûna xwe derên.*

***Nivîsarnasî***


*1.A. Mîrazî, "Bîranînêd min", rû. 13-15; weşena DENG, 1997.*

*2.H. Cindî, " Oçêrk ji edebiyeta kurdên ermenistana sovêtê" , bi zimanê ermenî, rû 39; Yêrêvan-1970.*

*3."Bîranînêd min", pêşgotina H.Cindî;*

*4.H. Cindî, " Oçêrk ji edebiyeta kurdên*

## Dumahî: Ahmedê Mîrazî

*ermenistana sovêtê" , bi zimanê ermenî, rû 38; Yêrêvan-1970.*

5. *Bîranînêd min", pêşgotina H.Cindî;*
6. *Bîranînêd min", pêşgotina H.Cindî;*

**) Ji pirtûka Eskerê Boyîk "Canda Kurdên Sovêtê" DENG-2012*

***) Qehremanekî Kurdên êzdî yên êla zuqurîy, ku salên 1914-1918 a êla zuqurîya ji qeza Wanê revande Ermenistanê.*

**Ebdulbaqî Huseynî**

zanin88@hotmail.com



# Ji ferhenga jinên kurd (xeleka 6)

# Hefse Xana Neqîb

**(1891- 1953)**

## Seroka pêşîn ya (Yekîtiya jinên Kurdistan)ê



Hefse xana Neqîb an jî Hepse xana Neqîb wekû li gelek cihan tê gotin, di hin jêderan de dibêjin "Hefse" û di hinan din de dibêjin "Hepse", lê navê Hefse gelektir nêzîkî navên folklorê kurdî û ayîna kurdan a musilmanîye ye,… ji ber vê yekê min di vê xelekê de navê "Hefse" helbijartiye.

Hefse xana Neqîb, keça Ma'rûf Berzencî ye, ji êla Şêx Ehmed e, keçmama Melekê Kurdistanê Şêx Mahmûd Al Hafîd e, û jina Şêx Qadir Hefîd e. Ew di sala 1891 de li bajarê Sulêmaniyê ji dayika xwe re bûye. Ew bi xwe jineke navdarbû, û dihate nasîn ku jineke dan û çanda wê mezin bû, û herwiha piştevaniya jinên Kurdistanê dikir.

Hefsexan hate nasîn bi navê Hefsexana Neqîb, ji ber ku bavê wê Ma'rûf Berzencî zabit bû û nîşana (Neqîb) li ser milê xwe werdigirt, ev nîşana ku dewleta Osmanî pêvekiribû, ji ber ku berpirsê dewlemendên Şêxan bû.

Hefsexan di malekê navdar de, ku canê kurdewariya têde bilinde, hate xwedîkirin, û bi perwerdekirineke zanestî û olî hate mezinkirin, loma bû ji navdarên jinên Kurdistanê . Hefsexan jineke gelekî hez ji xêrê dikir, dilekî mezin li ser hebû û herdem li halê perîşanan dipirsî, cihekî weyî taybet hebû, hemî jinên ku zilm û zor û azarî ji mêrên xwe ve dixwarin, xwe lê digirtin çi kesên li Sulemaniyê û çi kesên li hawîrdorê. Hefsexan digel ku piştevaniya wan dikirin herwiha alîkariya wanî aborî jî dikir, Û bi vî hawî Hefsexan karîbû cihekî xweyî berz di nav civaka jinên dema xwe de diyar bike. Û nemaze piştî ku mala wê bibû navçeya kurdî a civakî, eve jî ji bo ku jinan fêrî axlaqên bilind bike.digel fêrbûna hestên netewî, ev karane bibûn sedemên navdariya Hefsean li hemî Kurdistanê.

Di dema ku jinên dî bi cil û bergê xwe ve mijûldibûn, Hefsexan axaftinên li ser mafên netewa kurd û azadiya gelê kurd, ji jinan re digotin.

Di wê demê de, Hefsexan doznameyekê ji Simko Axayê Şikakî re rêdike, da ku jinên Suleymaniyê pêşwaziya wî bikin û pê re bicivin, dibêjin ku pêşwaziyeke pir germ û mezin ji Simko re di sala 1929 de, li bajarê suleymaniyê, hate kirin.

Hefse xana Neqîb komela jinên kurd a yekemîn di 28/06/1930 de damezirand, û seroktiya wê kir, herwiha Hepse Îrfan jina Cemîl Saib bû sekretêra komelê. Ev komele di çerxê cûyî de bibû komela yekemîn di Rojhilata Navîn de, a ku mafê jinan diparast.

Hefse xana Neqîb, di sala 1930 de nameyek ji saziya Netewên yekgirtî re, a ku cihê wê li bajarê Cinêv bû, rêkir, û tê de doza çarenûsiya gelê kurd li her çar perçên Kurdistanê kir, ew name di wê demê de dengvedaneke pir mezin da.



Di 22/01/1946 de dema ku Qazî Muhemmed komara Kurdistanê li Mehabadê damezirand, Hefse xana Neqîb alîkariyeke mezin ji Qazî re pêşkêşkir, û herwiha Qazî jî sipasî û rêzgirtinên xwe ji Hefse xanê re rêkirin .

Hefsexan roleke mezin di warê belavkirina zanestiyê û hînbûnê di nav jinên kurd de lîst, ji ber vê, di nêrîna hemî xelkên Kurdistanê de, Hefsexan cihê rûmet û rêzgirtinê bû.

Ewê ne tenê alîkariya gel di warê danê de dikir, lê belê ewê dest bi avakirina dibistanan jî kir, da ku jinên kurd ji wê nezaniyê û paşveçûnê rizgar bibin. dibistana wê di danê êvarî de bû, û Hefsexan bi xwe jî yek ji şagirtên vê dibistanê bû. Piştî demekê ji vekirina vê dibistanê, wezareta perwerdekirinê a Îraqî û dibin destûra Ingilîzan de, ew bû yekemîn dibistana kurdî a fermî.

Hefsexan herdem digot: " Ti cidabûn dinavbera jin û mêr de tune ye, ji ber vê jî ezê xebata xwe berdewam bikim".

Hefse xana Neqîb di roja 12/04/1952 de piştî ku bi nexweşiya pençeşêrê ketibû çû ser dilovaniya xwe, wê demê temenê wê 62 salî bû. Hefsexan li goristana Sêwan hate veşartin, bi koçkirina wê a dawî, valabûneke mezin di warê berxwedana bo azadiya jinanan û mafên wan de çêbibû.



**Hefsexan Neqîb ligel komek jinan – Buhara 1943 – Suleymaniyê**

*Ezîz ê Cewo*



# "AWIREK JI DERVA"

## PÊVA JOYÊN ROJHILATA NAVÎN Û PIRSGIRÊKA KURDÎ BI ÇAVÊ ZANYARÊ RÛS- Xelek 1



Bi rastî, ev demek a dirêj e, ez buyer û pêvajoyên li Kurdistanê û Rojhilata Navîn pêk tên, bi giştî di çapemenîyê da dişopînim, nêrîn û helwestên siyasetmeder û rewşenbîrên kurd li ber çavan ra derbaz dikim, dixwazim di nirxandinên wan da tiştekî nû jê derînim û têbigihîjim, lê – bê feyde!… Dîsa weke berê ji bo me kurdan her tişt reş e, an – sipî. Dîsa em sedemên nepêkhatinîya xwe di dijminên xwe û derdorên dinê da digerin, dîsa, şûna bingehên sedeman bi dîrokî, zanistî, siyasî, darayî binirxînin, em bi xwe û hev va mijûl in…

Û tiştê matmayînî jî ew e, ku di nav me da hê jî hinek mirov hene, yên ku, şûna ku bingeha hemû bedbextî, înkar, tevkujî, talan û wêranîyan di hebûna sîstêma dagirkerîya navnetewî da bibînin, hemû astengî û pirsgirêkên me bi wê şirove dikin, ku gelê me dijî siyaseta tevkujîyê, wêran û talanê ya rêjîmên dagerker têkoşîna çekdarî dimeşîne. Ango li dijî çekê bi çekê diaxive… Û li ser vê bingehê, çi ku tê ber devê wan ji tevgera rizgarîxwaz a netewî û endam û rêvebirên wê ra dibêjin – weke berdevkên wan dagerkeran, heya ji wan jî tundtir… Lê hinekên dinê jî ji dilpakîya xwe, bi rastî hewl didin, van bidin bawerkirin, ku gelê bindest ji bo desxistina mafên xwe, jib o ku xwe ji tevkujî, talan û wêranîyan biparêze, mafdar e, hemû rê û rêbazên pêwîst û derfetên xwe bikar bîne. Lê ji kê ra bibêjî?!… Hinek jî rabûne, li şûna serok û rêberên gelê me, ji navê wan û ji wan jî "germtir" û "xurttir" hemû rêyên ku têne ber heşê wan, didin pêşîya gel. Ji mirovên weha ra ye, ku dibêjin: "Ji Papayê Romayê jî xaçparêztir in!"

Ev hemû ji xwe ra bi serê xwe di rêyekê da diçe, lê pêvajo jî di rêya xwe da dmeşe. ...Û ev rewşa bi vî şêwazî dem bi dem xwe dubare dike.

Lê ger mirov bo kûrahî lê binihêre, wê bibîne, ku ji bo vê pêvajoyê jî rêze sedemên dîrokî yên obyêkîv û sûbyêktîv hene, serok û rêberên astên cuda hene, kesayetî û siyasetmederên xwedî gotin û bandor hene, û ev hemû li ser dîmenê rewşa gelê me ya îro digihîjin hev û nîgra gelê me ya tevgerî derdixin pêş – wek neteweke.

Û meşa vê pêvajoyê di bingeha xwe da pêwendîdarî wan mercan e, yên ku me li jorê anîn zimên.

Û, ka ev pêvajoyê çwa here sêrî û berbi kîalî va bibe, girêfterî mercên dîrokî yên obyêktîv û sûbyêtîv û pêwendî û hevkarîya hêzên beşdarî wê ye, yên ku tenê wê demê wê bikaribin armanca netewî bînin serî, eger bi hemû hêz û derfetên xwe va bigihîjin hev û Yekîtîya netewî ava bikin… Ev jî erênî û fermana demê û mercê hebûna me ye, wek netew!

Lê dîsa jî divê bê gotin, ku van pirsan da hinekî nêzîkbûna rêalîstî me divêt…

Lêbes, sed heyf, em gelek caran buyer û pêvajoyan weke xwestina dilê xwe şirove dikin û didin nasîn, ji bo wê jî îro di warê analîz û şiroveyan da ne li ser wê astê ne, ya ku tê xwastin. Û ji ber wê jî em îro hê di cîhanê da, li şûna berjewendîyên xwe yên netewî bişopînin û li dû wan bin, ji xwe ra dost û dijminan digerin…

Ma li şûna vê em nikarin hinekî bi rêalîstî merc û derfetên xwe, rewşa sîyasî ya heremê û cîhanê bi piralî binirxînin û ji bo xwe rêyekê bibînin, û di nav gelên cîhanê da cîhê xwe yê hêja û bi rûmet bigirin – dîsa wek netew?..

A, dema ez bi van ramanên xwe mijûl û gîro bûm û dîsa, weke berê di întêrnêtê da nirxandinên bi zimanê rûsî yên di derbarê pirsgirêka kurdî da digeryam (yên kurdî jixwe ji min kêm nabin), li ser rûpelên malpera Kurdistan.ru di nav gotarên dinê yên balkêş da çend gotar-şiroveyên dîrokzan û şirovegerê rûs Vadîm Makarênko bi min balkêş hatin xuyan…

Xwendevanê me Vadîm Makarênko bi gotara wî ya "Kurdistan a Mezin ew cîgeh e, li ku dîrokên "cuda" yên rûsan, kurdan, tirkan, ermenîyan û yên dinê rastî hev tên" nas dike ( **http:// www. amidakurd.net/qunciknivis/k_%C3%AA_%C3%BB_ji_bo_%C3%A7i_d%C3% AEroka_gelan_anegor%C3%AE_berjewend%C3%AEy%C3%AAn_xwe_veguhar_tine**). Ev gotara wî di dema xwe da di nav xwendevanên kurd da hêjayî baldarîyek a germ bûye...

Çima hema gotarên V. Makarênko?

Di sêrî da bibêjim, ya sereke, ew mirovekî ne kurd e, yê ku bi pisporî li ser dîrok û pirsgirêka kurdî dinivîse, û, her çiqas bi çavekî ji derva pirsgirêka kurdî dinihêre, dîsa jî ew wê di nava pêvajo û pêşveçûnên herêmê û cîhanê da bi piralî dinirxîne...

Û, wek ku tê zanîn, eger du mirov şetrencê (kişik) dilîzin, yê li rex va li lîstika wan dinihêre, hinek tiştan çêtir dibîne, ne ku beşdarên lîstikê; û ji vê hêlê va nêrîn û dîtinên vî camêrî ji bo wan mirovan, ên ku bi pirsgirêka kurdî va mijûl in, pir balkêş in. Ya duyem, di nav nivîsên kurdên me da (di nav wan da, wisa jî, yên ku bi zimanê rûsî hatine nivîsar) an bi giranî hest desthilatdar e, an jî, ji ber vê sedemê, helwest a wan a zanistî-siyasî ya li ber çavan pir lewaz dibe. Û ya dawîyê, û ya ne kêm girîng, ew e, ku ew pisporek e, yê ku bi têz û şiroveyên xwe yên zanistî û helwesta xwe ya siyasi ji yên dinê cuda dibe... Ev gotarên Vadîm Makarênko analîz û nirxandin in, ên ku hêjayî baldarîyê ne, heya, eger hinek nêrînên wî ne wek ên xwendevanan bin jî, ew bibin katalîzator û alîkar, ji bo ku xwendkar rewşa heyî bi bingeh û sedemên wê va bibîne û rast qîmet bike.

Ji bo wê jî em li vir nivîsên wî ne ku wek gotarên cuda, lê wek têma û lêytmotîv bi hinek şirove û têbînîyên xwe va pêşkêşî xwendevanan dikin. Di sêrî da bibêjim, ku di hinek pirsan da em bi xudanê van gotaran ra dikarin ne hemnêrîn bin, ji ber wê jî, ger bê xwestin, di cîhên konkrêt da emê şiroveyên xwe pêşkêş bikin.

**Vadîm Makarênko:**

**"...Di Rûsîyayê da desttêwerdana Rojhilata Navîn ji hêla Rojavayê va ji bo çareserkirina pirsgirêkan wek gevek a bê derfet tê dîtin..."**

*Ji bo ku armanca sereke û helwesta giştî ya gotarên Vadîm Makarênko bên têgihîştin, me rasttir dît, ku nirxandinên xwe ji gotara wî ya "Rêyên stratêjî yên "Başûr" û "Rojava, an ji bo Rûsîyayê cîhê bi tehlûke li kîderê ye?" destpêbikin.*

*Weha, di vê gotarê da tiştê ku, wek dîtinekê, bêhtir dikeve çav, ev e:*

"...Di vê rewşê da desttêwerdana Rojhilata Navîn, ya ku bi pêdivîya parastina binecîhên medenî (sivîl) an jî ji bo pêkanîna rêforma sîstêma siyasî didin xuyan, di Rûsîyayê da ji bo çareserkirina pirsgirêkên hindurîn ên Sûrîyayê û yên dewletên dinê ên bi dest (sunî) sazkirî, wek geveke bê derfet tê dîtin. Desttêwerdanên vî rengî bêyî planên rêal ên werguhartina sazîya vî welatî, heya, eger mirov piranîya gorîyên (qurbanî) di nav gel da yên ji bo wê di cîh da jî bibîne, ji hêla xwe va an dikare bi xwe ra kaosê bîne, wek ku di bûyerên Lîbîyayê da, an jî wê tenê ji wan komikên otorîtar an jî totalîtar yekê bi yeke dinê biguhêre. Û evê progrêsek a rêal a berbiçav bi xwe ra neyne – rewşa Îraqê ya jî îro mînakeka wê ye. Heman pêtirsî (tehdîda) ji bo bêaramîya Sûrîyayê jî rêal e.

Di vê rewşê da desttêwerdana ji der va ne di Sûrîyayê da, ne jî di Îranê da, nayê xuyan, ku wê bi kêr bin. Lê di van welatan da ji bo aramîya hindur êdî tehdîdên hindurîn digihîjin, an jî wek xwepêşandanên şermezarkirinê êdî derketine pêş. Ew jî ev in: li bal gelên "biçûk" ên wan welatan daxweza mafên pirtir û xwserîyê bi hêztir dibe, piranîya wan gelan hê jî ji maf û azadîyên hêja bêpar in. Rewşeke bi paradoks dertê holê: hem Sûrîya, hem Îran, hem Îraq, ji bo ku wek dewlet li ser pêyan bimînin, divê rêyên çareserîyê ji bo pirsgirêkên gelên nav xwe yên "biçûk ên bê dewlet" bibînin. Lê ew divê an pirsgirêkan berî karesatan bînin çareser bikin, yên ku di wan welatan da bi xwepêşandan û serhildanên berfireh dikarin derkeve pêşya wan. Ev êdî di Sûrîyayê da pêk hatye.

Lê, wek ku tê xuyanê, ewê bi xwe vê çareserîyê nebînin, heya ku nekevin nav alozî û tengavîyên hindurîn ên giran. Di hinek welatên wek Lîbîya, Misir, Sûrîya, Îraq û Yêmênê da ew kirîzîs êdî destpê bûye. Bi taybetî jî, Îraq bi kurahî ketye nava alozîya nakokîyên navbera ol û bawerîyan û netewan. Tirkîyayê ev ji hemûyan kêmtir hîs kir, lê ew jî, êdî derdorê sîh salî ye, nikare nakokîyên di başûr-rojhilatê welêt da çareser bike. Îran li hember serhildêrên kurdan û kêmnetewên dinê tenê bi cezayên ji her pîvan û sînoran der xwe li ser pêyan digire.

Mirov dikare çi bike?

Ev dê pirseke bi praktîkî xitimî bûya, eger cêribandaina Rûsîyayê bi xwe û dewletên piştî hilweşandina Sovêtê avabûyî nînbûya. Evana karibûn serdema hilweşîna împêratorîyê hema-hema bê nakokîyên siyasî-leşkerî derbaz bibin. Her çiqas dema hilweşandina Yekîtîya Sovêtê bêyî hinek windahî jî nebû (mînak, Rûsîyayê şeş herêmên rûsî windakirin, yên ku ketin nava sînorên Qazaxistana piştî Sovêtê, an jî windakirina Qirîmê û Ûkraîna rojhilatê, yên ku ketin nava Ûkraîna serbixwe), lê bi giştî pêvajo bêyî bûyerên aloz derbaz bû. Sedema wê jî ew bû, ku nêrîneke giştî ji hêla hemûyan va hatibû pejirandin, ku xaka Yekîtîya Sovêtê xaka yekîtîyê ye, ango, ew ji xakên wan dewletan pêk hatye, yên ku li ser bingeha pêwendîyên bi rezadilî bûne yek. Û ji ber wê jî, jevberdana Yekîtîya Sovêtê ya bi rezadilîya komarên wê, bû bingeha ji hevcudabûna xakên wan komaran...

Pêvajoyên fêdêralkirina welatên pirnetew û pirbîrûbawerî pêwîst in, ji bo vê divê di wan welatan da di destpêkê da bigihîjin têgihîştin û pejirandina sînorên di navbera gelan da. Helbet, dijwar e, evê yekê pêk binin. Lê ew dikare û divê bibe armanca daxwazîya pêşvaçûnên wan welatan. *Rûsîya divê vê armancê wek tiştekî pir pêwîst bigihîne rêvebirîyên wan welatan, wek wê, ya ku di dema xwe da li Yekîtîya Sovêtê dihat ferzkirin: daxwaza dêmokratbûnê jê dihate kirin, doza parastina mafên mirov jê dikirin, digotin, divê destûrê bidin, ku cihû û kesên dinê bikaribin serbest ji welêt koç bikin û tiştên dinê.* Hema di rewşa îroyîn da rêya berbi fêdêralkirinê jî di wan welatan da bi xwe rêya pêşîgirtina pevçûnan, an jî ya çareserkirina wan pirsgirêkan e. Ev jî dikare ewlekarîya sînorên me ji hêla başûr va bi rêyên ne leşkerî xurt bike. *Gelek caran dibêjin, ku modêleke Rûsîyayê nîne, lê ew heye: fêdêralî, ya ku berbi pêwendîyên yekîtîyê va pêşdikeve.* Bi şêwazî (formal) Qazaxistan hema bi vê rêyê va çû. Herêma Ewroasîyayê divê bibe qada gulvedana pêwendîyên yekîtîyê di navbera welatên di nav wê da û pêwendîyên fêdêralî û heya konfêdêralî di hindurê wan welatan da. Hewldanên li ser hemû astên têkilîyên netewan ên sûbyêkên pêwendîêyên ewroasîyayî wê bi praktîkî rê ji tu êrîşbazî û destavêjîyan ra nehêle.

Di dema xwe da, berî destpêka Şerê Cîhanê yê Duyem, Yekîtîya Sovêtê nikaribû alîkarîyê bide Awstrîyayê, Çêxoslovakîyayê û Polonîyayê, ku ew xwe li ser pêyan bigirin. Emê li vir sedeman bi bîr neynin, ya sereke, ku ketina wan dewletan wek dewletên netewî yên têra xwe heyî, gîhande wê, ku artêşa almanî derkete ser sînorên Yekîtîya Sovêtê û dawîya-dawîyê şer destpê bû. Dem e, ku mirov bipirse: "Ma gelo ew rewş, a ku salên 1936 – 1941 li Ewropayê hebû, dubare nabe?" Pêşveçûna Yekîtîya Ewropayê ya îroyîn, a ku bi şêwazî pir azad e, lê dê-fakto pir ûnîtar û bêpîvan yekgirtî ye, pêvajoyên berî destpêka Şerê Cîhanê yê Duyem tînin bîra mirov. Pêvajoyek a wisa bi rêalî tehlûkeyê ji xwe ra tîne.

Û evê tehlûkeyê jî bi hinek gotinên di derbarê serdemek a nû ya Ewropayê da dixwazin bidin hêlekê, her çiqas, ew ewqasî jî ne nêzîkî rastyê ye. Hema ew, ku du şerên cîhanê li vir, di Ewropayê da rûdane, divê mirov hişyar bike... Û li ser bingeha ewlehîyên hindurîn mirov dikaribû doza hinek pêwîstîyan ji Ewropayê bikira, ji bo ku ew nehêle, amadekirina mercên leşkerî-siyasî yên ji bo destpêka Şerê Cîhanê yê Sêyem, vê carê li dijî Rûsîyayê bi xwe, pêk bên. Daxwaza wê dozê jî divê wê be, ku yên ku dixwazin Ewropayê bikin dewleteke gewretirîn û hêztirîn a bi sîstêma rêvebirîyê ya navendkirî, bi xakek a seranserê xwe va leşkerî û siyasî, bi qanûnên giştî, ango, di rastîya xwe da bi merc û derfetên ûnîtar ên hêza leşkerî û siyasî, dest ji wan hewlan berdin.

Eger em dest ji aksîomayên derew berdin, bi obyêktîvî rewşa li ser sînorê başûrê Rûsîyayê hemberî ya rojavayî bikin, wê demê bêyî hemdî xwe, yan jî bi pêwîstî, encameke bi paradoks, lê rastîn dertê holê: îro sînorên Rûsîyayê, yên ku divê bên xurtkirin, li milê rojavayê ne, ango, li sînorên wêye bi Yekîtîya Ewropayê ra ne, ne ku li milê başûr in. Dibe ku di helwesta Rûsîyayê ya hember ewrodabelandina Ûkraînayê ya îroyîn da jî ew hîsa bi înstîkt a xweparastinê dîyar dibe, ya ku bi otomatîkî û ne bi bîrewarî hişyar dibe, ji ber ku hema ew jî hîsa întûîtîv a Rûsîyayê ye, ya ku ji destpêkê va bi wê ra hatye, piştî agrêsîya bê navber a çend dewranan (sedsal), ya ku ji hêla Rojavayê va li hember wê dertê. Û ji hêla dinê va Rûsîyayê jî ewqas caran ew ji împêratorîbûna ûnîtar rizgarkirye – ew "ya Napolêon" bûye, an "ya Hîtlêr", lê ew ji bo wan tucar nebûye tehdîda dagerkirinê an têkbirinê. Û Rûsîyayê heya nexwastye, ku wan serkevtinên xwe li dijî wan bikar jî bîne. Ji ber wê jî Rojava îro jî deyndara Rûsîyayê ye, lê, dibe ku hema ew bêşêkirîya reş (êşa Rojavayê ya zikmakî) jî agrêsîya ku bi tu tiştî nayê şirovekirin, tîne lîstikê".

* * *

*Min ji bo çi ev parçeyê gotara V. Makarênko li vir anî? Ya yekem, mirov çiqas dîroka pêvajoyên balkêş ên dîroka gel û welatên dinê bizanibe, dê ewqasî pêvajoyên welatê xwe çêtir têbigihîje û şaşîyên ku di wan welatan da pêk hatine dubare neke. Ya dyem, ji bo wê, ku em bi xwe jî bala xwe bidinê, ka di welatên dinê da pirsgirêkên welatê xwe çiqasî berfireh hiltîn dest û dinirxînin. Ez bi bawer im, ji van nirxandinan, heya yên ji van befirehtir mirovê bikaribe li bal amêrîkîyan, înglîzan, almanan, fransîyam û gelekên dinê jî bibîne... Wisa ye pirsgirêkên her gel û welatekî bi hezar tayî bi wlat û herêmên cîhanê yên dinê va gurêdayî ne...*

*Lê ya sereke, êdî dem e, ku em kurd ji bo xwe zelalbikin, ka ji bo welatê me tehlûkeya mezin ji kîalî va dikare derê, divê em çawa bikaribin berjewendîyên xwe yên netewî di vê herêma weke deşteke tuje mayîn ra bê zîyanên mezin bigihînin armanca dawîyê. Êdî dem e (heya em dereng jî mane!), ku em bizanibin, ku di cîhanê da dost û dijminên gelan nînin, ku hene berjewendîyên her weletekî yên dema konkrêt û demdirêj, ku dagerkeran welatê me zevtkirine ne ji bo wê, ku ji me hez kirine, an – na, lê ji ber ku ew li dû berjewendîyên xwe ne, û wan berjewendîyan di welatê me da jî dişopînin!.. Êdî dem e, em bizanibin, ku em in, ku nikarin bibin yek, ku ji berjewendîyên xwe û yên wan ra sînorekî daynin... Û li ser vê notê di gotarên dinê yên Vadîm Makarênko da jî nirxandinên wî yên balkêş didomin. Wek ku tê xuyan, ew bûyer, rewş û pêvajoyên Kurdistanê û Rojhilata Navîn jî bi pir alîyan va dinirxîne, û wan hemûyan di tava hîya xwe da wek pirsgirêkek a tam, bi hemû teref, nakokî, alozî û dijwarîyên wê va, li ber xwendevanan vedke...*

* * *

**...Ocalan û Barzanî. Pirsgirêkên kurdên Rojava, pêwendî û helwestên kurdan ên navxweyî, pêrspêktîvên çareserîya pirsgirêkên wî parçeyê Kurdistanê**

*Vadîm Makarênko di gotara xwe ya* "Ocalan û Barzanî: du rêberên du serdemên vejîna kurdan..." *da pêvajoyên dema me analîz dike û nirxandinên balkêş pêşdixe û, wek şiroveger û rojnamegerekî, hinek tişt tîne zimên, ên ku di nava kontêksta şirovekirina pirsgirêkê da pir balkêş in û hêjayî baldarîyeke heşmendî ne û di hinek cîhan da jî pêwîstî bi sererastkirinan heye...*

*Ew gotara xwe bi agahîdana di derbarê civînekê da destpê dike, ya ku 18.12.2013 di Parlamêntoya Rûsîyayê da pêk hatye. Civîn li ser pirsa rola çapemanîya Rûsîyayê di karê ronîkirina rewşa Sûrîyayê da bûye. Û hevserokê PYD Salih Mûslîm jî beşdarî wê civînê bûye û axavtinek jî pêşkêş kirye. Û, weha, piştî ku agahîyên giştî di derbarê wê civînê da dide, Makarênko Salih Mûslîm û PYD-ê bi xwendevanan dide nasîn û didomîne:*

"...Salih Mûslîm, hevserokê PYD-ê ye, ya ku di Kurdistana Sûrîyayê da hêza siyasî ya serkêş e, bi piranî ewlehîya xwe ji wan tavîyan (mewzî) digire, yên ku li vir Partîya Karkerên Kurdistanê ya Ocalan sazkiribûne. Di gelek tiştan da jî ew rêça wê dişopîne. Wek ku tê xuyanê, wek nûnera gelek rêxistinên kurdan, ên ku di bin baskê wê da berev bûne, dê ji vê partîyê ra li hev bê, ku nûnerîya berjewendîyên kurdan di Cenevra-II da bike. Ev jî wê bibe serkevtineke mezin. Lê PYD di rewşek a tengav da ye, ya ku bi wê hêvîyê, ku xakên kurdan ên Rojava bigihîne hev û berbi xweserîyê (otonomî) va bibe, bi neçarî di navbera artêşa bi giranî ji têrorîstên cîhadîst pêk hatî û ya rêjîma Beşar Esed da manêvre dike. *Divê bê zanîn, ku çapemanî hê jî bi bêwijdanî wê artêşa têrorîstan wek opozîtsîona çekdarî nav dike.* Ev pirseke giran e, ya ku çareserîya xwe ya yekawa nîne, ji ber ku hem rêjîm, hem jî yên ku dixwazin wê bavêjin, armanca wan dewlemendîyên Sûrîyayê yên nevtê ne, ne ku mafên mirov an dêmokrasî. Ew hîç mafekî kurdan jî nas nakin, lêbelê, ji ber ku hev dixeniqînin, dema wan zêde manîne, ku bi hêztir bi ser kurdan va herin. Û nakokî ne tenê di navbera wan û dijmin da, lê wisa jî di navbera wan û hevalbendên wan da hene.

Ev rewşa ne sade dibe sedem, ku mirov li ser wê pirsê serê xwe biêşîne, ka gelo kurdên parçeyên cuda yên Kurdistanê divê çiqasî bi hev ra bi yekgirtî tevbigerin, ew çiqasî dikare pêk bê û çiqasî dikare kêrî wan bê, ku beşên cuda bigihîjin armancên xwe, yên ku naha di nava Sûrîyayê, Îraqê, Tirkîyayê û Îranê da dabeşkirî ne, û ne wek welatekî bi serê xwe ne, em bibêjin, ên mînanî Rûsîya, Ûkraîna û Bêlorûsîyayê.

Demek hebû, gava kurdan ji Rûsîyayê li ser Tirkîyayê ra xwe digîhandin Kurdistana Îraqê. Wê demê Tirkîya Tirkîya bû, û Kurdistan jî wî berî pira Zaxoyê bû....... **Dumahî dike .....**



*Dr. Ehmed Xelîl (Sozdar Mîdî)* *Çavdêriya zimanî: Mustefa Reşîd*



# Pêşiyên Me Yên Arî - Zagrosî

## (Gelê Horî- Mîtanî)

### Gelê Horî (Xurrî):

Navê gelê Horî (Hurî) di hin jêderan da bi navê ( Hurîm= Xurrî خُورِّي = Xurdî خُرْدِي) tê naskirin, ewa jî gelekî Arî-Zagrosî ye, cihê wan î pêşîn deverên navbera Gola Urmiyê û Çiyayên Zagros bû, lê di pêra êlên Horiyan ber bi bakur - roajvayê Mezopotamya va koçkirin û li deverên jorîya çemê Xabûr bi cih bûn, û hinek gihiştin rojhilatê Çemê Zaba Jêrin, û ji hêla bakur da gihiştin Gola Wanê.[1]

Ji sala 2200 b. z da , belavbûna Horiyan li rojava gihişt bakurê welatê ku paşê bi demeka dirêj bi navê (Sûriya) hat naskirin, bi teybetî jî deverên Helebê, şahnişîneka gewre li wir avakirin, û di pêra derbasî Sûriya hundirîn bûn, li kenarên Çemê Asî (Oriyent), li Elalax (Mokîş =Til etşana تل عَطْشانة) bi cih bûn, û hinek ji wan gihiştin devera Ogarêt (Fînîqiyan) li kenara Derya Sipî dikeve, û hink gihiştin deverên ku paşê bi navê (Xaka Ken'an = Felestîn) hat naskirin, nemaze jî bajarê Yebûs (Orşelîm = Qudis), û hîn bi bakur rojava da çûn, û li devera Çiyayê Se'îr (جبل سَعِير), bi cih bûn, Çiyayê Se'îr li başûrê Şahnişîna Urdin dikeve, nêzîkî Derya Sor [1].

Jîrnot Wîlhêlm diçespîne ku Horî bi roleka girîng di navîna du hezar salên berî zayînê da rabûn, û tîrêjên şaristaniya wan ji deverên Arrabxayê (Kerkûk)ê heya bi kenarên Derya Sipî ronî dan, bajarê **Orkîş** (Urkish), yê ku li devara Xabûr diket, di dema sê hezar salên berî zayînê da, hem navenda şahnişîna Horiyan bû, û hem jî bajarekî ayînî yî girîng bû [1].

Da ku em sedemên belavbûna Horiyan a fireh bizanibin, pêwîste em bala xwe bikişînin ser girîngiya Erdnîgariyê (Cografiya) , bi teybetî jî ser (Ciyopolitîkiyê) û (Ciyoaboriyê). Horiyan destê xwe dan ser deverên Arrabxa (Kerkûk) û derdorên wê, çimkê rêya aborî (Rêya Herîr) têra derbasî rojhilatê dibû . Û li hêla rojava, Çiyayê Se'îr li ser rêya aborî ya din (Rêya Pixûrê) diket, van herdu rêyan ne tenê aboriya cihanê têra derbas dibû, lê bi ser da jî şaristanî û ol û leşker jî têra derbas dibûn[1].

Horî bi kû ve diçûn, çanda xwe ya Arî-Zagrosî bi xwe ra dibirin, Jîrnot Wîlhêlm dibêje ku Horiya rêzikên xwe yên ayînî **"ji kevintirîn welatê xwe yê ku li ba me nase, Kurdistan"** bi xwe ra anîn, çi di warê çandî dibe, an di warê olî û leşkerî da, wek nimûne: **Kîkulî** yê Horî leşkerê împeretoriya Hitîtî (Hissî)yan hînî awayên siwariyê û xebitandina çekan dikir, û erebe (erebane) yên cengî yên bi du tekeran û du hespan- piştî sala (1600 b.z) - derbasî deverên Anadol, Sûriyê û Misirê kirin[1].

Bi rastî, mijara Horiyan pêdiviyê lêkolîneka teybetî û fireh û kûre, lêkolîneka wena ê karibe ronahiyê bevêje ser gelek pirsgirêkan, û dibe jî ku bersivan ji hin pirsên balkêş ra bide xuyan; wek:

1- Gelo, ma ew pêxemberê gewre Ibrahîm Horî bû?

2 – Eger Ibrahîm Horî be, ma ne wate ewe ku hin ji nijada erbên Hicazê, bi teybetî jî êla Qurêyş, di koka xwe da Horî ne?

3 – Ma têkeliya Horiyan bi afirandina Alfebaya Fînîqî ra heye?

4 – Ma gelê Hêksos, ên êrişî Misirê kirinî, û din navbera (1720 – 1570 b.z) şahnişînek lê avakirin, beşek ji Horiyan bûn?

5 – Ma tu têkelî di navbera gelê Horî û ĥoriyên biheşta islamê da heye?

Ev pirsana û hinên din ji nêzîkî pênc salan da bala min kişandin; min hin agahî li ser wan bi dest xwe xistin, ji bo ku ez lêkolîneke binivsînim, lê ez dibînim hîn kêmasî di agahiyan da hene, lewra jî ez hêvîdarim ku rewşebîrên kurdan yên li Ewropa, Amêrka û Rûsiya dijîn, li jêderên ser Horiyan bigerin, û hewlbidin ku bersivên van pirsên jorî bidin, an jî agahiyan ji min ra bi rêkin, ev karê wan wê karekî girîng û dîrokî be.

### Gelê Mîtanî:


Mîtanî an (Mîttanî= Meyttanî) şaxekî Horiyane, rêvebirî ji nîvê duhemîn hezar salên b.z bi dest xwe xistin, û bajarê **Aşokanî** (Waşokanî) kirin paytexta xwe. Dîroknas dibînin ku ew paytext li Girê Fexarê (Fixêriyê) dikeve. Yekemîn şahên wan **Paratarna** kurê **Kîrta** bû (li derdora sala 1520 b.z mir) .

Li derdora sala (1470 b.z) şahnişîna Mîtaniyan gelek fireh bû, Desthilata wan - li rojhilat- welatê Aşûr (Supartu) xist bin destê xwe û gîha çiyayên Zagros û devera Arrabxayê (Kerkûk)ê, û bi bakur da gihişt devera ku paşê bi (Ermenistanê) hate navandin, û li rojava jî gihişt Derya Sipî, deverên bakurê Sûriya (deverên Helebê û Hesekê) beşek ji şahnişîna Mîtaniya bû, û hin şahnişînên biçûk, li hêla rojava xistin bi desthilata xwe; wek şahnişîna **Mokêş** (Alalax), li sînorên Derya Sipî. Jîn Potro dibêje , ku ji nîvê duwemîn hezar salên b.z da, her tişt, ji Derya Sipî heya bi Nozî (nêzîkî Kerkûkê) ketibû bin sîwana împertoriya Mîtaniyan[1].

Di çerxa panzdemîn b.z da, sê şahnişîn li Rojavayê Asiyayê hevrikî hevbûn: Şahnişîna Mîtanî, şahnişîna Hitîtî (Hissî) û şahnişîn Misirê, erdnigarîya ku hevrikî li ser diqewimî Sûriya bû, bi gotineka din: Girîngiya Sûriyê ya ciyopolitikî û aborî, çimkê Rêya Herîr di bakurê Sûriyê ra derbsî Derya Sipî dibû, û Rêya Pixûrê di başûrê Sûriyê ra derbas dibû.

Lewra Misiriyan nîvê Sûriyê yî başûr kiribû dest xwe, û Mîtaniyan nîvê Sûriyê yî bakur kiribûn dest xwe, her yekî ji wan jî hewldida ku ê din ji Sûriyê biderxîne, û li hemberê jî Hitîtiyên Anadolêhewl didan ku Sûriyê ji dest herdiyan bistîne, û bixîne destên xwe, di pê ra jî Aşûrî bi hêztir bûn, û bûn hêza hevrikî ya çarê di Rojavayê Asiyayê da[1 (13)].

Piştî gelek nakokî û êriş û cengan, û li derdora sala (1440 an jî 1430 b.z), navbera Mîtaniya û Misirê baş bû, û li derdora sala (1410 b.z) hevpeymaneka dostane di navbera şahê Mîtaniyan **Şottarna yê duwem** û şahê Misirê **Aminhotibê duwem** da avabû, û şahê Misirê mîrejina bi navê **Cîlo-Xîpa** ji xwe ra kir hevser (jin), di pêra jî **Aminhotibê sêyem** mîrejina Mîtanî **Tado-Xîpa** ji xwe re bir[1].




Helbet Armanca têkiliyên dostane di navbera Mîtan û Misirê da ew bû, ku vêkra li hember Hitîtiyan rawestin, lewra jî şahên Hitît hewldan ku şahnişîna Mîtanî bi her awayî di bin desthilatiya xwe kin, an jî hilweşînin, û çaxa hevdijîtî ket navbera endamên malbata rêvebir ya Mîtaniyan, ba li bêndera Hitîtiyan hat, destên xwe xistin navera wan, û nakokî di navbera wan da gur kirin, bi destên wan şahnişîn kirin du perçeyên hevrikî, di pêra şahê Hitît **Şopîlo Liyomaş** (1390- 1350 b.z ) êriş ajot ser welatê Mîtaniyan, bi lez da ser paytext Waşokanî, ew dagîr kir û şah **Toşratta** kuşt. Şahnişîna Mîtanî ket bin desthilata Hitîtî.

Wê çaxê şahê Misirê **Exnatûn** (Eminhotibê çarem) bi pirsgirêkên hundirîn da mijûl bûbû, tu alîkarî bi şahê Mîtanî ra nekir[1]

Li hêla din hêza şahnişîna Aşûriyan bi hêztir dibû, û çaxa ku dîtin Hitît hinekî lawaz ketin, bi serperştiya **Aşûr Opalît** xwe ji desthilatiya Mîtaniyan rizgar kirin, bi ser da jî dan ser şahnişîna Mîtanî û li derdora sala (1300 b.z) şahê Aşûr **Adad Nîrarî yê yekem** Waşokanî wêran kir, di pêra jî, li derdora sala (1275 b. z) şahê Aşûr **Şelmansirê yekem** şahnişîna Mîtanî ji holê rakir[1].

Wek hemî Ariyan, rola hesp û alavên cengan di hêza Mîtaniyan ya leşkerî da berbiçav bû, navdarên Mîtanî yên cengewar, li Sûriyê û Felestînê bi (Merî Yenî na) dihatin navandin; eva jî peyveka Hindo-Ewropî ya kevne, wateya xwe (Xort, leheng, cengewar) e, û heya niha jî ev peyv di nav peyvên kurdan da bi awayê (mêr, merî, mêranî, mîr, mîranî) tê bikaranîn.[1].

### Jêder:

1 - Ebdil-Hemîd Zayêd: Jêdera berê, rû 373, 561. Jîrnot Wîlhêlm: Horî, dîrok û şaristaniya wan, rû17,29. Tewfiq Silêman: Lêkolînên şaristaniyên kevin yên roavayê Asiyayê, rû 312.

1 - Jîrnot Wîlhêlm:Jêdera berê, rû 24,29, 36, 107, 200. Cemal Reşîd Ehmed: Jêdera berê, beş 1, rû 601. Bongirad-lîvîn: Jêdera berê, rû 162.

1 - Jîrnot Wîlhêlm:Jêdera berê, rû 24, 98, 100, 101, 123. Fadil Ebdil-Wahêd Elî: Ji Somer heya bi Tewratê, rû 154.

1 - Ebdil-Hemîd Zayêd: Jêdera berê, rû 473. Wîlyêm Langer: Firehtirîn dîroka cîhanê, beş 1, rû 62. Rînê Labart: Efsaneyên Sûriyê, rû 8.

1 - Cemal Reşîd Ehmed: Jêdera berê, beş 2, rû 241, 243. Jîrnot Wîlhêlm: Jêdera berê, rû 62, 59. Ebdil-Hemîd Zayêd: Jêdera berê, rû 477. Mihemed Beyomî Mehran: Jêdera berê, rû 343, 344. Jîn Potro:Jêdera berê, rû 201.

1 - Tewfiq Silêman: Jêdera berê, rû 320. Mihemed Beyyûmî Mehran: Jêdera berê, rû 296.


1 - Jîrnot Wîlhêlm: Jêdera berê, rû 64. Cemal Reşîd Ehmed: Jêdera berê, beş 2, rû 255. Ebdil-Hemîd Zayêd: jêdera berê, rû 478, 479.

1 - Wîlyêm Langer: Jêdera berê, beş 1, rû 62. Ebdil-Hemîd Zayêd: jêdera berê, rû 485.

1 - Wîlyêm Langer: Jêdera berê, beş 1, rû 62, 63, 83. Ebdil-Hemîd Zayêd: jêdera berê, rû 485. Cemal Reşîd Ehmed: Jêdera berê, beş 2, rû 247. Mihemed Beyyûmî Mehran: Jêdera berê, rû 344.

1 - Jîrnot Wîlhêlm: Jêdera berê, rû 50, 87.

# Bîranînên Têkoşerekî Kurd



## Ehmedê Ebdirehman Axa Kurê Şahîn Axa Şûzî ...

### Xelek – 6 –

Dema Mistefa botanî vegeriya ji Barzan, gote me Mele Mistefa silava li we dike, û dibêje li çiyayê Agrî Gineral Ihsan Nûrî paşa şoreş pêxistiye bê verastin bi kesekîre ji bo arîkarî bi wanre bê kirin, lê divê hûn herin Sûrî, û Xueyîbûn karibe alîkariyê bide wan, û li cem me emê binerin çi alîkarî bi şoreşê re em karin bikin.

Şoreşa Agrî gelek dom nekir, û çîroka şoreşê li gor me bihîst, ev bû:

“Dema dinaxvegera çûna meya Silêmaniyê û ketina meya di zindana Erbîlê de û paşve vegera meya bo Mûsilê, ji meha Sibat ê ta meha Pûşper ê, em ji bûyerên ku li ser qada Kurdistanê qewimîn dûrbûn, ji ber di dawiya vê demê de şoreşa dawî ya Agirî Dax vêket, û tu têkiliyên hevrêzkar di navbera şoreşê û komeleya Xweyîbûn de nebûn, herweha serokê giştî yê şoreşê ceneral Îhsan Nûrî paşa gelekî bilez dest bi şoreşê kir.

Serokatiya Xweyîbûnê jî xwe neçar dît da tevlî şoreşê bibe, û drûşma Xweyîbûn ji Îhsan Nûrî paşa re hat rêkirin, wîjî ew wek sembola şoreşa Agrî bikaranî.

Serhildêrên Kurd li gelek deveran belavbûn û çiyayên Agirî yê mezin û yê biçûk herweha piraniya deverên girêdayî herdû wîlayetên Bedlîs û Wan rizgar kirin.

Komeleya Xweyîbûn pilanek ji bo alîkariya serhildêran seranserî sînorê Sûriyê û Tirkiyê danî, da nehêle artêşa Tirkiyê li serhildêran bizîvire û di heman demê de da wan mijûl bikin ji bo şerê şoreşvanan nekin, pilana Xweyîbûnê herêmên Kurdî yên di navbera Kobanê û çemê Diclê di hewand, û ev herêm bo heft deveran hatin veqetandin: Kobanê, Serêkaniyê, Dirbasî û Amûdê, Qamşlo, Tirbespî, Çilaxa û Dêrik.

Lê ji ber qelsiya ji aliyê hin serkirde û serokên êlên Kurdî ve û nedilsoziya wan kesan ji peyman û sozên ku dabûn re, bû sedema zîvrandina artêşa Tirkiyê li serhildêran; û bi alîkariya artêşa Ferensa yê ji Tirkiye re hate kirin careke din şoreş hate vemirandin, û careke din kuştin, işkincekirin, komkujî û koçberî dibe para Kurdan, û şewat, hêrfandin û wêran kirin dibe para xaka Kurdistanê.

Van bûyeran hişt ku bawerî di nav gelek endamên komeleya Xweyîbûn de nemîne, û gotina ku dibêje Kurd bixwe sedema serekene di dagîrkirina dijmin ji welatê wan re tekez dike”.

Di sala 1931an de, di meha Gulanê de, ez, Şêx Ebdilrehman û Mistefa botanî, ji gundê çiftikê, me berê xwe da Sûrî, bi nigê xwe em gîştin gundê Tildarê, û em li mala Mele birahîm bûn mihvan.



Piştî me çend roj li wir qedandin, me berê xwe da Kurdistana Tirkiyê ji bona xebatê, em li gundê navçe ê botan geriyan.

Di rêya vegera meya ji Sûrya re, me rêya xwe bi bajarê Şernex xist ji bo dîtina Elî Xan (berê axayê Şernex bû), em çûn pişt qesra Xalidê Osman axa, li milê Rojhilat ve, wext ji beriya banga sibehê bi sa’atekê bû, û sermayek zor li me dixê, Mistefa Botanî çû cem Elî Xan ji bo wî bîne cem me, piştî çarîkê vegeriya û gote mi ew nedît.

Me berê xwe da rê a vegeranê, qederê çarîkekê em meşiyan, me dengê peyana kir ji dûr, û hino hino dengê wan bilind dibe, xuyaye berê wan li gundê Şernexe. min gote Şêx emê xwe bidin alîkê xwe ragirin ta biborin û bi dûre emê bi rê bikevin. Şêx got: Evê tên Şernexî ne, xem nakê ne gereke em xwe bidin alî..

Em meşîn ta em nêzîkê hev bûn, û dunya zelal bûye hima mero hev dibîne.. peyak ji wan deng kir, got: hûn kîne?, mi lê vegerand û got: ez ehmedim suxteme bi Şêx Ebdirehmanê garisî re, û bi mere Mistefa yê botanî ji Şernexe, hew me dît teva bazdan, û hatin destê Şêx maç kirin, bi dûre em dorpêç kirin, 11 peya bûn bi serokatiya Misto yê hecî Îsev ê gote me: me hûn girtin û emê we teslîmî qeymeqamê Şernex bikin.. rabûn herdû tifengên me û demança Şêx ji me standin, û ji Mistefa Botanî re got: çima te ew di vê rê yê de anîn ta em wan bigrin, ma tû nizanê kû hikûmeta tirkî 1000 zêrê mecîdî ji bona teslîmkirina Şêx bi saxîtî, û 500 zêrê mecîdî ji bona teslîma serê wî..

Mi gelek hêvî ji wan kir kû me berdhin, lê mixabin em bernedan, em birin nêzîkê qesra Egîd axa kurê Silêman axa, li cem qesrê em man û Misto çû cem Egîd axa.. piştî bihnekê Misto li dû Egîd axa re serê xwe nizim kiriye, Egîd axa hate destê Şêx maç kir, û got: li qisûriya van hovan ne nerin, hûn li ser çavan mîvanê minin..

Şêx gotiyê mala te ava, em dixwazin herin.. me xatir jê xwest û bi rêya xweve em meşiyan qederê nîv sa’atê Roj derket, hin deviyên kû li nêzîkî rê bûn me xwe xist bin wan.

Em mane di bin deviyan de ta roj çû ava, û piştî me mêja xwe kir em bi rê ketin, û piştî qederek baş em meşîn me bîna xwe vekir ji beriya em rêya xwe biguherin û bikevin ser rêya diçe bi aliyê çiyayê Cûdî de, em meşîn ta kû dunya hinekê zelal bû, dîsa me xwe di nav delavên Çiyayê Cûdî de veşart ta roj çû ava, û tarîbûnê xwe veda, em ji nav delavan derketin û meşîn ta em gîştin ber ava Hîzil, me av derbaskir û berê xwe da Zaxo.

Li Zaxo 20 rojan em rûniştin, û ji wir me berê xwe da Mûsilê, 10 rojan em li wirjî man, û bi dûre me berê xwe da Sûrî, em gîştin gundî Baneqesrê.

Li wir me reşbelegek ji Xweyîbûnê re rêkir, tiştê ligel me çêbûn me hemî têde nivîsî, piştî çend rojan bersiva reşbelega me ji cem Xweyîbûnê hate ji mere, têde danîbûn: tiştê we nivîsîbû di reşbelegê de hemî me zanî, û em gelek spasiya we dikin, û yezdanê pak alîkarê we be.

Piştê mehekê peyak ji Şamê hate cem me, reşbelegek û muhra Xweyîbûnê û hinek belavok dane me, di reşbelegê de nivîtibûn: Demên we tim xweşbin... bi Hemo re muhra Xweyîbûnê û hinek belavok me ji were şandine, em hêvîdarin kû bi aştî bighîne we, û divê hûn vegerin tirkiyê, ji ber me bihîstiye Arif beg û birê wî Adil beg ji gundê Miksê ne, ji ber tirkan reviyabûn Îranê, û carek din bi dizî vegeriyan e. Divê win wan bibînin û alîkariyê bi hevre bikin ji bo rêya postê hûn biçêkirin bidin di nav sûrî, Îraq û Tirkiyê de ji alîkî, û aliyê din hûn xebata xwe di nav millet de berdewam bikin... Xweyîbûn pir spasiya we dike, û yezdanê pak alîkarê we be.

Dema me reşbeleg xwend, me karê çûnê kir, me 9 peya xwe girêda ji bona çûnê:

Şêx Ebdirehmanê garisî, Ehmedê şûzî, Şeref Sultanê Hesen, Elî yê Qolçî, Elî yê Hemîd, Lawikê Berwarî, û Sê peyayê Ermenî navê serokê wan Azad bû, peyakî zor zana bû........

**........................ Dumahî heye ..........**

Dr. *Ehmed Xelîl*

Wergêr: *Heyder Omer*



# Kesayetiya kurdî Lêkolînên civaknasîn



Xelek - 12

## MIROVBENDÎ Û COMERDIYA KESAYETIYA KURD

### Kînga mirov mirovbend e?:

Di nav nirxên siwariyê de, em li nirxên wêrekiyê û lehengiyê geriyan, û bi belgeyên bêlayane û rêberên dîrokî çespandî, hate diyarkirin, ku wêrekiya kesayetiya Kurd nirxekî resen e. di van rûpelên jêrîn de, em dê nirxê mirovbendiya kesayetiya Kurd, û şûna wê di çanda Kurd û tevgerên wan de bipelînin.

Di vî warî de, tê bîriya min, gava min di xurtaniya xwe de jînenîgariya navdaran , ya fîlozofê Yonan; Sukrat jî di nav de, dixwend, tiştê herî pir bala min, ji jînenîgariya wî kişand, bûyera mirina wî bû. Tiştê tête zanîn ew bû, ku Sukrat xwediyê hizra guhertina ramanî û sinçî ya civaka Athînayê bû, û sala (399 b.z) ew bi riswakirina Xwedayan û bi pîskirina xortan hate tawanbarkirin, û birayara dadê ji bo kuştina wî hate girtin. Gava ew di zîndanê de bendewarê bi cihanîna wê biryarê bû, şagirtên wî pilana revandina ji zîndanê û derxistina wî derveyî sînorên Yonanistanê, pêşberî wî kirin, û wî jî ew yeka nepejirand, û li gor biryara dadê, şerbeta jehikirî vexwar, û bi wêrekî pêşewaziya mirinê kir.

Ez ji xwe dipirsiyam:

Çima Sukratî rev nepejirand? Çima ber bi mirinê de çû, tevî ku dizanîbû sitembar e ? Behaneya di destan de ew bû, ku navê gelê xwe pîs nake, û ji hember zagonên, ku gelê wî erê kirine, bi der nakeve. wê hingê min nikarîbû di vê behaneyê bigihînim. Ma çawa dikarim di helwesta Sukrat bigihînim, ew î di wan tepelên bilind de ye, û ez jî hîna di pileyên nizim de tev digerim? Çawa ezê di helwesta wî ya mirovbend bigihînim, û di heman demê de dibînim, ku nirxên dagerînê min dorpêç dikin, û riyan li pêş min digirin?.

Belê… tu li tepelên bilind û gewre bî, wateya wê ew e, ku tu kurê mirovaniyê yê dilovan î, kurê nimûneyên bilind û helwestên payan î, parêzer û nûnerê zagonên tevayî yî, di ber wan de didêrî, û ji bo domdariya wan miqatî, jihevxistina wan, ne ji nêzîk û ne jî ji dûr ve, napejirînî. Tu li pileyên bilind bî, wateya wê ew e, ku divê tu comerdiyê di kesayetiya xwe de, ji her warên raman û gotin û kar de, gewde (diyar) bikî, û tu her amade bî, ku sermiyan û dema û derûna xwe jî ji bo vê yekê pêşkêş bikî.

Eger tu ne comerd bî, tê karibî weha bî ? Gelo, eger tu ji kaniya comerdiyê û qîretiyê venexwî, tu dikarî bibî kesekî mirovbend, û ji destlatiya ezezîyê rizgar bibî? Gelo, eger tu li hember rakêşên malperstî, êlperestî û gurûperestî bi ser nekevî û ji dil û durv de tev miletê xwe nebî, tu dikarî bibî kesekî comerd ? Eger tu di navbera miletê xwe re bala xwe nedî miletên mayîn, tu yê nikaribî bibî kesekê comerd ? Eger tu ne miqate bî, ku nebî ne sitemkar û ne jî sitembar, ne kolekar û ne jî kole, tê karibî bibî kesekî comerd?.

### Comerdiya hişyariya komel a Kurdî:

Rastî ew e, ku nirxê comerdiyê li ba kesayetiya Kurd şûneke payebilind heye. Lê ji ber ku me soz dabû, ku em, ji bo şirovekirina tiştan, dîrokê li ser serî rabawetînin, û erebeyê jî nedin pêşiya hêsp, ve lomê nabêjin, ku (Kurd gelê Xweda yê bijare ye), û ji ezmanan de hatiye rûmetkirin, pêre jî hêja ye, ku bibe (comerdtirîn gel). Ev boçûnan û yên weke wan di dema zaroktiya hişyariya mirovanî de hatin çêkirin, mebesta jê germkirin û coşkirina gel bû ji bo armanceke sînorkirî, û ji bo bi cihkirina pirojeyên destêwerdanê û talanên dagîrkirinê. Zanîn û naskirina humayan, rastirîn rabaza têgihîştina dîroka mirovaniyê ye . Li ber ronahiya vê rêbazê, em weh diçin ku sê humayên nirxê comerdiya kesayetiya Kurd hen in:

### Yekemîn. Êkoligiya çiyayî:

Berê jî bi me re derbas bû ye, ku çiya kilîtê kesayetiya Kurd e, erdnîgariya hişkî û hêzê û tenêtî û xwetêrkirinê ye, ji bo kesê xwe pê bispêre keleha herî hêzdar e. Her weha me dît ku gav ev taybetmendiyan li gel hevdu tev digerin, nirxên wêrekî û pêşdaçûnê di kesayetiya kesê çiyayî de gur dikin, û wî neçareyî gewdeyê hêzdar, hêza bê hempa, xweziya bê jêveger, paqijiya derûnê, evîndariya azadiyê, nepejirandina sitemkariyê û dijîtiya pirojeyên kolekarkirinê dikin. Bi vî awayî tê xuyakirin, ku erdnîgariya çiyayî hevpişkê afirandina mirovê (aza), ne yê (kole) ye . Ma kînga rista sinçî ya mirovê aza ji comerdiyê bê par bû? Û kînga mirovê aza ezezîtî wek rêbaz, nizmîtî wek helwest û bêrûmetî wek rê ji bo xwe hêja dîtiye?.

### Duwemîn. Nirxên tevehî:

Pergala tevehî di serdemên kevirî de, nirxê comerdiyê wek pêdiviyekê ji bo serastiya jiyana komela didît, jiyana komelan di wê pergalê de li gor rêbaza (yek ji bo hemiya ye, û hemî ji bo yekî ne) li ser hevtewawî û hevgirtinê radibû, di civakên wê pergalê de şûna kesê ezezî (xwehez) û kedxwaran, ya nizman û bêrûmetan tune bû. Eger kesine weha hebana jî, ewana li keviyan diman, û mercên jiyanê riya serdarî û rêvebirina civakê li pêş wan digirt, vê lomê ewana nikarîn hilkişiyana tenga entilcênsiyayê, û ji bo gewdekirina nimûneyên bilind û afirandina nirxên baş, yên li gel wan nimûneyan têkildar in, ne hêja bûn. Belê…gotina „ *Serdarên we bi çawaniya we ne*“, li gor pêwr û mêzînên dîrokî yên rêveçûna civakan, gelekî rast e, divê ji bo nirxandin û serastikina civakê ji bîra nebe.

Ne tiştekî nehênî ye, ku giringtirîn daxwazên, ku mirovanî ji demên kevin de, pê mijûl bûye û wê mijûl bibe, dudu ne; yek ji wan zik e (xwarin) û ya din jî rûmet e ( azadî). Pergala tevehî ji bo hebûna evan herdu daxwazan, serdema zêrîn bû.

Lê bi pirbûna mirovan û diyarbûna (berkara zêde) re, ew serdema zêrîn hate pişaftin, û rista wê ya sinçî di bin piyên hespên çêkerên împeretoriyan, di demên berê de, û di bin tangên dagîrkerên serdema nû de hate hilweşandin.

Her xweziya demikratiyê, di bingeha xwe de, hewildan wergerandina hinek teyabetiyên serdema zêrîn in .

Di çareçewa van rastiyan de em dê karibin di helbestên (çêreyên) helbestvanê Rom; Virgil (70 b.z – 19 z), ku jiyana çêrê û gundîtî tê de dipesinand, û di mêldariya rometîka wêja cîhanî ya nû, bigihînin .

Ji başî û nebaşiya şansa Kurd vêkra, ew e ku ewana li gel sinçên tevehî têkildar bûn. Ew yeka jî bi boneya sê sedeman bû:

**1.** Êkologiya çiyayî Kurd neçareyî awayê civaka cêrê/şivanî kir, tev hemî hizr, mirûz, têkilî, nimûneyên bilind, helwest û nirxên vî awayê jiyanê kir, di pêşî de jî nirxên siwariyê, mîna wêrekî, pêşdaçûn û mirovbendiyê.

**2.** Ciyopolîtîka Kurdistanê û derbasbûna (riya Herîr)ya bazirganiya cîhanî di nava wê re, û pirbûna maden, dar/text, hesp û sewal bûn sedem, da kurdistan her tim bibe armanca talankerên, ku tê re ji rohilat ber bi roava de, û berajî diçin, pêre jî Kurd bêtir bi çiyayên xwe û civaka xwe ya êlî û bi rista xwe ya sinçî ve hatin bestan, da karibin pêşberî talankeran derkevin.

**3.** Dewleta Med rûdawa herî gewre û ronak ya diyarbûna Kurd di dîroka mirovaniyê de bû, eger wê du sedsalên din dom kiriba, dê Kurd îro, wek Farisan, Yonanan, Roman û Ereban xwedî nav û deng bûna, lê şikestina wê bi destên Farisan sala (550 b.z), destdanîna Farisan ser hemî aferînên wê yên şaristanî, tembiya (wesiet) şahê Faris Qembîz / Cambyses, ya sala (522 b.z), ji bo ku rê li pêş vejîna dewleta Med bigire, ev tiştan hemî bûn sedem, ku Kurd ber bi kenarekê de hatin têvedan û ji tevgera şaristzaniyê hatin bi derkirin, loma jî di çiyayên xwe de, digel şivantiya xwe, û rista sinçên xwe yên li gel nirxên serdema tevehî hevbest in, man.

### Sêyemîn: Rehên mîtologî:

Mîtologiya gelan encama nerîna wan li heyînê û gerdûnê bi tevayî ye, û wek çawa Key Exsar (Keyxesrew, li gor gotina rêzdar Dr. Mehdî Kakeyî) rûdawa Kurd ya polîtîkî û ronak bi şêweyê (dewleta Med) pêk hanî, û pêximber Zeredeşt jî, piştî ku xwe bi ser bermaya (kelepûr) ezdahî aryanî ya kevnar de pal da, rûdawa wê ya çandî bi şêweyê (Zeredeştiyê) pêk hanî. Û wek çawa hatiye zanîn ku her ayînek risteke hevtewaw e, ku ji zîmbolên rewa (Xweda û olperest), nimûneyên bilind, helwest, nirx, rêbaz û rêberan pêk tê, û ev rist bi awayê rêjeyên cida-cida derbas hemî warên jiyana kesayetî, civakî, aborî û polîtîkî dibe, Zeredeştî jî weha bû. lê tiştê balkêş ew e, ku Zeredştî bi piranî balê ber bi nirxê mirovbendiyê, di çaerçewa xwedayî û mirovanî de, dikşîne. Vaye li jêr hinek belge û nîşanên wê yekê:

***.** Xwedayê mezin Ahoremezda di Aevsta de hatiye salixdan, ku ew *„serekê tevdîrên ayînî û **mirovbendê** payebilind e*“(1).

***.** Mîsra (Xwedayê peymanan) jî di Avesta de bi mirovbendiyê hatiye salixdan . Di bangekê de

weha diyar e: „*Ez vê yasnayê ji bo Ahora yê nemir û **Mîsra yê mirovbend** radigihînim*"(2).

*. Di Zendavesta de weha hatiye gotin: „***Bibe mirovbend***"(3).

*. Di Zendavesta de hatiye gotin: „ *Pendiyarekî ji giyana hiş pirs kir: Mirov bi çi rê û karan digihên bihiştê? Giyana hiş bersivand: **Mirovbendî** yekemîn karê xêrdar e, xwerastgirtin duwemîn e, mukurhatina qenciyan sêyemîn e, xweragirtin çaremîn e û pêdiviya xêrxwestinê ji bo hemî qencan û **tu dostê her kesî be** jî pêncemîn e*"(4).

*. Di Zendavesta de hatiye gotin: "*Pendiyarî ji giyana hiş pirs kir: başîn/çêtirîn çî ye? **Mirvobendî ye, an rastî ye?**... Giyana hiş bersivand: **Mirovbendî** ji bo hiş çêtir e, û rastî ji bo tevayê cihanê çêtir e*"(5).

*. Di Zendavesta de hatiye gotin: "***Comerdî û mirovbendî** çêtirtirînin ji bo pêkhanîna karan*"(6).

*. Dîsan di Zendavesta de hatiye gotin: "*Bi dijminan re **mirovbend, nerm û derûnpaqij** be*"(7).

Ez weha dibînim, ku balkêşana ber bi mirovbendiyê de sedemek bû, ku fîlozofê Elman Firîdrîk Nîçê ber bi kesyaetiya pêximber Zeredeşt de kêşa, da ku li ser zibanê wî ramanên xwe ji bo mirovê aza (supirman) biderbirîne, û ez weha dibînim, ku nirxên Zeredeştiyê, yên li çiyayên Med, di hembêza civaka Med de berhemdar bûne, evîndariya (hişyariya komel) a Med bo qenciya mirovbendiyê, gewde dikin. Ewan nirxan heya îro jî rehên kûr di kesayetiya Kurd berdane .

Eger pirojeyên jihevxistina nasnameya Kurd, û hêrişên kevilkirinê û pişaftinê karîbûn hinek Kurdên revok ji vî nirxê payebilind bê par bikin jî, lê entilcênsiya Kurd ya resen her dilsoja nirxên xwe yên resen û kevnar, mirovbendî jî di nav de, maye. Gelek belge hene teqez dikin, ku nirxê mirovbendiyê hîna jî di (hişyariya komel) ya Kurd de zindî ye, û carcaran jî xwe diyar dike.

## Belgehine dîrokî ... Ji serdema Exmînî:

Metelokek Kurdî dibêje: "Dar li ser koka xwe radibe". Mirovbendî jî wusa ye, di dîroka pêşiyên Kurd de gelek kevnar e, derdora 2500 sal; di sala (490 b.z) de cengeke mezin di navbera Asiyayê, bi serpereştiya Farisan, û Ewropayê bi serperestiya Yananan li deşta (Maraton), çel kîlometr nêzîkî Athîna, qewimî.

Serdarê leşkerê Faris di wê cengê de yekek ji mezinên lêşkerên Med bû, navê wî (Datîsê Medî) bû, gava ku cezîrên yonanî dagîr dikir, ku paşê bide ser Athîna, niştevanên cezîra Dîlos reviyan, perestgeha Xwedayê Girîk yê mezin; Apollo li wê cezîrê bû, Datîs nameyek ji wan re verê kir, rêzgirtina rewayên wan tê de diyar kir, û got:

"Ey hêjayên rêzdar, çima hîn direvin ? Çiye ev nerîna havî, ya hûn hildigirin, ku we ber bi revê têve dide? Teqez ez rasteboçûn im, bê ku li benda fermanên şah Dara yê yekem bimînin, dikarim cezîra, ku Apollo û Artîmîs ( mezinên Xwedayên Yanan) lê ji dayikê bûne, awarte bikim, ez dê ziyanê negihînim wan û gelê wan. Vê lomê ez lava (tika) dikim, ku hûn vegerin mal û cezîra xwe"(8).

Piştî ku leşkerê Faris cenga Maraton wenda kir, Datîsê Medî dest navête tolhildanê û kotekiyê, belê li gel nirxên xwe yên mirovbendî hevbest ma, û rêzgirtina rewayên Girîkan diyar kir .

Hêrodot dibêje: "*Gava ew* (Datîsê Medî) *bi leşkerê xwe ve ber bi Asiyayê vedigeriya, ewî xewnek dît, naveroka wê nehate naskirin, ewî ferman da, ku ji berbanga zû de hemî geştî werin kontirolkirin, pêre jî peykerê Apollo di geştiyeke Fînîq de,* (hevpişka cengê bû) *hinek perçên zêr, ji bo veşêrin, dabûn ser, dîtin. Datîs ji bo cih û perestgeha, ku jê hatiye dizîn, pirsiya, û gava ew cih nas kir, li geştiyê siwar bû, û çû cezîra Dîlos, û peyker vegerande perestgehê*"(9).

## Ji serdema Îslamê:

Sala (583 k / 1187 z) pêşewayekî Kurd î din mirovbendî bi tevdîrên xwe yên serdariyê da xuyakirin; ew jî siltan Sulhedînê/Selah Dînê Eyyobî bû. Sala (570 k) sedarê Misir û Sûriyê bû, û dewleta Eyyobî damezirand, bi sala(581 k) re dewleta wî ji Hewlêrê li rohilat heya bi Lîbiyayê li roava, û ji Xelatê li bakur heya bi Yemenê li başûr digirt, vê lomê jî bervedêriya roavayê Asiyayê, û rûbirûtiya li hember hêzên ewropî; dagîrkerên Felestîn, Urdin û beşê mezin ji delavên Sûriyê, û gef û gur didan Misirê, bû stûbarê wî(10).

Sala (583 k / 1187 z) hemî hêzên ewropiyan li dij Sulhedîn tev lihev bûn, lê ew di cenga Hittînê de bi ser ket, di heman salê de jî cefayên wî bi rizgarkirina Qudsê encam dan, pêre jî ew bû serdarê roavayê Asiyayê. Evî siltanê mezin gelek helwestên mirovbendî bi paş xwe de hêştin, dostan qala wan kirin, û dijminan jî ew pesinandin. Dadger Beha Dîn Ibin El-Şeddad, yê ku di cengan de hevalriyê Sulhedîn bû, û pirtûka ( nûçeyên siltanî) di pey mirina wî re, sala 589 k/ 1193 z), nivisandiye, helwesteke wî salix dide:

"*Hinek dizên misilmanan hebûn, derbas konên dijmin* (ewropyan) *dibûn, û mêrên wan didiziyan, yekek ji çîrokên wan ew e, ku şevekê şîrmijekî sê mehî dizîn….gava diya wî pê hay bû, ku kurik wenda ye, tevayê şevê kire hawar û qîrîn, heya nûçeya wê gîha şahên wan*(yên ewrpopiyan), *ewana gotin: Ew* (Sulhedîn) *kesekî dilovan e, me rê da ye te, ku tu derkevî, êdî here, kurikê xwe jê bixwaz, dê ji te re vegerîne.*

*Ew jin bi derket, û digel hawara berdewam gîha ba parêzeran, û çîroka xwe, bi alîkariya wergêrekî, wergêrekî, ji wan re got, wan jî ew ber da, û şandin ba siltên. wê dît, ku ewî li ser girê Xerûbê, siwar e, wê hîngê ez û gele karmend pê re bûm. Jinikê bi giranî dagirî, û rûwê xwe di xakê da. Gava wî* (Sulhedîn) *pirsiya, kesên derdorê çîroka wê jê re gotin. Dilê wî nerm bû, rondik ji çavan herikîn, û ferman da, ku şîrmijê wê werînin, lê gava lêpirsînê, diyar bû, ku ew hatiye firotin, wê hîngê Sulhedîn ferman da, ku kurik were vegerandin, pereyên kesên, ku ew kirî bû ji nû ve pêdinê, û kurik jê bistînin. Wusa jî di şûna xwe de rawesta, heya ku kurik hanîn, û da wê, wê jî kurikê xwe bir, da ber sîngê xwe û giriya, kesên derdorê, ez jî di nav de,lê dineriyan û digiriyan. Wê katekê ew mêjand, û paşê jî ferman hat, ku wê li hespekî siwar bikin, û digel şîrmij, bigihênin nav leşkerê wan*"(11).

Ibin Şeddad, li ser vê helwestê dibêje: "*Bala xwe bidin evê dilovaniya, ku têra tevayê celebê mirovaniyê dike, Xwedêyo! Te ew dilovan afirandiye, wî ji rex xwe de bi dilovaniya xwe ya fireh werbigire, ey Xwediyê gewrebûn û rûmetê, û li belgenameyên dijiminan li ser dilovanî û camêriya wî biner*"(12).

Ibin Şeddad helwesteke din ji helwestên wî yên mirovbendiyê û comerdiyê salix dide, û bibêje: "*Çel û pênc kesên ewropî ji Bêrûtê hatibûn birin, û ji bo siltan hatibûn verêkirin, roja din gîhan cih. Wê hîngê min dilovaniya nazik, ku jê mezintir tuneye, dît . Kalepîrekî, ku didan di dêv de nam bûn, û bê hêz ketibû, di nava wan de bû. Siltên gote wergêr, ka jê bipirse, çima ew di vê navsaliya xwe de hatiye vê deverê? Û welatê wî ciqas dûr e ? Got: navbera min û welatê min çed meh hene, û ez ji bo seredan* (hec) *Qîyametê* (kenişta Qiyametê) *hatime. Dilê siltên lê nerm bû, û ew aza kir, li hespekî siwar kir, û şande nava leşkerê dijmin*"(13).

Gav Ibin Şeddad dide xuyakirin, ku çawa Sulhedîn ji xwînrijînê bêhteng bû, dibêje: "*Kurên wî yê biçûk, di riya min re, rêdana kuştina dîlekî jê xwastin, wî rê neda, gava min sedema wê yekê jê pirs kir, gote min: da ku ji biçûkaiyê de hînî xwînririjînê nebin, û ev yeka bi wan hêsan nebe*"(14). Sulhedîn ev rêbaz bi tembiya ji bo kurê xwe şah El-Zahir jî çespand û got: "*Bila haya te ji xwînê û rijîna wê hebe, xwîn ranaze*"(15).

Mirovbendiya Sulhedîn di helwesta wî de li hember ewropiyan zor numa diyar dibe; Sulhedînî şêst hezar kesên ewropî, ku ji ewropayê hanîbûn û li Qudsê bi cih kiribûn, ji Qudsê bi derxistin, Sulhedîn û serdarên ewropiyan li hev kiribûn, ku ew kesên ewropî ji nû ve bo welatên xwe werin vegerandin, hejmara dîlên ku mêr, jin, û zarok bûn, derdora 16 hezaran bû(16). Çawa ewî li gel wan da û stand? Lê berî vê, ma gelo ewropiyan çawa li gel niştevanên Qudsê dan û standin, gava wan Quds sala (492 k / 1099 z) dagîr kirin?.

Êdî ka em guhdarî li Stîvin Rênsîmen bikin, ku ew wê bûyerê dibêje: „*Serketina mezin, ku xaçeperestan, piştî cefayên giran, bidest xistin, hişên wan bir, loma jî ewana derketin kolanên bajêr, û avahî û mizgeftan, û her kesê, ku dîtin, çi mêr çi jin û çi zarok kuştin. Evê serjêkirinê wê êvarê û tevaya şevê dom kir, ala Tangird* (serdarekî ewropyan bû) *ku wan kesên xwe spartibûn mizgeftê, bilind kiribûn jî ew kesan neparast, berbanga sibeha din, gurûpekî xaçeperstan ketin hundirê mizgeftê û ew kesana bi tevayî kuştin, û gava Rîmond Acîl* ( serdarekî ewropiyan bû) *di dema taştê de seredana hewşa peresgehê* (mizgeftê) *kir, di nav terman re dimeşiya, û xwîn jî gîhabû çongan*"(17).

Gelo, helwesta Sulhedîn li hember wan kesên ewropî, ku di Qudsê de hatibûn bi cihkirin, û li hember dîlên ewropiyan çi bû?.

Rojhilatnasê Firensî Albêr Şandor mirovbendî û miroheziya Sulhedîn dipesine û dibêje:

„*Wî gelek caran diltenikiya xwe li hember lawaztirînên kirîstiyan diyar kir, û hewl da, ku wan ji çetiniya rewşa nû biparêze, û ferman da, ku nexwaşên wan di nexwaşxaneyên ku Espîtaran* (siwarên Yohenna yê olperst) *ew tê de derman dikirin de bimînin, û dest ji kenişta Gora Rewa ya Suryanan bera da, û berdêlî ji hezar û pênc sed dîlên wan yên xizan, bi fermana wî* (Sulhedîn) *û birayê wî El-Melêk El-Adil ( şahê dadmend) hate avêtin*"(18).

Stîvin Rênsîmen jî mirovbendiya Sulhedîn li hember jinên ewropiyan salix dide û dibêje: „ *Paşê, Sulhedîn ragîhand, ku dê hemî kalemêr û pîrejinan serbes berde. Jinên ewropiyan, yên ku berdêl dabûn, rondikên wan diherikîn, hatin ba*

*wî, û çarenûsa xwe jê pirs kirin, nemaze jî piştî, ku mêrên wan, yan miribûn yan jî dîl bûbûn. Sulhedîn soza serbestberdana hemî mêrên wan ji dîlîtiyê da wan, û pereyên, ku ewana hewcedar bûn, ji malê xwe da jinbî û sêwiyan, her yekî li gor rewşa wî. Rastî ew e, ku dilovaniya wî berevajî kirên talan kerên kiristiyên cenga yekem ya xaçeperestan bû*"(19).

Albêr Şandor tîne zimên, piştî ku Sulhedîn kesên ewropî ji Qudsê bi der xistin, û dîlên wan serbest kirin, ewana ber bi bakur de, çûn ba mirivên xwe li Terablisê û Entakyayê, lê bi awayê sar pêşewaziya dikirin, û hin caran jî dikuştin, û caracaran pere û hûrmûrên wan jê distandin, û nedihêştin derbas bajarên wan bibin, „ew kesên perîşan, piştî ku ji Terablisê û mîrnişîna Etakyayê hatin qewitandin, ji nû ve ber bi başûr de vegeriyan. Sulhedîn ferman da, ku konan û xwarina bê pere bidin wan, da karibin, bi riya deryayê ber bi roava de biçin, bi ser de jî ferman da, ku pirên wan bibin bajarê Iskenderiyê, ji bo ku bi lez bişînin welatê wan"(20).

Piştî rizgarkirina Qudsê, destlata Papa serî hil da, û Ewropa xwe ji bo vegerandina Qudsê tev geriya, sê serdarên mezintirîn dewletên Ewropa di sêyemîn cenga xaçeperestan de sala (1190 z) hevpişk bûn; yekem, Firîdrîk Barberosa; împertorê Girman (Alman), duwem, Rîçard (Rîkardos) Dilê Şêr; şahê Îngilera yê, û sêyem jî Fîlîp Ogust; Sahê Firansa yê bûn. Sala (1191 z) leşkerê wan gîha rohilatê deryaya Sipî, Sulhedîn sê sal pêşberî hêzên ewropiyan têper kirin, ji cengekê dikete yeka din.

Rast e, ew di hin cengan de bi ser neket, lê armanca Armanca wan ya mezin, ku şer ji bo wê dikir, ew jî vegerandina Qudsê bû, têk bir.

Divê em ji bîra nekin, ku şervanên ewropî wêrek û leheng bûn, humayê olewerî ewana germ dikir, û ber bi pêşdaçûnê de têve dida . Şah Rîçard jî siwarekî bejindirêj, mezingewde, hêzdar bû, û ji hêla hunerên cengê de jî jîr bû . Ibin Şeddad wî salix dide û dibêje: „ *Ev şahê Engetar e (Îngilterayê) hêzdartirînê wan e, wêrekiya wî gewre ye, û lehengiya wî hêzdar e, bûyerên wî gewre ne, û di cengê de çavbiçîk e*"(21).

Tevî ku Rîçard gelek ziyanên giran gîhande lêşkerê Sulhedîn jî, lê Sulhedîn rêza siwariya dijminê xwe digirt , û bi mirovbendî û comerdî pê re tevdigeriya. Ev yeka boçûna lêgervanê ermenî; Arşak Savrastiyan diçespîne: „*Kurd rêza her wêrekiya tekekesî û pehlewaniya cengewrî digirin*"(22).

Êdî werin, em helwestek yekta ya dîroka siltan û şahên roavaye Asiyayê binerin; ew jî helwesta Sulhedîn e li hember dijminê xwe Rîçard. Stîvin Rênsîmen li ser cengekê, ku sala (1192 z) li Felestînê qewimiye, dibêje: „*Siwarên misilmanan bi heft pêlan, her pêlek ji hezar siwarî peyda dibû, dane ser dijminan, lê nikarîbûn perjana hesinî* (xêzên leşkerên ewropî) *qul bikirana, evan hêrişan heya piştî nîvro dom kirin, lê gava Rîçard texmîn kir, ku hespên misilmanan westiya ne, kevan-avêjên xwe birin xêza pêşîn, û hemî tîrên xwe avêtin leşkerê îslamî, ku bi ser wan de dihat, wan tîran pêşdahatina dijmin rawestand, û paşê jî ew kevan-avêjan hemî vegeriyan paş rim-avêjên, ku bi serdariya Rîçard,bi dilsojî şer dikirin. Ev dîmenî bala Sulhedîn zor kêşa, loma jî gava hespê Rîçard hate xwarê, wî* (Sulhedî) *ferman da hesperwerê xwe, ku du hespan, di gerimya cengê de, wek diyarî bibe ji şahê leheng re*"(23).

Gelo, Bûyer û jînenîgariya siltan û şahên roavayê Asiyayê dide xuyakirin, ku yekî ji wan fêkî û berf ji dijminê xwe yê nexweş re wek diyarî şandine?!. Sulhedîn sala (1192 z) li gel dijminê xwe yê rikdar û metirsdar Rîçard wusa tev geriyaye. Stîvin Rênsîmen dibêje: „ *Bi bandora nxweşiya germê, Rîçard di bin konê xwe de mabû, û nexweşî lê giran bûbû, Sulhedîn ji şahê nexwaş re xûx û hirmî û hinek berfa çiyayê Heremon şand, da şerbetên xwe pê sar bike*"(24).

Piştî evan rûdawên mirovbendiyê, ma wê matmayî be, eger dîroknivîsên Ewropayê; neviyên Firencan, Sulhedîn bi rêzgirtin bi bîr bînin?. Eger kesayetiya wî ya mirovbendî û nirxên wî yên payebilind bala wan nekêşana, dê wusa bikirana?. Vaye rohilatnasê firansî; L. A. Sedillot, bi kurtahî li ser wan nirxan dibêje: „*Sulhedîn ciwantirînên rûçikan (sîfet) di xwe de dicivîne, ew li ba her bobelateke wêrek e, derûngewre ye, di peymanên xwe de dilsozê yekta ye, xwedatirs e, bi giyana dadê têrkirî ye, û dema serkeftinê naverast e*"(25).

## Ji serdema nû:

Di serdema nû de jî nirxê mirovbendiyê di rista sinçîtiya Kurd de reh berdane, û entilcêsiya wan, di gelek helwestan de ev yeka diyar kirine.

Ezê tenê sê helwestan bînim zimên:

**Helwesta yekem**, ji bûyerên cenga dewleta Osmanî û Rûsan sala (1908 z) werdigirim. Wê hîngê, zanyarê Kurd Mela Seîdê Nûresî ( Bedî El-Zeman) di nav leşkerê General Nûrî Wêsî de li eyaleta Mûşê, serleşkerê gurûpekê bû. Wî generalî ferman da, ku hemî Ermenan, jin, mêr û zarok, li deverekê werin komkirin û kuştin. Mela Seîdî hezar û pêc sed kesên Ermen di geliyekî de, nêzîkî Rûsan civandin, û xwarin û vexwarin heya êvarê da wan, û yekek ji wan, bi nehênî, şand ba leşkerê Rûsan, da Rûs riya derbasbûna wan vekin, û gote wî kesê ermenî: Ezê we aza berdim, û alîkariya we bikim da hûn derbas hêla Rûsan bibin, û da ku Rûs te nekujin, bêje wan ez ermenî me. Ew kesê ermenî gîha ba serleşkerê Rûsan, û daxwaza Mela Seîd jê re got, serleşker maliq ma, û nasnameya wî Melayî pirsî, jê re got, ku Melayekî kurd e. Serleşkerê Rûsan serê xwe hejand û got: <u>Kurd mêrên wêrek in, dîlan nakujin, bi awayê mirovane li gel wan tev digerin</u>. Paşê ew kesê ermenî vegeriya, û hemî dîlên ermen bi xwe re birin. Mela Seîd di bîranînên xwe de nivisiye: „*Ji ber tirsa, ku Tirk roja din wan bi dardakin, eger li ba me bimînin, min wê şevê heya bi sibehê nikarîbû razama*"(26).

**Helwesta duwem**, ji jînenîgariya zabitekî Kurd î din di nav leşkerê Tirk bû, ew jî Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Sîlopî) ye, werdigirim. Gava ew bûyerên cenga lêşkerê Tirk û şoreşgêrên Yonan, li deverên deryaya Reş, di dema yekemîn çarîka sedsala bîstem de salix dide, dibêje: „*Şukrî beg; serleşkê tevdîrên gelemper bû, em neçareyî kontirola hemî gundên Yananan, yên li ser riya me bûn, û komkirina zarokên kêmtirî 15-16 salî kirin. Pêre jî derdora 20 zarokan, li deştekê nêzîkî Aytepe, hatin komkirin, û hatin xistin hundirê axûrekê, û paşê jî ferman da min, ku ez wan zarokan gulbaran bikim. Min dizanî, ku nepejirandina fermanên Leşkerî di cengê de, dibe sedema tawankirina bê dilovanî, lê mêrxweziya kurdîtiyê, ya ku rûmeta mirovanî bilind dipesine, û wê di ser hemî tiştan re digire, nehêşt ez wê kira qerêj bikim. Vê lomê min ferman nepejirand û got: Ez ji bo şerkirina leşkerên Yonanan her amade me, lê ez zarokan nakujim. Şukrî begî nikarîbû, bi gef û guran û dubarekirina fermanê, boçûna min biguhêre, pêre jî ew karê qerêj bi yekekî din hilpesart, ewî jî zarok yekoyeko ji axûrê derxistin û kuştin*"(27).

**Helwesta sêyem** jî ji cenga Kurd û leşkerê şahnişîna Îraqê sala (1943 z) werdigirim . Li başûrê Kurdistanê, li devera Xeyzokê, şerekî giran di navbera şoreşgerên Kurd bi serpereştiya Mela Mistefa Barzanî û gurûpekî leşkerê Îraqê qewimî, ziyanên giran gîhan leşkerê Îraqê, û Mela Mistefa jî bi sivikî birîn bû. Lêhatinek bû, ku ew leşkere ku Mela Mistefa birîndar kiriye, dîl hate girtin, Mela Mistefa bi xwe ew parast, û rê neda kesekî, ku wî bêşîne, an rûmeta wî birîn bike, û roja din ew digel hemî dîlan verê kirin Mêrgesorê, û Nebî Hesenê, ku gelekî pê bawer bû, bi wan re şand, da wan biparêze, ku sax bigihên cihê xwe"(28).... Ji vê pê ve, her kesê dûr û nêzîk dizanin, ku Kurd li dirêjiya sedsala bîstem şoreş teqandin, û pêrgî gelek awayên kotekiyê û cînosaydê bûn, gelo ewana şer birin nav bajarên dijminên xwe? Ewana çi caran di bazaran û cihên gelemper de xwe teqandin ? Şervanên wan çi caran di nav sivîlan de xwe teqandin? Mizgeftek an keniştek hilweşandin?Serê kesekî jê kirin? Kîjan gel ewqas hatiye xeydkirin û êşandin, dest ji tolhildanê bera daye, û bi ser de jî hinek ciwanên xwe, keç û kuran, ji bo pirotestokirinê xwe sotandine? Ma tevayê cihanê ev yeka bi çavên xwe nedît, gava Emerîka, Îsrayîl û Yonan bi awanbazî tev geriyan, û sala (1999 z) Ebdula Ocelan dîl kirin, û xistin destên Tirkiyeyê? Kesê, ku biryara xwekuştinê bistîne, ber bi mirinê here, ma nikare beriya xwe, bi dehan kesan bikuje?.

Ne rast e, were bawerikirin, ku dîroka gelan tenê berjwendî, polîtîk û ceng in, belê gewherê dîroka gelan çand û nirx û sinç in, û dûhatuwa mirovaniyê ya ronak li gel sinçên mirovbend besta ye, û ez bawer im, ku sinçên mirovbend yên Kurd, di vê çarçewê de, nimûneyê baş e. Ev diyarde hêja ye, ku ji hêla xemxwerên lêkolîna kesayetiya gelan de, bi kûranî were şînkirin (tehlîlkirin), eger ewana vê diyardeyê vekolin, dê bibînin ku ji berbanga şaristaniyê de, di çanda Kurd de resen bûye, û entilcênsiya Kurd ya resen her tim ew bi rêveçûna serdeman re parastiye.

Belê, kesê Kurd heye şivanekî asoteng, an jî cotkarekî sade be, heye hilgirkar, an destek, an jî paqijkarê kolanan an solan be, da xwarina malbata xwe û kêmtirîn pêdiviyên jiyanê bi dest xîne, lê tevî wê jî di hundirê derûna xwe de mirovbend e, wê mirovbendiyê ji sermiyanê sinçî yê dîroka xwe ya kevnar werdigire, ev sermiyan sedema gotina serokekî Kurd e, ku sala (1675 z) bi baweriya yekta gotibû: „Ez, û ne siltanê Osmanî; împeretorê vê xakê/erdê, heye ew ji min hêzdartir be, lê ez ji wî mirovbendtir im"(29).

<u>**Jêder û çavkanî:**</u>


(1) Avesta, yasna, haytî 22, ayet 4, rû 101.
(2) Avesta, yasna, haytî1, ayet 11, rû 45.
(3) Zendavesta, deqên pehlewî, dadistan û mînox û xerad, rû 835.
(4) Jêdera berê, rû 856.
(5) Jêdera berê, rû840
**(6)** Jêdera berê, rû 835...

**Dumahî li Rûpela ()**

*Can kurd*



# NIZAR QEBBANÎ (Sûrî ye)

## Di riswakirina Seddam Huseyn da Şergeha U'robetê Kenok-girînok bû şergeha kendavê



xelek 2

*- 5 -*

***Xelkino:***

*Bo min rojnameyên li ser min binivîsin bikirrin*

*Ewana li kolanan, wek qehbikan, hatîne verişandin*

*Bo min kaxedên kesk ên jengî, wek geyayên beharê bikirrin*

*û hîbrê...û çapxaneyana...*

*Her tişt di dema me da tê kirrîn..hetanî tilî jî...*

*Mêweya ramanê bikirrin*

*..û li ber min bihêlin*

*..û ji min ra helbestvanekî bikelînin*

*..û têxin nav firaqên xwarina min*

*Ez ne xwende me..û li ba min dilgirêkek heye*

*ji ewê ku helbestvan dibêjin...*

*De ji min ra helbestvanina bikirrin,*

*ku li ser qenciya min helbestan vehûnin*

*..û min bikin stêrka her bergekî*

*Çiku van stêrkên sema û şanoyê*

*Hîç ji min ne bedewtir in...*

*Çiku ez, bi pereyên giranbiha, her tiştekî divêm, dikirrim*

*Ez destana Beşşar Bin Burd (6)*

*û lêvên Almutenebî (7)*

*û sirûdên Lubeyd (8) dikirrim*

*Çiku wan milyonên di diravmalê (Beytulmalê) musilmanan da*

*Kevne pêmayekî bavê min in*

*De bibin ji zêrê min, bibin..*

*û di daykepirtûkan da binivîsin,*

*ku dema min dema Haron Alraşîd e...(9)*

*- 6 -*

*Ey cemawerên welatê min*

*Ey cemawerên geyayên (10) ereb*

*Ez canekî (ruhekî) paqij im, ku hatî me we ji toza nezantiyê bişûm*

*Dengê min bi lêdanka kesk e, weku avpirka Endelusî (11)*

*Min berken biresimînin wek Cokenda (12)*

*û rûnerm wek rûyê Mecdelî ye (13)*

*Min biresimînin*

*û ez î helbestê bi diranêd xwe diçirînim*

*û xûna Ebcediyê (Alîfbayê) dimêjim*

*Min bi heybet û mezinahiya min*

*û bi çavê min ê leşkerî biresimînin*

*Min biresimînin*

*Gava ez we li ser milên xwe hildigirim*

*ber bi mala herheyînê*

*ey cemawerên geyayên ereb*

*- 7 -*

***Xelkino:***

*Ez berpirsê xewnên we me, ku hûn dixewînin*

*û ez im berpirsê her nanekê, ku hûn dixun*

*û wan dehekên (14), ku hûn -di paş pişta min re- dixwênin*

*Çiku asayîşa eywana min, min agahdar dike*

*Bi nûçeyên çivîkan û nûçeyên guliyan (seriyên geniman)*

*û li ser ewê ku di danga avisan da çêdibe, min agahdar dike*

***Xelkino:***

*Ez serbendê we me..*

*û ez bendeyê we me...*

*De li min biborînin*

*Ez im ê nebedkirî di hindirê eywana xwe da*

*Ez ne royê dibînim, ne stêrkan*

*û ne jî kulîlkek tehlê*

*Ji dema ku ez hatim ser deselatdariyê, ez mame zarok*

*û mêrên sêrgehê li hawîr min dicivin*

*Yek puf bilûrê dike*

*Yek li deholê dixe*

*û yek cox paqij dike*

*û yek solan paqij dike*

*Ji dema ku ez hatime ser deselatdariyê ez zaro me*

*Şêwirdarê eywanê bo min ne got : Na*

*Şalyarêd min hîç peyva (Na) lêvnekirin*

*Şandiyêd min li rûyê min bi carekê ne gotin: Na*

*Jinên min di razanga evînê da ne gotin: Na*

*Wan ez hokirim, ku ez xwe wek xwedîkekî bibînim*

*û ez gel ji balkonê da wek qûmê bibînim*

*De li min biborînin, heger ez bûm Holako'yek î nû (15)*

*Min rojekê hûn bo kuştinê ne kuştin*

*Belê ez we dikujim, bo ez pê yariya xwe bikim.*

---

*(1) Mecnûn û Leyla bi liyaniyê (eşqê) li nav Ereban navdar in.*

*(2) Ew dinivîse: Tewekkeltu ela la Allah*

*(3) Feyroz yek ji mezintirîn û hêjatirîn jinên stranbêjên Ereban e, ji Lubnanê ye.*

(4) Min çavkir: Min întîzar kir.

(5) Heccac Eltheqefî yek ji hovtirîn qeralên Iraqê bû di dema Ebbasiyan da

(6) Hozanvanekî ereb ê pir kevin e, bi helbestên liyaniyê (eşqê) navdar e

(7) Almutenebî yek ji mezintirîn hozanvanên klasîkên ereb e.

(8) Lubeyd Elaamîrî hozanvanekî liyaniyê ye, ew jî pir kevin e.

(9) Haron Alreşîd yek ji navdartirîn xelîfeyên dema Ebbasiyan e, di dema wî da

malê talanê ji gelek welatan dihat Bexdadê, lew re ew pir bi mal û dêrîn bû û rewşa Ereban baş bû.

(10) Di Erebî da herdu bêje (gelên û geyayên) pir ji hev nêzin . Nîzar Qebbanî li ciyê „gelên" bi zanatî "geyayên" ereb bi kar anîye.

(11) Endelusiya parek ji Espaniya ye, Ereban bi sedan sal dagir kiri bûn, lê paşê dîsa hatin qewitandin.

(12) Mebest Mona Lîza ye

(13) Mebest Meryem dayika pêxember Isa ye .

(14) Mebest deh sûretên ji Quranê

(15) Holako bavturkekî bi hovîtiya xwe namdar e

## Dîk

## Hozanvanê sûrî yê nemir: Nîzar Qebbanî

1



Li taxa me
Dîkekî sadîst ê xûnrêj heye
Perrên mirîşkên taxê hildiçine,
her sibeyekê.
Wan dinikilîne…devser wan dike
Bi wan re radikeve .
û dev ji wan berdide.
û navên çêlçûkan nayin bîra wî!!

2

Li taxa me…
Dîkek li berbangê diqîqîne
Wekî Şemşonê zorbilind .
Riha xwe ya sor dirêj dihêle
…û zorê li me bi şev û roj dike .
Xutbeyê bi ser me de dixwêne…
Bi ser me de sirûdan distirê…
Zînekariyê bi me dike…
Ewe yê tenha, û ewe yê herheyî
û ewe yê şiyandar ê zorbaz.

3

Li taxa me…
Dîkekî neyar ê, faşist ê, xudan ramanên Nazî,
heye…
Deselat bi tangê dizîye…
Hem azadî û hem azadîxwaz jî girtine
Niştek sîl kiriye…
Neteweyek sîl kiriye
Zimanek sîl kiriye .
Bûyerên dûrokê sîl kirine…
û jidayikbûna zarokan…
û navên gulan…

4

Li taxa me…
Dîkekê ku di cejna neteweyî de
Cilên generalan li xwe dike…
Sêks dixu…Sêks vedixu…bi Sêks serxweş dibe…
Li keştiyek ji govdeyan suwar dibe
Leşkerekî ji memikan dide berxwe, revandin!!…

5

Li taxa me…
Dîkekî ji koka Erebî
Gerdon bi hezaran jin vekiriye!!

6

Li taxa me… Dîkekî nexwende
Dibe serdarê Mîlîşiyakê
Ji talanê..û ji qirkirinê
Ji çandina heşîşeya keyfê
û ji pêdakirina pereyên sexte pê ve
fêr nebûye tiştekî dî…
Cilên bavê xwe difirot…
û gustîlka jina xwe dida rihînkirin…
û ta diranên miriyan jî didizî…

7

Li taxa me… Dîk
Hemî dilpêxweşiyên wî ewin,
ku agirê debançeya xwe ya cengî
bi ser seriyê peyvan de biteqîne…

8

Li taxa me…
Dîkekî damarlerzok ê dîn…
Her roj wekî Alhacac (1) xutbê dide…
û sermest wekî Almamoun (2) diçe…
û ji mînareya mizgeftê de bang dide:
" Subhana min… Subhana min…"
"Çiku ez im dewlet, û zagon"!!

*9*

*Baran wê çewa bi ser me de bibare ?*

*Çewa wê genim şîn bibe ?*

*û çewa wê xêr bi ser me de bê,*

*û berket wê me bipêçe?*

*Ev nişteke (3), ku Xwedê desolate têde nake…*

*Lê belê… Dîk têde deselatdarin…!!*

*10*

*Li bajarokê me…*

*Dîkek diçe…*

*Dîkek ditê …*

*û zorbazî her ew zorbazî ye…*

*Deselatek Lînînî dikeve…*

*Deselatek Amerîkî hêriş dike…*

*û yê hêrandî her ew mirov e…*

*11*

*Gava dîk di bazara gund re*

*Ji xwe xweş, perrverişandî derbas dibe…*

*û li ser herdu milên wî nîşanên rizgarkirinê dibirîsin*

*Her mirîşkeka gund bi zehînî bang li wî dike:*

*"Ey seroyê me yê dîk" .*

*"Ey mewlayê me yê dîk" .*

*"Ey generalê li gan ketinê (4)…û ey nêrê meydanê (5)…"*

*"Tuyî davdiliyê (6) milyonan jin".*

*"Ma pêdiviya te bi cariyekê heye?".*

*„Ma tu pêdivê misdanê yî?"…*

*12*

*Gava qeral çêrok bihîstiye…*

*Ferman da serbirr bi serjêkirina dîk .*

*Bi dengekî xeyidî got:*

*„Çewa dîkek ji zaroyên taxê*

*wêriye deslatê ji destê min bistîne?"…*

*„Çewa ev dîk wêriye?"*

*„û ezim yê tenha, bê hevpar!!" .*

--------------------------------------------------------

*(*) Jêder: Almantuf, hejmar 2, sal 2008, rûpel 13*

*(1) Alhacac, xelîfeyekî Abbasî yê xûnrêj bû, xutebe da, got:"Vaye ez dibînim, ku gelek seriyê bûyî li ber min in û dema jêkirina wan hatiye…"*

*(2) Almamoun: Xelîfeyekî Abbasî yê gelek ji xwe xweş bû, bi lewendiya cil û begên xwe navdar bû.*

*(3) Nişt: Weten, bi zarava Soranî Niştiman.*

*(4) Li gan ketin: Radan, lêketin, Sêks*

*(5) Meydan: Qad, peyvek Mîdî ya kevine, ne Erebî ye.*

*(6) Davdilî: Hezkirî, yar, bi Erebî Hebîb û Mehbûb*

……………………………… **Dumahî Heye** ………………………………

# MIROVBENDÎ Û COMERDIYA KESAYETIYA KURD

**Jêder û çavkanî:**


(7) Jêdera berê, rû 843

(8) Hêrodot: Dîroka Hêrodot, rû 467.

(9) Hêrodot. Jêdera berê, rû 476

(10) Ebo Şame: Çavên du gulistanan/ Uyon El-Rewdeteyn, 2/83. Ibin El-Esîr: Dîroka tewaw/ El-Kamêl fî El-Tarîx, 11/482-486, 493.

(11) Ibin Şeddad: Nûçeyên siltanî/ El-Newadêr El-Sultaniyye, rû 158-159.

(12) Ibin Şeddad: Jêdera berê, rû 159.

(13) Ibin Şeddad: Jêdera berê, rû 156.

(14) Ibin Şeddad, Jêder û rûpela berê.

(15) Jêder û rûpela berê.

(16) El-Meqrîzî: Pirtûka awayên tevgerê ji bo naskirina dewletên şahan /Kîtab El-Sulok Lî merîfetî duwel El-Mulok, Beş 1, birê yekem, rû 122.

(17) Stîvin Rênsîmen: Dîroka cengên Xaçeperestan / Tarîx El-Hurob El-Selîbiyye, 2/1/426.

(18) Albêr Şandor: Sulhedînê / Selah El-Dîn) El-Eyyobî: rû 234.

(19) Stîvin Rênsîman: Jêdera berê, 2/753, û biner: Albêr Şandor: Jêreda berê, rû 234.

(20) Albêr Şandor: Jêdera berê, rû 235.

(21) Ibin Şeddad: Jêdera berê, rû 157.

(22) Arşak Savrastiyan: Kurd û Kurdistan, rû 178.

(23) Stîvin Rênsîmen: Jêdera berê, 3/138.

(24) Stîvin Rênsîmen: Jêdera berê, 3/193.

(25) L. A. Sedillot: Dîroka Ereban ya gelemper / Tarîx El-Ereb El-Am, rû 227.

(26) Hesen Hişyar: Bîranînên şervanekî, Xelek 3.

(27) Zinar Sîlopî: Ji bo Kurdistanê / Fî sebîl Kurdistan, rû 49.

(28) Mesûd Barzanî: Barzanî û tevgera rizgariya Kurd / El-Barzanî we El-Hereketu El-Teherruriyye El-Kurdiyye, 1/88.


(29) Arşak Savrîstiyan: Jêdera berê, rû 88.




*Mizgîn Hesko*

## Xuncên Welat

Destdirêjî
li xuncê nekin
duh ...
welatek... di hilm û bîna wê de
xwe radestî bextê rojê dikir
û îro...
welatek... di axînên wê de
sikratan dike
û li ber dergehê mirinê
mirina asoyê
hest û nestên mirovanî
liva xwe
ya ber dawî dikin
ji dil
em sil dibin.



Gulfiroş
dibe pîrhevok
û ew bi dasa xwe
ya agirîn
serê laleyan diqetîne
belgên gulan disohtîne.

Destdirêjî
li Nesrînê nekin
duh...
welatek...di henasên wê de
ji dayik dibû
û îro...
welatek ... di birînên wê de
henaseyên xwe
yên li ber dawî
berdidî

duh....
welatek... di dêmên wê de
digernijî
û îro...
welatek... di nav pêlên xemgîniyê de
rondikên xwînê dibarîne
û dest ji xwe dice
welat.....?
û îro....
pişta welatî xwîz e
tîrên xwe yên jehrîn
di zikê buharê de neçikînin
di binê axê de
tovekî nûhatî
tireh dide
Welat hişîn dibe
7. Rêbendan 2014

*Beyar Robarî*



## Qazî

Qazî hêja pêşeng û bab
Ewe mezin cangorê welat
Xwedî kedek mezin û xebat
Kurd jê digirin hêvî û zad

Qazî mîrê Mahabad
Xwest jiyanek bi rûmet û azad
Û Kurd bibe xwedî maf û welat
Avakir komar li rojhilat
Hêvî û şahiya kurdan bi destê wî, pêkhat

Qazî payebilind rêber bû
Bi pêşeroja gelê xwe bawer bû
Doza wî kêşa kurdî bû
Nebes rojhilat bar û derdê wî bû
Serxwebûna Kurd û Kurdistan, hêvî û jiyana wî bû
01 - 02 – 1997

## Evîn zagone

Evîn zagone
Şêrîn û mezin kone
Buhûşta evîndar lê bûne
*
Evîn zagone
Para her mirove
Sipî, reş û more
Ker û lal û kore
Di ser kesî re nabore
Wekî mirinê bi dore
*
Evîn zagone
Napejrîne sînore
Çîn û çand û ole
*
Evîn zagone
Xweş talde û kone
Şev û hêvaran lê rone
Xweşî û şadî têde xatûne
Evîndar serbest radibe û rûdine
Efsana xwe şêrîn dihûne
21 - 10 - 2001

*Yehya Elaewîferd*



## Çar Sê-xiştî ji Emû Elewî

1
Ji aliyek tav li rê
Ji aliyek av li rê
Zerat mane çav li rê
2
Li ser ma da siyayê
Ronî sa me nemyê
Ezê bidim herayê
3
Em kaniya avan in
Serçaviya çavan in
Navek li nav navan in
4
Me navnîşan da te
Mane li benda te
Çi ket li henda te

Bêwar *BARI TEYFÛRI*



## KURDÊN SEXTEKAR ÊN TEWANDÎRA

Kî dibêje ev mileta mêrxase,
Ça mêrxase berdestada dirize,
Jîyanêda bê tifaqe, bê kese,
Mêrxas ewe bijî serbest û azad,
Welatê wî nekin wêran û berbad

Xêr şerada dicivine erdekî,
Her yek tê ji welatekî, gundekî,
Yekbûna wan dikişîne wedekî,
Yek û yekî qebûl nake tu wexta,
Hezar sale hevra bûne derd, xeta

Malbet-malbet, tayfe -tayfe dimeşin,
Hemberî hev bêîtbarin, bextreşin,
Xewda mane nafikirin bê nexşin,
Heya dawî nizm ketine ser hişkin,
Li welatan tim bê rêzin, bê piştin.

Nezanetîyê alt kirîye ev millet,
Hê nizane çîye şeref, sîyanet,
Derbazdike jîyaneke bê rûmet,
Yek û yekî qebûl nake tu wexta,
Hezar sale hevra bûne derd , xeta

Dîyar-dîyar hê dimeşe bê dewlet,
Kuda diçe jêra dikin pir lenet,
Dîrokêda bûye sosret, rewayet,
Yek û yekî qebûl nake tu wexta,
Hezar sale hevra bûne derd, xeta

Vî gelîda nema şeref û namûs,
Boy kara xwe ber her kesî dibe kûz,
Hevdifroşin dijî hevdu bûn deyûs,
Yek û yekî nanirxîne tu wexta,
Hezar sale hevra bûne derd, xeta

Kurd kurdara bûye cellad û cesûs,
Vê rewşêda jîyan dikin kurd têkûz,
Van gilîya dinivsînim bi meyûs,
Yek û yekî qebûl nake tu wexta,
Hezar sale hevra bûne derd, xeta

Cîhanêda bindestada dimeşin,
Qencî jî nay ji destê wan nexaşin,
Dengasîyada hev davêjin nebaşin,
Yek û yekî nanirxîne tu wexta,
Hezar sale hevra bûne derd, xeta

Sal tên diçin dibin qurne nameşin,
Malbet-malbet, tayfe-tayfe bi beşin,
Yekbûna wan xewn-xiyale serxoşin,
Yek û yekî qebûl nake tu wexta,
Hezar sale hevra bûne derd, xeta

Îxanetê alt kirîye ev millet,
Hê nizane çîye dîwan, seltenet,
Dîrokêda hev ra nebûn, şans, derfet,
Kurdo hevdu nenirxandin tu wexta,
Bi sed salan hev ra bûne derd, xeta

Nîvsara rast tenê min ra bû qismet,
Pêş nezana rewastîyam bi culet,
Bêwar Barî gelê kurd ra kir xizmet,
Ji rewşa gel ji dil dêşim bi derdim,
Ev çi deme bê welatim, bê erdim...

## Ji hesretê

Ji hesretê
Ez bûme evîndar û bengîyê azadîyê
Hîcrana wê bi deman libitand gîyan û heyîna min
Ji bo ku hemêz bikim wê
Li meydanan de ez bûm meş
Li ser çîya bûme cek
Ji bo jîneke azad bi rûmet
Bûme berxwedan
Min hewl da
Min biryar da
Ku bijîm azad
Hewla min bû cesaret rênîş mezin bû
Cîhana meda
Deng veda belabû
Bû armanc
Ruhê milyonan rapêça
Bû xastek
Bû raperîn
Bû berxwedana milyonan
Bû serhildan

## RAWESTÎYA LI DIJÎ DAGIRKERÎYÊ

Hesreta azadîyê
Ez hejandim bi salan
Bûye şoreşa peyva min
Sînorê parçebûnê lerizand
Bû rênîşa yekbûna bindestan
Hêsîr belangaz û koleyan
Wek wûlkanek miletek
Cîhanek berbi azadîyê ve fisiqand
Rengê bawerîyê
Serhildana milyonan
Bi îsrar dimeşe
Bi biryar radiweste
Bi zanetî ê serkeve
Ê serkeve

## SER KEVTIN NÊTA MEYE

Heq û maf û karê meye.....
Mijara helbesta min
Bi şoreşkerî êrîş çêkir
Li ser dunya êrîşkar û dagirker
Ji bo ku ragêhije rizgarîyê
Vê oxira pîroz û evra de
Penaberyê de
Li welatan
Li qadan
Li xerîbayê de
Bû gazî û hewar
Ji bo azadîyê

Hewara demêye
Raperîna helbesta min
Şoreşa milyonaye
Raperîna helbesta min
Ji bo azadîyê.............

7.XI.2013

## Xorşîd Şûzî



## Pêjinên Ramandinê

### 1- HEZKIRIN

Dest nede hezkirina minî... Bê hêvî

Ji ber nalîna dirêse... Bi dijwarî

Bi hetên vale qîrîna blav dike... Bi zorî

Bi hêsirin zuha... bê kanî
Li memikê ewran Dinere... Bi awirî

Da bê deng bimîne... bi bendî
Û neşû derdên... Bê dermanî.

### 2- TÛMIRÊN EVÎNIYÊ

Bi hevre em.. Diçin
Di hembêza parsiwan.. Digerin
Li ser şaxê dil.. Distirînin
Evîn û hejariyê.. Belav dikin
Di nav pêlê loman.. Soba dikin
Leylana belengaziyê.. Dirêsin
Bahoz û bêzarî.. Li wan dixin
Di xewnan de bi hevre.. Tevne dikin
Di damarên viyanê de.. Diçînin
Li gerdûna dînatiyê..
Bê tovê dilovaniyê..
Gurzê stiryan.. Belav dikin
Bi hisbûna lîlandina goran...
... Berbejnî dipêçin

### 3- MIRIN

Dema neman reşçirûsk dide
Di çirava jiyanê de avjenî dike
Tevzînok bi ahinga dixîne
Wekû birûskên di sîngan de lerizîne
Wekû bûka bibe hevjîna kefenekê
Li ser awazên bilûra şînê...
Newazin bê deng saz dike
Di kavên deman de digerîne
Di cîgehê bîrkirinê de.....
......Winda dibe

### 4- RÊ YA BÊ HÊVÎ

Eger tu sawêrekî bê warî
Di rêyên dilxwaziyê de bi rêwîtî
Li şeqamên li paş sînorên deman bigerî
Dema sûraba azadiyê ti dorpêç kirî
Û zikreşî bi hezkirinê te guherî
Û kulîlkên hêviyan ramûsan kirî
Û tu bûyî xwediyê xewnên mirovatî
Wê demê... rê bi min bide xuyanî
Ji ber ez li hêviyê bendewarim...
..... Bê hêvî

### 5- ÇAVNEBARÎ (ZIKREŞÎ)

Di şanoya çavdariyê de
Bi tenê rawestiya ye
Wekû sawêrek bê hiş maye
Li hêviya siwarbûna stêrekê ye
Da wî çenke gerdûneke dûr
Lê xwe dît hatiye avêtin..
Di nihûna xeyalan de tê gevizandin

### 6- MAYÎN (NEMIRÎN)

Çerxên felekê bi dûrbûnî
Jêre xuyakirin bi geşî
Li paş bê dawiya rûpoşkirî
Doza rawestina rêwîtiya belengazî
Di nav gola jîna bê oxirî
Kelekên xeyalan wî dibin bi dizî
Li ser gerdûna azadiyê datîne bi hisî
Dixwaze veşêre derdên bargiranî
Tîrin ji canê wî bi lezî
Di ahinga sermediyê de......
...... bi cî kirî

## Ehmed Mustefa




### ZIMANÊ KURDÎ

Evîn û rind e
Sipî û bilind e
Delala gund e
Zimanê Kurdî

Şahî û cejn e
Ruh û gîyan e
Hebûn û jiyan e
Zimanê Kurdî

Şêrîn û xweş e
Gewr û keleş e
Dermanê dil e
Zimanê Kurdî

Vîn û evîn e
Wek Mem û Zîn e
Zindî û hêşîn e
Zimanê Kurdî

Ehmed Mustefa
2014/1/23



# Can kurd

## Evdalê Zeynê - Beş-1(*)



### Berhevkar: *Husên Emîn*

Evdal gazî kir, go:

Gulê rabe îro dudemê

Ez li Xabûrê vê dewletê

Gulam yeka enî kever e, meş werdek e, bisk bi têl e, qube qaz e

Ser govendê, çavê min dî, dilê min ketê

Ezê ji dê û bavê bixazim, eger da, bi xwe da

Eger neda, ji derdê dila, ez û Gula bav Fille

Bibin xûşk û birakê axretê

Gulê canê, Gulê canê,

Şemamoka min, heyranê,

Te diran sedefê, koka dirana mircanê,

Sîngê te dikana Ênciyanê,

Eger zor be, bi xatir be,

Ez Evdalê Zeynê,

Tu benî însan pêşmayî xilas nebye,

Ez ê te têxim kewaniya mala di giranê.

Gulê gazî kir, go:

Evdal ez Gulo me, ez Gulo me

Reben ez im, ez kulîlka devê rê me, ez fena hîva di çardeh me

Evdal şaş me be, ez maşûqê xaçê xwe me

Evdal dîn e, Evdal dîn e,

Gelî bira, dayîma dilê rûta bi xema xweş e

Evdal di dilê xwe da dive, belkî Gulê sonê da

Bisurman bibe, min bistîne

Evdal gazî kir, go:

Gulê nel (ne li) (**) hatinê, nel (ne li) çûyînê

Û zalimê te dilêm kirî behra Wanê, xwînê

Hema tu min nastînî wijdan bike rabe

Kêleka min Evdalê Zeynikê qasekê rûnê

Heyla Gulê lê gulikê, bejin ziravê, çik kêlikê

Eger zor be an xatir be, ez Evdalê Zeynê me

Ezê îşev ji pêra werim tuwafa xala Gulê li ber qirikê

Gulê gazî kir:

Ji bavê te zêde ye dêran bi min dêran

Tu rabî serê min jêkî, du guzana bi danzde kêran

Min sond xwariye bi Încîla Îsa,

Tewrata Musa, dînê Nebî Mihemed

Ez hetanî mirinê, serê xwe mêrkê busirman ra nakim nav nivînan

Evdal go:

Gulê, ez û te, tu were bikelime

Dîwana Surmelî Memed Paşa li tepe ye

Ezê sibê vî çaxî çar cameêa bi xwezgînî rakim

Bişînim ber derê mala bavê Gula xwe ye

Gulê go:

Te ra bi Kurmancî dibêjim: Zêde neçe bol nebire,

Dîwana mîrê min bêce ye

Ciyê dorê rabûn gi (giş) şûşe ye

Galegale tu dîwana mîrê min da dibêjî,

Dîwana geda guda nîne

Dîwana zor Surmelî Memed Paşa ye

Lawo, ez pîrek im, tu zilam î, galegalê tu dibêjî mi ra

Eyb e, devê te û şanzde bavê te zêde ye

Evdal gazî kir:

Gulê dîwana Surmelî Memed Paşa li girê hanê

Gulam yeka enî kever e, meş werdek e, bisk bi têle,

Lawo, çav kil e .

Minê teji (te ji) xwe ra bixwasta,

Qusûra Gulam ewe, li ser qalça rastê kut dikule .

Gulê bi dev da digirt, go:

Rast e, şaîrî ji devê min zêde ye,

Sibê vê çaxî kermke (kerem bike) qasekê,

Ji kêfê ra were mala me ye

Ezê deynim ber te cotê gorê bi tokme ye

Cotê zermeimkê min, te ra mînanî birincê Lûlexana Diyarbekir

Meriv sibê zû xurînî bixu vê cemae'tê bela(v) bike

Cemae'ta dora xwe ye

Eger xelqê ji t era go: Hediya Gula bav Fille çi bû?

Bextê jina xera neke,

Bêje (Bibêje) ji devê min û bavê min zêde ye .

Evdal go:

Gulê min qebul kir, Xabûr e xweş Xabûr e



Gulam yeka enî kever e, meş werdek e, bisk bi têl e, rû qeytan e

Minê tej (te ji) xwe ra bixwasta, ji mi ra gotin:

Gul axçîka (*axçîk bi Ermenî ye*) ji Fillan e

Û Gulê dêv da digirt, digot:

Qey qusûra te tune!

Dîwana mîrê min girik e

Eger hûnê pirsa Evdalê lawê Zeynikê ji min bikin,

Yekî bejin tuleyî, zik xêlik e

Evdal dîn e, Evdal dîn e

Lawo dayma dilê rutba bi xema xeş (xweş) e

Evdal ji cem xwe dibêje

Belkî sonê da, Gulê bisurman be (bibe),

Lawko min bistîne .

Evdal gazî kir, go:

Gulê, dîwana Surmelî Memed Paşa wa ye li wanê gir e

Gulam yeka enî kever e, meş werdek e, bisk bi têl e, gulî hûr e

Cimaetê min laqirdiya xwe (bi) Gula xwe kir

Gulam bejin û balê va bê qusûr e

Ax Gulê canê, Gulê canê, şemamokê min, heyranê

Silavêka nav mêrganê

Te diran sedef, kokê wana di (ji) mircanê

Mij (Min ji) te ra digo: Eger zor be an xatir be,

Ez Evdalê Zeynê me,

Ezê te têxime bermala mala di giranê.

----------------------------

(*) *Peyvên di nav kovanan de yên min in – Cankurd*

(**) *Beşên **II** û **III** di demeke dî de*

(***Jêder:*** *Hinde rûpelên rojnameyeke kurdî, ku li Swêd derdiket, mixabin navê Rojnamê di wan rûpelan de ne diyar e. Bi texmîna min ew rojname ji aliyê KOMKAR ve derdiket, lê baş naye bîra min - Cankurd)*

## Beyar Robarî



# Ger tê sozbidî xakê teyê peyxemberekî hûne !

- I -

Min nû dibistana navendî tewakiribû, li Rojavayê Kurdistanê jêre dibêjin *Bekeloriya* ez bawerim ji zimanê Fransî ev peyva hatî ye.

Û li hin dewletan jêre gotin *gêmaziyûm* .

Wek piraniya xortên di salên min re, ez gelek şad û ji xwe kêfxweşbûn dema min Bekeloiya birî .

Min jî wek pir kesan bawerdikir kû min serkeftinek hêja û mezin bidestxistî û bitaybetî piştî min navê xwe li Înstûta Pîşesaziya Çaremîn- ÎPÇ, li bajarê Helebê taxa Silêman Helebî nivisand .

Lê armanca û daxwaz min ew bû kû ez zanîngehê bixwûnim û biserîbikim, lê li Sûriyê ew derfeta bidest min neket, jiber Bekeloriya min pîşesazî bû û rê tunebû ez kanibim derkevin zanîngehê. Dema min beşa yekemîn ji dibistana navendî pola nehemîn bi erebî jêre digotin kefa`h an brofa (كفاءة، بروفة) tewakir, min dixwast ez herim beşa wêjeyî an zanistî ji dibistana navendî-beşa duyemîn.

Lê mixwabin babê min li min zorkir kû ez herim beşa pîşesazî jiber li wir mehê 50,- Lêreyên Sûrî didan xwendekaran û wî got:

Piştî tu bekeloriya biserî bikî, tê kanibî yekser bi bawername xwe karekî di pispora xwe de (elktronîk) bibînî . Ev yeka babê min bi serê min û hemû birayan anî .

I

Lê du birayên yên herî biçûk şansê wan rindbû ew ji vê meselê filitîn, jiber dema ew mezinbûn babê min hêdî kalbibû nema kanî helwesta xwe li ser wan bêtivîkira. Lewma yekî parêzerî li Zanîngehê Helebê xwend û parêzer derket û yê herî biçûk jî erdnîgarî (cografiya) li Zanîngeha Latqiyê xwend .

Rojekê ji meha kewçêrê payîza sala 1983`an ez ji taxa Eşrefiyê ji ba dostê xweyî navê Mushên Sîdo vedigeriyam mal û mala me jî wê demê li navbera taxa Holoka Jêrîn û Hêderiyê de bû .

Me ji neçarî nav li wî xanî kirbû mal, Jiber odak tenê bû û pencere têde tunebû û nesûr hewşê hebû û nejî avrêj û nejî kehreba (elêktrîk) û nejî av! Yanê xanîk repîrût, Hincaran min bihenekî digot em di axirekî de rûniştîne ne di malekê de û xort gelekî bi gotina min dikenîn .

Li destpêkê ez bitena xwe di wê hodê de rûdiniştim û li dor me mal hindikbûn û derdor boş bû .

Ez sê kîlomitir diçûm jibûna ez kanibim destav bikim, Min ava vexwarinê bi satilê ji avzêyek dewletê tanî û avzê kîlomitrekê ji me dûrbû, jiber wê divabûya ez bimeşya kîlomitrekê bimeşe biçûma û kîlomitrekê vegeriyama û li gereke ez wek herkesekî di dorê de bisekniyama ta dor bihata min û satila dagirta û hilaniya û bihatama mal.

Şêniyê taxê hemû xizan û perîşan bûn û tevî ji gund û bajrokên derdora Helebê hatibûn wir û li we taxê rûniştibûn, Taxên wek taxa me li dor bajêr pirbûn û wan taxan çemberek pintî û xerab li dor bajarê Helebê avakirbû. Taxa me ji Kurd û Ereb û Tirkmanan pêkdihat .

Mala me ji navenda bajêr gelekî dûr bû û tiştek li taxa me tinebû, wek kogeha an bazar an navendên çadî yan jî pritûkxane an dermanxane!!!.

Firna nên ya herî nêzîk ji me ve, sê km dûrbû, Û ji zivistanê herî û cebil û bihêna gemirî ji çarşî û kolanên taxê dihat, Jiber kortên avrêjan zivistanê vedikirin û vedidan û ew pîsî berdidan kolalan û baranê bixwere dibir.

II

Birastî mirov nikanî li kolanan bimeşya ji dest bihêna pîs û xerab û nejî kanî bihêna xwe bikşanda!!

Bi salan re em çar bira di wê hodê de gihîştin hev û ode biçûk bû 4m bi 4m bû û zivistanê sobe tunebû, jiber kû mazot buhabû û bere kêmbûn, Me çar mirovan li ber çira qazê (biftîl) dixwand û xwarin û vexwarina xwe li ser paporê dikeland û av germdikir û serê xwe duşuşt. Dema yekî ji me serê xwe bişuşta yên din hemî ji hundir derdiketin hundir hewşê ta serê xwe bişuştina û xelaskira, Û kincên gemarî me bixwere dibirin gund û dayîka min ji me re, ew li wir duşuştin û zuhadikirin, Heftê carekê em diçûn gund-herêma Efrînê.

Me piraniya xwarina xwe ji gund tanî û xwarin jî penêr bû, zêt bû, zêtûn bûn, nîsk bûn, çolik bû, sevar bû, hêk bûn, û leçer zehter bû, Me xercî li destpêkê pênc kaxez (lêra) werdigitin û paşê bûn heft û wisa bi demêre hindik-hindik zêdebûn jiber jiyan buha dibû. Tiştê me dikirî nan bû û pêwîstiyên dibistanê bûn nezêde.

Wek pênûs, lênûs, pirtûk, biroke, rêzkêş, veterok û pênûsên rengînî û kirêya otûbûsê ji gund ta bajêr û ji bajêr ta gund bû, Kêm caran kû me kanîba sendewîşek felafêl an çeneqek fûl bikiriya, yan jî em biçûna sînema, sedem jî tunebûne peran bû.

III

Ez gihîştim ber deriyê malê û min derî vekir û dem ez bihewşê ketim min dengê babê xwe bihîst, Ez gelek şabûm kû ew hatî ba me serlêdanê û têkeliya navbera min û wî de zor başbû. Min bitenê ji nehe kuran kanîbû henek pêre bikrana û ji min nedixeyidî, Jiber wê birakên min yên ji min mezintir çavtengî ji min dikirin û digotin min:

Çima babo rê dide te, tu henekan tevê bikî û ji me giştiyan bêtir te bi xwe re dibe deran?!

Min digot:

Ez nizanim çima, Ev pirsa ji min netê kirin û divê hûn vê pirsê ji bavo bipirsin. Ew tenê kane bersîva vê pirsê bide.

- 2 -

Wan digot: Na tu zanî.

Min digot: Belkî ez zanibim, lê ev her dimîne helwesta min e, nezêde. Heger hûn dixwazin rastiyê bizanibin, divê hûn ji wî bipirsin .

Ez ketim hundir odê û min solê xwe di êşîkê de êxistin û derbas bûm û min silav da hemiyan û destê xwe da babê xwe û bixêrhatina wî kir û li hal û rewşa dayîk û xûşk û birakên xwe yên biçû pirsî û herwisa rewşa gund .

Babê min got: Lawê min halê min başe wek berê ye, tu guhartin tunene. Dayîka te û zarok hemî saxin û rewşa wan jî nexerabe.

Wek din silavê dayîka te ji re re hene û got:

- Divê tu ji nêzîk de herî gund, jiber bîriya te kirî.

Min digot: Mala Xwedê ava kû hemî saxin û spias jibo silavan.

Wî got: Ji bilî wê jî, tu zanî kar û xebata gund û cotkaran bidawî nabe. Hetim kar heye, jiyan xelas dibe û kar xelas nabe.

Babê min pirsî û got: Rewş û xwendina te çawa derbasdibe?

Min digot: Bav, Xwedê mirazke ezê ji nêzîk de, herim gund û yadê serlêdankim. Min jî bîra wê kirî û mafê wê li ser min heye ez we selêdankim, jiber va sê heftene ez neçûmî gund e. Wek din halê min başe û xwendin jî bişêwak normal derbas dibe.

Babo: Tu nebirçî yî?

Min got: Na bab, ez nebirçî me. Min li ba hevalê xwe xwarin xwar.

Babo: Tu li ba kê bûyî?

Min got: Ez li ba Muhsên bûm.

Babo: Kîjan Muhsênî?

Min got: Muhsênê Qurbê.

Babo: Oh, Muhsên mirovek delale. çawa ye halê xwe?

Min got: Halê wî başe.

Babo: Ew bitenkê rûndine?

Min got: Na bav, ew teve du xûşkan rûniştî.

Babo: Ew jî dixwûnin an kardikin?

Min got: Ya mezin Kerîme li mal rûniştî û Zêneb jî dere pola heyştemîn - dibistana navendî.

- 3 -

Babo: Ger te vê carê ew dît, ji min re silavke û mela carek din were ba me gund.

Min got: Serçavan bav, ezê daxwaz û silavên te pêghînim.

Babo deng li birakê min Hejêr kir û got:

Hejarê min, paporê vê û çayekê ji me re çêke em vexwin û dibere ez dixwazim bi birakê te Ristem re li ser kêşyekê baxivim.

Hejar: Başe bav, serçava û hêze xwe kir û çû papor vêxist û çaydanê çayê tijî avkir û danî ser.

Min bala xwe da rûcikê bavê xwe li kene, min bi xwe re got: Xwedê xêrke babo bikêfe!

Min jê pirsî û got: bab çi heye?

Wî got: Xwedê mirazke xêre. Bihêna xwe fere bike em berê qedehek çayî xwe vexwun, paşê ezê ji te re xeberdim mesele çî ye. Jixwe jibo wê meselê ez ji gund hatimî û bûna bi te re li ser wê kêşeyê denkim.

Min got: Başe bab ezê bisekinim ta ça biserî dibe û dibere tê ji me re xeberdî meselê. Min cixarak jêre vêxist û dayê û ji dest min girt gor wî cixare nedikşandin. mixabin wê demê min cixare dikşandin û cixare jî gelekî xerab û pîsin, lê paşê min xwe birûçikekî pak ji cixaran xelaskir.

Babo: Sipas û destxweş, gor tu zanî ez cixaran nakşînim û nejî zanim bikşînim. Bes jibo xatirê te ezê yekê bikşînim.

Min got: Wek tu dixwazî bab.

Hejêr ça keland û qedeh dagirtin û heryekî qedeha wî danî pêşiyê û me sipasiya wî kir . em li bendê babê min man, kengî ew ke dest bi wê meselê bike û xeberde da em zanibin kêşe çî ye.

Hejêr jê pirsî û got: Bav te negot meselê çî ye? Birakê min Hejar dora sê salan ji min çûktire.

Babo: Ez denkim lawê min, bes ez difkirîm çawa meselê ji birakî te re xeberdim. Piştî du-sê xulkan babo cixara xwe vemirand û got: Niha jî em werin ser mesela xwe.

Min got: Keremke bab.

- 4 -

Babo got: Bese mercek min heye.

Min got: Merca te çî ye?

Babo: Ez ji te re xeberdim, ger tê sozbidî tiştê ez je te bixwazim tê bikî.

Min got bab: Ez hîn nizanim mesele çî ye, çwa ezê sozbidim!! Tev wê jî ger ji ez kanibim daxwaza te bicî hûnim çima na!..

Babo: Mesele, min keçikek ji te re dîye. Ew birastî çeleng û ciwane û wek din ew mamoste ye û kardike.

Ez kenîm û got: Bab, min kevyanî ji te nexwastî û nejî min dil heye jinbikim. Yek ez hîn dixwûnim û duyemîn leşkerî li pêşiya min e û sêyemîn jî belkîm ez herim dereva bixwûnim .

Û ji hemî girîngtir teyî rewşa me dîtî, em di çi halîde dijîn, Kîjan keçika bi rewşek wisa wê razîbibe, ger min got amîn?

Babo: Tu bibê amîn û xemê ti tiştî mexe!! Û jibîrmeke min bi xwediyên kêcikê re denkirî û wan hajê vê meselê heyê, Û ew li benda te ne tu herî serlêdana da tu keçikê ve hevdû bibînin.

Min got: O, ger weye mesele cediye û henek têde tunene.

Babo: Na, henek têde tunene. Min bi te re got ez bitaybetî jibo vê meselê ji gund hatimî.

Min got: Bab, tê çawa herî soz bi xelkêdî û min qet hajê tune, Dibe wisa?

Babo: Lawê min keçik birastî zor ciwan û liyaqî te dit, jiber min teve xwediyên we denkir. Û jibo mesela xwendina te, ger îş meşî hûn kanin niha hevdû bixwazim û zemawendê bêlin piştî salekê an dudiyan.

Min got: Başe, lê te negot keçik kîye û ji kûye?

Babo: Ez ji te re xebernadim ger tu soznedî herî, herî we bibînî û ew te bibîne.

Min got: Ez nasdikim? meriya me ye? Kurd e an Ereb e ?

Babo: Ez tiştekî nabêjim ta tu soznedî herî bibînî.

Min got: Başe ger bes dîtine, soz ezê herim bibînim.

Babo got: Zor başe. Niha ez kanim ji te re bibêjim keçik kîye.

Min got: Kerme bêje.

- 5 -

Babo: Tu nekeçikê nasnakî û nejî xwediyên wê.

Min got: Dibe, tu bibêje emê bizanibim ew kîye.

Babo got: Keçik qîza Hesen Reşo ye!

Min û Hejêr lihevnêrî û got: Hmm … Hesen Reşo!!!

Min pirsî û got: Bav, Hesenê Reşo kîye û ji kûye?

Babo: Lawê min binyada wan ji gundê me ne. Hesen û jinê ve li ba me wek xizmetkar kardikirin, lê piştî halê me xerabû wan ji gund barkirin çûn gundê Basilê û li wir demekê rûniştin û dipêre ji wir jî barkirin hatin Helebê ji xare karkirin û niha jî li Surayana Kevin rûdinin.

Min got: Te ticaran ji me re li ser wan denekir, da em wan nasbikin û nejî ew ticaran hatin ba me mal û nejî em çûn ba wan, jiber wê em hevdû nasnakin.

Babo: Ew birakê teyî mezin baş nasdikin û ew jî wan rind nasdike, jiber xaka keçikê Emîne û birakê teyî mezin ve bihevre li Efrînê dixwendin.

Paş mamê dayîka te Mûsê Emîne şande Rûsiya û wê li ser hesabê Partiya Komûnîsta Sûriyê (PKS) xwendin,li wir Emînê bijîşkî xwend û piştî biserîkir û vegeriya welêt. niha jî bijîşkgehek li navenda bajêr nêzîkî Mûnşiyê vekirî ye.

Min got: Bav te got keçik mamoste ye û nihajî tu dibêjî bijîşke, ço bû ev?!

Babo: Ya bijîşk xaka keçikê ye û jê mezintire. Keçik ji Emînê çûktire û li Efrînê ew li dibistanek seretayî seyan dide.

Min got: Te kengî keçik dît û vê re denkir?

Babo got: Ji nêzîk de min ew dît û ez vêre axivînm û wê hajê heye û herdû xak li benda serlêdana tene.

Min got: Bab, ev mesela çon hate bal te?

Babo got: Lo ez li mala pismamê dayîka te Nehsoyê Hesê bûm. Û tu zanî gotinê gotin anî û li te pirsîn û Nehso got:

Rewşa xarziyê min Ristem û xwendina wî çawa ye ?

Babo: Min jêre got halê te başe. Û min jêrê got ji bilî hîsal salek xwendinî te mayî tu dibistanê biserîbikî û paşê leşkerî li pêşiya te dimîne. Û wî ji min re got:

- 6 -

- Got xalê hêja ma xarziyê min nêta xwe û jinkirinê tune? Lê te dil tune tu bizewcînî?

Babo: Min jêre got dil heye an na ez nizanim. lê ger bi a min be hîro ezê jinekê jêe hûnim. bes mesele bi dest wî de ye. Paşe min ji xalê te Hehso pirsî û got:

- Nehso, zar keçikin li dor te hene dixwazim mêrbikin yan jî dema wan û mêrkirinê hatî ye!

Nehso got: Gotina raste, tiştek wisa heye.

Babo: Min jê pirsî keça kêyê û çi dixwûnê û çend salî ye? rabû ji min re xeberda kîye û çi karîdike û me li ser meselê hinî denkir.

Min ji xalê Nehso û jina wî re got:

Divê ez keçik bibînim û bi xwûşkê re baxivim li ser kêşeyê û paşe em sekin ka xarziyê te dibê çi.

Nehso got: Berê min bi keçikê re denkirî li ser xarziyê xwe. Û wan xwast hevdû bibînin û ger bihevdû razîbûn tewa û ger razînebûn, he kesek li mala xweye.

Babo: Bes xarziyê te hîn dixwûnê û leşkerî li pêşiyê ye.

Nehso ji min re got: Ger bihevdû razîbûn, hûn kanin niha wê bixwazin û nîşanê pêxin û dawet jî male demekê bimîne.

Babo min jere got: Ger wisa ye dimeşe. bes ez nikanim ti sozan bidim ta ez bi lawê xwe re denekim.

Nehso ji min re got: Başe jêre xeber de û ka dibê çi. Û vê re bibêje mela were ba me, da ez jî vêre denkim û wî bibawerkirdin bikim.

Babo min jêre got: Çima na! Ezê pêre denkim û jê bixwazim ji nêzîk de were ba we jibûna tu jî tevê denkî.

Nehso got: Başe, ez hêvîdarim dinava heftakê de tu bersîva min bidî çi bi te re bû. Herwisa ez hêvîdarim xarzê jî ji nêzîk de berve me were.

Babo min jêre got: Ezê hewil bidim besîva te dinavbera çend rojan de bidim. da tu jî kanibî bersîva keçik û xwûşkê ve bidî.

- Wisa mesele bihevket û min paşê keçik biçavên xwe dît û gelekî li xweşiya min çû. Û min bi xaka keçikê re, Emînê li ser vê meselê denkir û min jêre got:

- 7 -

- Ezê ji lawê xwe re xeberdim û jê bixwazim were serlêdana we. Da ew û xaka te hevdû bibîn û nasbikin. heger bihevdû razîbûn paşê mesele hêsan dibe.

Min got: Aha! nû ez têgihîştim. Lê bav te ji min re negot navê keçikê çî ye?

Babo got: Navê keçikê Semîra ye.

Min got: Navek ciwan e.

Babo got: Divê tu zû xalê Nehso bibînî û ew û jinê wê teve te herin wir, jiber te nasnakin û hemû bîmarên wê jinin. Nabe tu bitena xwe herî wir gereke jinek bi te re be.

Min got: Başe bab, ezê di cem xalê Nehso re derbasbim û ji wî bizanibim kegî û çi çaxî gereke em herin ba wan.

Babo got: Zor başe lawê min û ez hêvîdarim ew bi xweşiya dilê te were û tu jî bixweşiya dilê wê werî û hûn biqsmetê hevdûbin.

Min got: Çi bi min re bibe, ezê ji te re xeberdim.

Babo got: Hêviya min jî ewe. Jibîr meke dayîka te jî hajê heye û li benda nûçayekê ye.

*Dawiya beşê yekmîn û duyemîn û li benda beşên dinbin*

## *Benûşe Elewîferd*



# ÇÎROKÊN KUNDIRÎKÊ


**Beşa duyem: Kundirîk û hevala dewlemend**

Kundirîk tenê û bêkes bû, bixwe ra fikir kir ku çi bike û çi neke, çim ku dilî wê tengî dikir, fikra wî gihîştî viya ku: sa ku ji tenêtiyê derkevim gerek hevalek ji bo xwe ra peyda bikim. hevalek ku hertim bi hevra bibin û gepên dilî bi hevra bibêjin. ew gerya û gerya heta ku hevalek peyda kir. ewan bi hev ra diçûn dibistanê, bi hev ra dilîstin û bi hev ra gilî û gazî dikirin. eva hevala bû her tiştê kundirîkê. kundir nika xweşhal bû ku bi tenê nemaye. hevalê kundikê pirr dewlemend û diravdar bû, lê kundir reben û şermok bû.

rojek kundirîk çû dû hevala xwe ku bi hev ra biçin dibistanê. hevalê kirasek teze û bi rewş li xwe kiribû kîfek pirr hêja avêtibû ser pêlên xwe. kundirîkê solek dirya û rizî bi pê da bû. wê kitêbên xwe kiribûn xelteyek kun û pirtî-pirtî . rojek ku ji dibistanê ber bi mal dihatin hevala wî got: kundiro, were kitêbên min jî têke nava xeltey xwe ku kîfê min nedire û xirab nebe. kundirîka şermok qebûl kir, lê dilê wî pirr şewitî . çend rojan weha derbas bû û kundir bûbû xebatkarê hevala dewlemend.

rojek hevala kundirê got: kundiro min şalek teze kiriye, ezê şalê xwe yê kone xelat bidim te. kundir kêfxweş bû û şal avêt ser serê xwe. roja din li dibistanê kundirê gepek bihîst ku dilê wê pirr şewitî. hevala wî gelê zarokan agahdar kiribûn ku şalî kundirîkê ya min e.

hevala peredar her tim bi wî ra digot ku : eger sa min kar nekî ezê şalê xwe gi te bistînim. kêm kêm dilê kundirê qelişt û biryara xwe ya dawîn girt. wî fikir kir ku eva çi heval e te peyda kiriye? eva heval e an ku dijmen e? tenêtî ji hebûna vî hevala baştir e.wî nameyek sa hevala xwe nivîsî û pê şalê bir û avête nava hewaliya hevala xwe. wî li name haka nivîsîbû: şalê xwe sa xwe ra helîne û ewqes minet li ser min daneyîn. eger karek dikî, bê minnet bike. ji bîr neke ku ez xebatkarê te nînim û ji îro bi pêş da hevala te jî nînim. Kundirîkê fêm kir ku her heval rind û baş nîne û ew gerek bigere hevalek baş sa xwe ra peyda bike



Cejna 10 HNRKS

PÊNÛSA NÛ


**Sernivîs**

Qado Şêrîn

**Rêvebirê Nivîsînê**

Xorşîd Şûzî

**Desteya birêvebir**

Abdilbaqî Huseynî

Ezîz Xemcivîn

Lawîn Şêxo

Pîr Rustem

**Derhêner**

Xorşîd Şûzî

**Ji bo hinartina berhemên kurdî:**

kurdi.penusanu@gmail.com

**Jimarên ''Pênûsa Nû'' Tev ji vî Emêlî derxînin:**

www.penusanu.com